# ŞEHÎD ŞEHÎDAN VEDIBÊJIN

**Berhevkar: Azad Ararat**

Weşanên Akademiya Wêjeyê ya Şehîd Şîlan Baqî

***Redaksîyon:*** *Zerdeşt Bedîrxan*

***Çap:*** *Tebax 2015*

***Çapxane:*** *Çapxaneya Azadî*

**Çiqas xweş gotîye zana bi vî awayî: Kesek,**

**Di maleke bê kes de jî ger bêjî herfekê**

**Baştir e ji veşartina di koşeya dilê xwe**

**Û qenctir e neanîna bi ser zimanê xwe**

**Şerefname**

**AGIR SABIR E, YAN SABIR AGIR E**

**MIN DIVÊ EVÎN XENDEYEK BE**


**KUJERA HEMÎ KIRÊTIYAN BE**

**ARAMIYA CERG Û DILAN BE**

**BÊ SERDEST Û SERWER VÎNEK BE**

**Zerdeşt Bedîrxan**


Ş. Viyan




**REŞÎD TOKPINAR**

Di Rastiya şoreşa me de, êdî şehîd li ser şehîdan bîranînan vedibêjin. Şehîd dibin şopdarên rêça şehîdan. Em ji anîna ziman a şehîdan rastiya têkoşîn, jiyan, sicin û çanda wan fêr dibin. Ji vê bîranînê jî emê jiyana şehîd Sebrî, ji vegotina, şehîd Vîyan, fêr bibin.

## Vîyan Amara

Ez ji Wanê me, di eslê xwe de ji Colemêrgê me, di Sala 1996'an de tevlî nava refên şoreşê bûm. Ez li Kelareş, Zagros, Esendere, Şehîdan, Xakurkê, Zapê, Xinêre, Qendîl û Mexmûr mame.

Piştî operasyona 97'an em hevalên jin, nêzîkî du tabûran li Dola Xedarê man. Despêka 97'an heya dawiya salê her dem operasyon hebûn. Bi giştî em di perwerdê de bûn ji zivistanê şûndetir. Pir hevalên fadayî ji wan her du tabûran derketin. Ji bo artêşbûna jinê li Dola Xedarê du tabûrên hevalên jin dihatin perwerdekirin. Ji Rêbertiyê moralekî pir xurt girtibûn. Pişt re jî konferans hate lidarxistin. Moralek pir

xurt jê hat girtin. Ji nava wan hevalan taximek hat hilbijartin û em derbasî çiyayê Cîlo bûn, ku li eyaleta Zaxrosê ye. Erdnîgariya zagrosê jî pir asê bû, jixwe asêbûna erdnîgariya zagrosê bi nav û deng e.

Pratîka ku me li zagrosê dayî meşandin, berî her tiştî vîneke xurt dixwest, ew vîn jî tê wateya ku mirov di warê manewî de dagirtî be. Mirovê ku bikaribe li Cîlo pratîkê bimeşîne, ne pêkane hinek lewaziyên ruhî û manewî jiyan bike. Ji ber erdnîgarî pir hişk e, ev jî li gor xwesteka kesan nayê çêkirin. Mirov neçare xwe li gor bejahî amade bike. Nêrîneke min ji bo Cîlo heye, *Cîlo nayê vegotin, tê jiyankirin*. Ên ku li Cîlo nemane weke qada Başûr dibînin, lê di rastiya xwe de, ew berxwedana gelê Kurd a ku ji dîrokê heta roja me ya îro tê, bi wayekî hişk bi xwe re dide jiyankirin. Mirov dikare Cîlo weke vîna hebûna gelê kurd pênase bike.

Gelê wê heremê jî vê diyardeyê di xwe de dide jiyankirin. Di nava çiyayê Cîlo de hinek qad hene hîn zehmetir in. Em taximekî hevalên jin çûn qada ku cara yekemîn di Cîlo de tê vekirin û jê re dibêjin geliyê Dizê. Geliyê Dizê jî berê her çiqas hevalan hewil daye bikevinê, lê nekarîne û her têde winda kirine. Ev cih jî di Cîlo de cihekî naveraste aliyekî wê Colemêrg e, aliyekî wê Botan e, aliyekî Semedar, aliyekî jî Kelareş heye. Ew der qadeke navende, berî me jî pir yekîne çûbûn. Hevalan şehîd dabûn û şûn de kişiya bûn. Hevalan bi vî awayî nikarîbûn wê qadê vekin. Yekemîn car yekîneya şehîd Mehmûd Şirnex, çalakiyek li ser gundê Aynûr "ku gundekî çeteyan bû" lidarxist. Di wê çalakiyê de hevalek jî şehîd ket. Piştî wê çalakiyê lê belê ew

qad hate vekirin, lewma her şehadetek jinûve vejînekê îfade dike.

Ji ber ku qad nû hatiye vekirin, hevalên mêr digotin: "taximek hevalên jin were gel me, dê lewazî çêbibe yan çênebe?" Dema yekemîn car em çûn heremê me ev nêrîn li hemberî xwe dît. Lê bi rastî ew taxima ku dola Xedarê girtî û zehmetiyên operasyonê kişandî, bi hevaltî û nirxên ku hatine avkirin dagirtîbû. Dîsa cara yekemîn konferanseke bi hejmareke zêde hatibû çikirin. Her çiqas bi riya telefonê be jî, bi Rêbertiyê re peywendî hatibû çêkirin. Hêza manewî ku li vir hat girtin di radeyekî bilind de bû.

Ew hêza dagirtî ne pêkan bû ku xwe li pratîkeke lewaz deyne. Nêzikbûnên me yên hevalên taximê jî wisa bûn. Di qadê de, nêzikbûnek sar ji me re dihat nîşandan. Dihat gotin: "gelo dê karibin bikin?" Dê li ser me giranî bidin çêkirin, an nedin çêkirin? Lê belê piştî em tevlî yek du çalakiyan bûn, di hundirê jiyanê de jî hevalên mêr, yekbûn disîplîn, bi hev re jiyankirina me dîtin şûn de, xwe bi xwe nêrînên xwe yên li ser me guhartin. Şehîd Mehmûd bi xwe jî, bi vî rengî, ji bo hatina me ya despêkê, nêrînê xwe anî bûn ziman. Digot: "despêkê gumanên min hebûn lê piştî ku min sekna hevalên jin dît, min nêrînên xwe guhertin." Bi rastî jî taxim pir xurt bû, di her tiştê xwe de pêşeng bû. Niha ji wê taximê tenê ez û hevalek mane. hevalên din tev şehîd ketin. Hinek heval bi rastî jî, bi avayekî lehengî şehîd ketin. Hinek heval jî weke ew mîlîtanên ku her mirov dixwaze wan li gel xwe bibîne bûn. Ew heval ji vî alî ve mînak bûn. Piştî çend çalakiyan şûndetir, di hundirê geliyê Dizê de, me karî em xwe têde bi cih bikin. Weke şêwazê

gerîla, çawa ku mirov di her noqteykê de 2-3 saetan dimîne, sibê ango êvarê tu cih diguherî, wek gerîlatiya yekser veşartî û li pey xwe ti tiştekî nahêle, me bi vî awayî hereket dikir. Em naçar bûn, gerîlatiyek wisa bikin di vê hêlê de, tişta ji destê me dihat me pêk dianî. Me destûr nedida ku em ji aliyê leşkerî ve çi pirsgirêkan jiyan bikin. Me nedixwest em lewaziyan jiyan bikin û dijmin jî êrîşan bîne ser me. Ji vî alî ve şiyarbûnek hebû. Li hember hev berpirsiyartî li pêş bû, ji ber ku yekîneyeke pratîkê bû, qadeke nû jî ji rêxistinê re vekiribû, hemû hevalan keyfxweşiyek jiyan dikirin. Hem kelecana vê di hundirê yekîneya me de pir xurt bû. Hem jî qad, weke qada cerdevanên ku di şerê xwe de pir xurt in, tê naskirin. Di qadê de çeteyên Pinyanîş hebûn, qelsiyeke pir piçûk bidîtana dê êrîş anîbana ser me. Bi rastî jî ew weke hovan bûn. Dibêjin mirov dibe xayinê gelê xwe, lê di wê astê de jî nabe. Mirov dîsa wate dide artêşa tirk, me ji wan kuşt, wan ji me heval şehîd kirin. Herî kêm bi wan re nakokî û dijminahiya dîrokî heye. Lê di nav gelê xwe de wek eşîretek, ne gengaze nefreteke wisa bê jiyankirin. Hem bijî hem jî bidî jiyan kirin. Eşîreta Pinyanîş jî wek nemirovan bûn. Di şerê xwe de jî pir xurt bûn.

Me di wê qadê de çalakiyên xwe dikirin. Beriya pêkanîna çalakiyan her tim pîrozbahiyên me hebûn. Her ku em diçûn ser çalakiyekê, weke ku em careke din hevdu nabînin, me şahî dikir. Ew çalakiya ku em diçin ser, wek nasnameya ku me bi me dide vegerandin, me pîroz dikir. Her çalakiyek dihat wateya pêxistina agirekî. Her çalakî, agirê ku hatî pêxistin, dora çirûskên wê de govend kişandin bû. Bi

taybet di wê yekîneyê de, lê bi giştî di me de bûbû çandek. Beriya her çalakiyekî ku me govend girê dida, weke ji hev xatir xwestin bû. Xatir xwestin jî, bi kirêtiyên dijmin, xwe paqij kirinê dibû. Ew jî govend girêdana me û çûna çalakî û serxistina wê bû. Çalakiyên me hertim metirsîdar bûn. Fermandarekî artêşê yê ji rêzê, zû bi zû, ew çalakiyên ku me dikir, nedikir. Lê belê fermandarê me heval Mehmûd, di hêla xwe ya kirina çalakiyan de pir xurt bû. Dikarî bû hem xwe bide meşandin, ne yekîneyek an taburek, dikarî tevahiya eyaletekê, bi xwe re bide meşandin. Hem di pêkanîna jiyanê de, hem jî di plansaziya çalakiyan de, hertim bi xwe jî di navê de cih digirt.

Di wê yekîneyê de hevalê Sebrî Meredo (Reşit Tokpınar) hebû. Me bi navê Sebrî Xerzan ew dinasî. Hevalê sebrî berê li Xerzanê mabû berpirsiyartiya eyaletê jî kiribû. Piştî demekê tê Zaxrosê. Hatina xwe ya Zaxrosê, di pêvajoya perwerdê de qebûl nekiribe jî, piştî ku hat, hem hevaltiya wir, hem zehmetiyên wir, dema ku dît şûndetir, wek parçeyek wê derê be, kete nav têkoşînê. Bi xwe jî gelek caran digot: "heke tiştek hebe, di nasnameya min de kêm mabe, yek jî, pêwîst bû ku ez li vir bijîm." Ew heval jî di warê jiyanê de, hevaltiya xwe de, jiyan û çalakiyan de, hevalekî pêşeng bû. Girêdana hevalê Sebrî, wekî ku bê hevdu jiyan nabe bû. Girêdana wî ne di warê fîzîkî de bû, ne mirovek wisa ye. Girêdana xwe ruhî bû û ev rastî di çavên wî de jî dihat dîtin. Piştî her çalakiyê rewşa hevalan yeko yeko pirs dikir. Mirovek girêdana xwe bi hestyarî nebû. Kengî hestên wî pir xurt dibûn? Ew kêliyên ku me bi hev re li dora agir dîlan dikişand. Mirov ji hev

dernedixist, *agir Sabir e, yan Sabir agir e*. Kelecana wî asta herî jor de di wan kêliyan de xwe dida nîşandan. Di nava çalakiyan de çawa bû, çawa ne bû, wî bi xwe dawiya jiyana xwe nivîsandiye. Tişta ji destê min tê, ez bikaribim wî vebêjim. Piştî çend çalakiyan şûn de, rojek dîsa me çalakî kir. Beriya wî me çalakiyek li ser çêleka kiribû. Ji ber nebûna lojîstîk, hem jî ji bo em bikaribin, hêrs û dijminatiya wan çeteyên Pinyanîşê jiyan dikin, piçekî daxînin. Bi vî rengî em neçar man ku çalakî li ser çêlekên wan bikin. Çêlek jî ji bo cerdevanan hebûneke madî bû. Xwe li ser wan û mûçeya ku ji dewletê dihat, didan jiyan kirin. Ji bilî wî tiştek nebû. Me biryar dabû, ku bibe nebe emê çalakî li ser çêlekên cerdevanan bikin. Her dem hevalan digotin, ewqas çêlekên wan tên bejahiyê, çawa dibe ku em nikarin dest biavêjin wana. Şeytan dibêje, biçe wan û şivanê wan jî, bide pêşiya xwe û bîne. Lê me yê çawa şivan anî ba. Ji ber çeka wî hebû, dê xwe parastiba.

Di warê fîzîkî de, eger em binirxînin, di wir de, windahiyên kêm ji wê pratîkê derketin, ji bo me serkeftinek bû.

Ji ber tu dizanî ku, têyî hezkirin, ji bo wî ma be jî mirov xwe di nava şer de diparêze. Lê hindek caran jî mirov neçar dimîne ku, “wê baweriyê de me, girêdana herî xweş jî ewe” bê ku çavê xwe bigirî, bê ku dudilî jiyan bikî, jiyana xwe ji bo hevalên xwe feda dikî.

Çalakiya ku me herî dawî kirî, pir metirsîdar bû. Em ketin nava gund. Çalakiyeke pir xurt bû. Jinê wan jî li hember me pir xurt şer kirin. Zarokên wan jî şer kirin. Me çalakiya xwe kir. Di wê çalakiyê de tiştekî pir xweş hebû. Hema hema

çi cepxane li ser me nema bû. Ya ku pêwîstbû me biavêta dijmin, me avêtibû. Piştî ku me çalakiya xwe ser xist şûn de, bi keyfxweşî me li ser xwe cephane nehişt. Me wisa cepxane ji keyfa avêt. Wê rojê jî em hatin noqtê. Her hevalekî çeka xwe paqij kir. Ê min jî, ji ber çeka min pir xweş nebû, di çalakiyê de jî pir xweş nexebitî, lê ji derveyî wî jî, yekê kevn, zingargirtî bû. Hevalan çeka ku li gund, di ser cerdevanan de rakirî, anîn dan min. Çekeke pir xweş bû. Heval Sebrî hat got: "hevala Viyan emê ji çeka te re, qolekî jî peyda bikin, emê çeka te bikin portatîf." Em çûn jêr li ser kaniyê, min çek paqij dikir. Di wê kêliyê de dengek hat ber guhê min, lê ez tam piştrast nebûm ku çi denge. Piçekî din jî min deng guhdarî kir. Çeka min jî vekirî, ango parçekirî ye. Pişt re raste rast, min fam kir ku dengê dijmine. Heman kêliyê de dengê helîkopteran jî hat.

Wê demê taktîkê dijmin wiha bû: heke nokta bizaniya. Destpêkê dihat bi helîkopterên kobra, têra xwe li hevalan û noqta wan dida. Pişt re helîkopteran leşker dianîn û li bejahiyê datanîn. Lê vê carê wisa nebû. Ez bawerim, nedizanîn em li wê noqtêne. Ji ber em di noqteyek pir nêzikê gund de bûn. Cihê em lê, navê xwe Qendîl bû, ne wek çiya, wek girek piçûk bû. Em di kaşê de, nêzîkê kaniyekê bûn. Dema helîkopter hatin, piştî wî çend xulek, me leşker dîtin. Min nekarî ez çeka xwe kom bikim û ez çûm. Hevalê Mehmûd, Sebrî, fermandara taxima me hevala jin, hemûyan xwe civandine, da ku bê ku bikevin pevçûnê, ji noqtê derbikevin. Em naçar bûn ji noqtê derbikevin, ji ber tepeciyê me jî bi bangdana bêsîmê dernediketin. Şîmane ku em

wendahiyan bidin hebû. Armanca me ya yekemîn, çalakiyên pir xurt kirin, wendahî jî herî kêm dayine. Di wê kêliyê de hevalê Mehmûd û hevalên din, plansazî di nava xwe de çêkirin. Li gora wê jî, emê ji noqtê derkevin, werin jorê noqtê têkevin pevçûnê. Ji ber wê demê dijmin dikeve bin bandora me. Tiştin hene dibêjin ya, perde dikeve ber çavên mirov. Di wê kêliyê de jî, te digot qey perdeyek hatiye ber çavên me. Helîkopter jî êdî dida pey me. Armanca wan ew bû ku, dîmenên me bibînin û yekser leşkeran deynin dora me. Tepeciyên me hebûn, fermandarê wan jî hevalê Seyfî bû. Hevalê Mehmûd çend caran bi bêtêlê bang kir ku jê re bêje, li dijmin bide heta em derketin jorê. Her ku hevalê Mehmûd bi bêtêlê bang kir û got: "Seyfî, Seyfî, Seyfî" lê Seyfî dernediket. Dema em ji cihê xwe derketin û me berê xwe da jor, ji nû ve tepecî bi dijmin re ketin pevçûnê. Lê belê ewqas derfetê me nebû ku em bi xurtî li dijmin bidin. Ji ber bi destpêkirina pevçûnê re, Kobra jî hatin. Tişta me kiriba çibû, em yekser xwe ji wê qadê derxînin, komeke piçûk li gupikê bihêlin, ji xwe tepecî hene, ew bi dijmin re bikevin pevçûnê. Hevalê Sebrî û 3-4 hevalên din, li ser gir bûn û wan dikarî pevçûn bikin. Me jî hewil da ku em yekser ji qadê derkevin û xwe ji qadê paşdatir bidin.

Em hatin ser kaniyekî, ji wî cihî re jî dibêjin Meydana. Di heman qadê de ye lê, li gor bejahî jê re navek hatiye dayîn. Meydana cihekî mîna deştan e, Kevirên biçûk jî lê tine ne, hemû ax e. Cihê ku helîkopteran leşker lê datanîn li vir e, me bi zorê karî xwe bigînin wir. Piştî ku me xwe gihande wir hevalên ku ketibûn pevçûnê, ew jî hatin. Em gihîştin hev lê

me ew firset nedît ku em ji Meydana derbikevin. Kordîne pêşiya me ye, li jorê Meydana gupikek heye, wek qada gokê ye. Haya me ji wê kordîna dijmin ku operasyonê kordîne dike, tine ye. Hevalê Mehmûd got: "hevalno belav bibin" Emê çawa belavbibûna, kevirek piçûk jî tine ye. Giyayê Helizê heye, her hevalekî ji wî giyayî gurzek girt, ji bo kamuflaja xwe. Rewş pir cidî bû. Hinek hevalan xwe dikir bin Helizan de, hinekan jî davêt serê xwe. Hevalê Mehmûd, hema çeka xwe girt destê xwe û da pêş. Armanca me, wendahî nedan bû. Hevalê Mehmûd got: "yek ji we birîndar bibe, ji ber êşa xwe hûn bêjin ay, ezê gule li ser we bireşînim." Ji ber hevalê Mehmûd, fam kir ku eger em hereketeke biçûk jî bikin, dijmin dê me bibîne û tevahî heval dê şehîd bikevin. Kordîne jî ji kobra re dibêje li wir bide. Lê belê ji ber pîlotê helîkopterê texmîn nake ku em li wî cihê rast in, tê derdora kaniyê dide û diçe. Ew yek çend caran dubare kirin. Pişt re jî me fam kir ku kordîne li pêşberî me ye. Lê me nekarî em tiştekî bikin. Du kobra li me dan lê tiştek li me nehat. Hêstireke me jî hebû. Ew jî me xistibû bin çiloyan de, te digot qey mirove, qet ji cihê xwe nelivî. Guhê xwe jî nedihejand. Pêşiyek hatibû ser hevalekî, heval digot: "pêşuyo qurban here, ez nikarim bilivim, heke ez bilivim, dijmin dê me bibîne û bikuje."

Rewşeke pir trajîk derkete holê, piştî çend salan mirov lê dinêre, hin tişt jî ji mirov re wek henek tên. Tişta me bikira nîn bû, lê hevalê Sebrî jî dibêje: "heval em ji vir derbikevin" Emê çawa derkevin, du kobra li me daye, xwe vala kirine çûne, du hebê din hatine. Kordîne jî li pêşberî me ye. Leşkeran

derdora me girtine. Tişta herî baş me karî em bikin, xwe li erdê mit bikin e. Du kobrayên din hatin şûn de, kordîna dijmin ji kobra re got: “ji te re dibêjim xwe daxîne” dewam kir û got: “cihê ku ji te re dibêjim lêxe, çima diçî derdora kaniyê didî.” Wê carê helîkopter hat û tam xwe berda, me pîlotê wî jî bi rihetî didît. Xwe zaf nizim kir û fam kir ku bin wan çiloyan de em hene. Bi vî re 3-4 caran gule ser bi me de reşandin. Sihûdê me hebû ku, erd ax bû, fîşek di nav lingê me re çûn. Dema roket avêtin, dikete nav axê û pirtikên wî zêde belav nedibûn. Di wê kêliyê de tişta baş hebûna wê axê bû. Cara dawî du kobrayên din hatin û bi giştî kobra bûn çar heb, ku li me bidin. Çend carê din gule li me reşandin, ber serê me dan.

Hevalê Sebrî rewş hîs kir, got: “heval ezê biçim, ezê bêm dîtin, bala wana bikişînim ser xwe, lê ezê xwe xelas bikim.” Destpêkê hevalê Mehmûd got: “ezê gule li te bireşînim neçe, min talîmat daye ku kes nelive.” Hevalê Sebrî jî got: “ez jî fermandarim, min jî fermandarî kiriye.” Çawa rabû, wek ava sar li me bê kirin, li me hat. Milekê de ti wî difikirî, hevalek xwe feda dike, da ku 39 hevalên din xelas bibin. Ji ber wê demê yekîneya me 40 heval bûn. Hevalê Sebrî got: “me ewqas li ber xwe daye, me nehiştiye heval şehîd bikevin.” Berê xwe da, çeka xwe girt û çû. Kobra dan pey wî. Dibêjin, di şer de mirov taktîk pêş dixîne. Jiyana asayî de, taktîk pêş nakeve. Çar kobrayan xwe ser de vala kirin, lê nekarîn tiştekî bi hevalê Sebrî bikin. Hevalê Sebrî jî bi fetl û fitûl da xwe û direviya. Ji me re jî derfet çêbû û me xwe ji wê cihê derxist. Cihek şkêr hebû me xwe da wir. Di wê navberê de me hevalê Sebrî jî didît. Hêviya me hebû ku

hevalê Sebrî xelas bûbe. Ji ber çar kobrayan xwe ser de vala kirin. Tiştek jê nehat. Êdî em jî fêr bûbûn, cephane kobra çiqas heye û kengî vala dibe. Ji ber me wê salê gelek caran lêdana kobra dîtibû. Em di nav tahtan de 3-4 xulek man, me got renge heval Sebrî were. Lê belê hevalê Sebrî nehat.

Dijmin jî paş de kişiya ji ber hewa tarî bû, dijmin newêrî bi ser me de were. Ji ber dijmin jî dizaniya, heke xwe şev nêzikî gerîla bike, deh qat zêdetir dê zirarê bibîne. Hevalê Mehmûd û 3-4 hevalên din gotin: "emê biçin meydana." Em jî hema bêje saetek ji wî cihî dûr ketine. Em jî, bi hevalan re çûn, me dît ku hevalê Sebrî li erdê ye. Di navberê de 2-3 saet derbas bûbûn. Me digot gengaze ku jiyan bike. Em çûn ser hevalê Sebrî, me serê wî rakir, yekser lingê wî ji ber çû. Kobra jî ji ber cephane wî nema bû, bi M-16 gule lê reşandibûn. Gule ji singê heval heta lingê wî lê ketibûn. Ji ber qad sar bû, her tim parke li me bûn. Hevalê Sebrî jî, parkeyê wî lê bû. Ling, destê çepê û serê xwe de heval derbe xwaribû. Em dema çûn ser heval, wî bi dengê nizm got: "heval hûn hatin." Me jî got: "belê, em hatine te bibin noqtê." Wî got: "na heval ez li benda we me, ezê ji we re wasiyeta xwe bikim." Me got: "wesyeta çi, ka rabe em te bibin." Heval Heqî jî got: "ti şêrî, pilingî, rabe em herin, tiştek bi te nehatiye." Ew jî zivirî got: "heval Heqî." Heqî got: "çi." Sebrî got: "ka singê min veke, binêre çend fîşek lê ketine." Me got: "pêwîst nake, tariye em nabînin." Wî got: "heşt hebin." Ji ber xwe bi xwe hêjmarti bû. Me jî got: "tişt nabe, emê te rêkin." Wî jî got: "de herin zarokno." Ji ber em hemî ciwanbûn bûn, wisa got. Piştre ji hevalê Heqî re got: "ka destê min ê çepê

rake.” Hevalê Heqî, dest rakir, lê dest tine ye, di nav qolê parke de. Lingê wî rakir, lingê wî jî tineye. Her em ber dilê wî geriyan me digot: “emê te rakin.” Wî jî digot: “na.” Digot ez ji bo wesiyetê mame. Em hemû ber serê wî rûniştin. Wesyeta xwe ji me re kir. Got: “li jêrê Meydana, cihek heye wek bihuştê ye, çîmene, her cure gul têde hene. Avên wisa hûrik hûrik di nav wan de derbas dibin. Hûnê min li wê derê veşêrin.” Me got: “na em çima te veşêrin. Heval li benda tene, te pir meraq dikin.” Wî got: “heval saxin ne wisa.” Me got: “erê heval saxin.” Got: “ez ticar poşman nabim, di nava vê Partiyê de tişta pêwîst min kiriye, ji hemû hevalan re silavên min bêjin, bila ji bo min xwe neqehirînin.”

Çend xulekê din derbas bûn şûnde, di nava destên me de şehîd ket. Em rabûn me hema wê şevê ew sparte axê, heman cihê ku ji me xwestî. Di tariyê de me ew veşart û me got sibê emê werin, baş kontrol bikin. Hîna têkûztir bikin.

Di encam de çi derdikeve holê, moralê hevalan pir xera bû, ev tiştek cuda ye. Di dilê her hevalî de, dema navê heval Sebrî tê bikaranîn, destpêkê de, hest, fikir, çalakî dema wan hemûyan didî ber hev, şehîd Sebrî tê bîra me. Di dilê her hevalî de Sebrî çawa tê naskirin; Sebrî lehenge, Sebrî fîdekare, Sebrî ji bo ewqas hevalan, bê ku çavê xwe bigire, bê ku dudilî jiyan bike xwe feda kir.

Di ilê hemû hevalên ku di wê yekîneyê de û ên ku şehadeta wî bîstibûn, wî nas dikirin, digotin, *Sebrî vî rengî jiyan kir û dê vî rengî jî jiyan bike.*

Min goti bû, emê roja paştir çûbana, meyê gora şehîd baştir kiriba. Mixabin ew derfeta me çênebû. Ji ber roja din,


dîsa operasyon dewam kir. Di wê operasyonê de dijmin termê şehîd bir, heya niha jî em nizanin li ku derê ye. Me daxwaziya wî bi cî anî, lê tişta di dilê min de mayî, ew daxwazî nebû mayînde.

Ji xwe hezaran wek şehîd Sebrî, bê gor li her derê Kurdistanê de dijîn. Lewre her dar, kevir; newal û gelî de, şehîd hene. Heke dixwazî rêz lê bigirî, li cihan negere, ew li her derê ne. Tenê bejna xwe bitewîne bese!

**Rêbertî**

**di ruh, Jiyan û pratîka xwe de dida jıyankirin**

**Dogan Zinar**


Ş. ERDAL HEŞTAN

Ez dixwazim behsa serdemekî bikim û tiştên tê de hatîn jiyankirin. Ew jî payiza 1991'ê heta bihara 1992'yê bû. Wî wextî ez nû tevlî hereketê bûbûm. Wexta ku ez nû jî tevlî bûbûm, ez hatim Cûdî. Li Cûdî beşdarî gerîla bûm. Li Cûdî min gerîla nas kir. Bi naskirina gerîla û tevlêbûna gerîla re min xwest hevalan hîn bêhtir nas bikim. Her hevalê ku li pêş bû, li pêş xuya dikir, ji bo min, lehengên xewnên min bûn. Ji van yek jî hevalê Erdal (Halil Erkol) bû. Ez dixwazim di vê çîrokê de, hevalê Erdal bidim naskirin.

Beriya ku ez werim Cûdî, ku berê de min nedîtibû. Cihê ku ez lê mezin bûme, deşt û çiyayên mezin lê tine ne, lê girên piçûk hene. Cûdî wek çiyayekî li ber çavên min bi

heybet bû. Ew xewn û xeyalên ku min jiyan dikir destpêkê li Cûdî pêk hatin. Ew jî ji bo min wek mûcîzeyekê ye. Heval û çiyayê Cûdî weke mûcîzeyeke tê jiyan kirin e. Cûdî li nav bajarên Cizîr, Silopya, Şirnex û Qilebanê de cihê xwe digire. Çiyayek li gor wê heremê bilind e. Hem bilinde hem jî li ser her çar bajaran û dora xwe re zal e. Rojava, Başûr jî xuya dike, lewre li ser serê Cûdî her sê beşên Kurdistanê xuya dikin. Dema mirov diçe li ser serê Cûdî, xwe li ser wan deran re serwer dibîne. Cûdî hewayek wiha dide mirov. Tê zanîn Cûdî çîrokeke xwe ya dîrokî jî heye. Di efsaneya Cûdî de wek tê gotin: "keştiya Nebî Nûh, dema tofan radibe yekem car tê li çiyayê Cûdî disekine. Piştî demekê reşayî li wê derê tê dîtin. Ew kesên ku bi Nebî Nuh re ne, li Şirnex bi cî dibin." Tê gotin ku navê Şirnex jî ji wir tê. Ji peyvên şehrê nûh tê. Nêzikî Şehrê Nûh jî gundek heye jê re dibêjin Heştan. Ew heştan jî dibêjin, ji ber yekem car li wî gundî sekinîne, hêjmarên wan heşt kes bûye. Lewre hatiye gotin Heştan. Ew nav heşt kesên ku ji Nebî Nûh re bûne hatine wê derê cî bûne re tê.

Hevalê ku ez dixwazim qal bikim, bi bîr bînim, bi rêzdariyeke gelek mezin. Ji gelê gundê Heştanê ye. Navê wî yê malê jî Xelîl bû, malbat hêla aborî de lewaz e. Malbat gundî û welatparêz e. Ew heval di heman demê de şayanê wê efsaneyê jî dibe. Şayanê wî çiyayî û heremê ye jî.

Ez biharê tevlî refên gerîla bûm, heval Erdal jî payizê ji akademiyê, qada Rêbertiyê hatibû. Wexta ku hat, ji bo berpirsiyartiya Cûdî hat. Çawa hat ew berpirsiyarî jî girte ser

xwe. Me digot hevalekî nû ji qada Rêbertiyê hatiye, zêde şarezayê heremê nîne. Lê di demekî kurt de ji tevlîbûna wî me dît ku, ji me hemûyan zêdetir heremê baştir nas dike û ji gelê wê dere ye. Tê gotin her bûnek, di hundirê xwe de xwe di teze kirinê de ye. Guhartinan di xwe de çêdike. Her serdemek, çîrokeke xwe dide çêkirin. Hevalê Erdal bi hatina xwe û hilgirtina berpirsiyariya Cûdî re, çîrokeke nû da nivîsandin.

Hevalê Erdal dema ji qada Rêbertiyê hat, ji bo me ruhekî pir nû bû. Di me de jî ruhekî mezin da avakirin. Hem ji qada Rêbertî hatina wî, hem jî behsa qada Rêbertî kirina wî, behsa Rêbertî û jiyana wê derê, behsa perwerdekirina wê derê, bi behskirinê re dana jiyankirina wî gelek di asta jor de bû. Rêbertî di ruh, jiyan û pratîka xwe de dida jiyankirin. Me pir meraqa Rêbertiyê û jiyana wî dikir lê hevalê Erdal bi hatin û parvekirina xwe re ew ruhê qada Rêbertiyê di me de da jiyankirin. Ruhê li ba Rêbertî anî di qada Cûdî de da hemû hevalan. Wê demê jimara me gelek nebû. Em der û dora du taximan li wir diman. Hevalê Erdal coşeke mezin da me hemûyan. Em tev de bûn xwedî ruhekî pir mezin. Vêca hevalê Erdal wexta ku bi wî ruhî hat Cûdî, jixwe Cûdî di dîrokê de û têkoşîna me de cih û navekî xwe heye. Lê bi min be, wate, rist û cewhera Cûdî bi hatina hevalê Erdal û pêve destpê dike. Hûnê bêjin çima? Hevalê Erdal wexta ku bi wî ruhî hat Cûdî û ew ruh da hemû hevalên Cûdî, xwest li Cûdî ew şêwazê Rêbertiyê yê têkoşînê ku serkeftin têde mîsoger e bi cî bike û bi hevalan re parve bike. Ji bo wê hevalê Erdal, bi

ruhê Rêbertiyê, bi taktîkên nû şerek da destpêkirin. Tişta ku ez girîng dibînim ew xala ha ye.

Ez dixwazim balê bikişînim ser vê mijarê. Ê ku Cûdî di têkoşîna me de derxist pêş, ew taktîkên li Cûdî hatin meşandin, di encama van de ew şerê ku li Cûdî hatî kirin û encamên ku têde hatî girtin in. Weke tê zanîn, me heta wî wextî, bi giştî çalakiyên gerîla, ên ku dihatin kirin, bi qasî ku ez dizanim, şev dihatin kirin. Dijmin jî tedbîrên xwe bi giştî li gor wê girtibû. Parastina xwe jî wisa dikir. Her kesî dizanî ku heke gerîla şer ango çalakiyan bike, dê şev bike. Hevalê Erdal ev di Cûdî de guhert. Çawa guhert? Bihara 1992'ê hêşta berf li erdê bû, em jî di wargeha zivistanê de bûn, lê êdî em ketibûn biharê, dijmin xwest operasyonekê li ser Cûdî bike. Berî wê jî, dijmin kengî bixwesta operasyon li ser Cûdî dikir û karî têkeve bejahiya Cûdî. Wê biharê dema dijmin xwest operasyonê li ser Cûdî bike, pêş ketina wê ya bejahî; cihek heye jê re Girêhêmo tê gotin. Dijmin dixwest ji milê Silopya ve têkeve bejahiyê. Berî ketina wan a heremê jî hinek cihê stratejîk hene, destpêkê ev der girtin. Wexta ku girtin, şêwazê ku em fêr bûbûn çi bû? Wexta ku operasyon çêbû yan emê manewra bikin herin cihekî din an jî emê xwe di cihekî guncaw de veşêrin heta ku operasyon derbas bibe. Hevalê Erdal wê demê got: “em pêwîste li gor taktîkên demê ê ku Rêbertî ji me dixwaze hereket bikin, wisa bikin ku dijmin bi hêsanî nikaribe têkeve bejahiyê.” Digot: “pêwîste em bi roj lê bidin.” Ew gotina heval gelekî ji me re xerîb hat. Em şarezayê wî teşeyê şerkirinê nebûn. Hevalên weke min 1-2 sale beşdar bûne û hevalên kevintir jî şarezayê wê şêwaza şerkirinê

nebûn. Me digot emê çawa bi roj êrîşî ser dijmin bikin. Ji ber ku dijmin cihê xwe jî girtiye. Hevalê Erdal uslub û şêwazê ji Rêbertî fêr bûyî û ji wir anî, bi hunera xwe re kiribû yek, bi vî rengî bi me da pesendkirin ku em dikarin bi roj li dijmin bidin. Ev tişt bi pratîka xwe bi me da nîşandan.

Ev jî çawa bû? Şev plansazî danî. Taktîkê wê da diyar kirin. Plansazî wiha bû: emê şev biçin der û dora cihê dijmin girtî, çeperan bigirin. Sibê bi ronîbûna dinyayê re emê êrîşî dijmin bikin. Girek hebû nêzikî 200 metre dirêj e. 40-50 metre jî pahn bû. Qederekê leşker têde bi cih bûbûn. Demsal jî bihar bû lê erd bi temamî reş nebûbû, pelçîmê daran jî hîna venebûbûn. Mercên keş û hewa jî ji bo me zehmet e. Ji ber ruhê ku hevalê Erdal dayî me, astengiya keş û hewayê li me bandor nekir. Me xwe weke sê komên êrîşê bi pergal kir. Sê komên din jî di nêzik de dê sekinîbana, ji bo parastinê, ango alikarî dana komên êrîşê. Di navbera me komên êrîşê û ên parastinê de 50 metre hebû. Me dixwest weke hevalê Erdal ji me re got û em razî kirin, bi şêwazê şoqkirinê êrîş bikin. Me yê hem lê daba hem jî êrîşî ser kiriba. Çimkî dijmin jî li benda êrîşeke wiha nebû.

Hê dinya tarî ango şev bû em çûn me xwe nêzikî dijmin kir û me çeperên xwe girtin. Kom bi kom em di cihê xwe de sekinîn. Bi siharê re şansê me jî hebû ku dinya bû mij. Girê ku dijmin girtî û yên der û dorê di nava mijê de man. Bi mijê re me ji sê milan ve êrîşî dijmin kir. Gir hemû me xist destê xwe, dijmin nekarî zêde li ber xwe bide. Me 10-12 çek ji ser dijmin rakirin. Topeke 57 û hinek kel û pel jî me xistin

destên xwe. Di vê çalakiyê de me bi çavên xwe 15 termên dijmin dîtin.

Di vê çalakiyê de me fermandarê xwe yê hêja Xebat şehîd da. Ew wê wextê fermandarê manga me bû. Ji gunê Hewler a Cûdî bû, girêdayî bajarokê Cizîra Botan e. Ew heval di sala 1990'î de beşdar bûbû, xwedî malbat bû, malbat jî di nav têkoşînê de ye. Ez hevalê Xebat bi rêzdariyeke mezin bi bîr tînim. Rista hevalê Xebat jî di çalakiyeke wiha serkeftî de ne kêm bû. Şexsiyeta hevalê Xebat gelek li pêş bû, her çiqas kêm jî jiyan kiribe lê risteke mezin di jiyan û şerê gerîla de lîstiye. Hevalê Xebat şayane ku mirov di vegotineke din de bîne ziman.

Çalakî bi vî rengî bi dawî bû, weke taktîk jî em bi ser ketin me encameke mezin jî bi destxist. Ew dijminê ku xwest li wê qadê operasyonê lidarbixe, piştî ku bi wê şêwazê bersiv girt, yekser paşve kişiya. Leşkerên ku me li wan dayî û ên der û dorê hemû paş de çûn. Vê çalakiyê şoqeke mezin di dijmin de da çêkirin. Ev rastî di operasyona pişt re derket de jî diyar bû.

Piştî çalakiyê em vegeriyan hatin wargeha xwe. Em hevalên ku beşdarî çalakiyê bûn, me bawer nedikir ka me çawa ew çalakî kiriye. Heta wê wextê çalakiyên me dikirin çawa bûn? Mînak: hevalan êrîşî qaraqolan dikir ku ew jî di 1984'ê de destpê kiriye. Lê ew şêwaz min nedîtibû. Ew hevalên ku beşdarî çalakiyê bûyîn jî cara yekem bi wê şêwazê şer kiribûn. Pêştir me bi xwe jî êrîşî gir û qereqolan kiribû lê bi şev. Me êrîşî çeperek an du çeperan dikir û em dihatin. Di vê çalakiyê de me bi roj êrîş kir û hemû gir jî girt. Di cihê

çalakiyê de jî em qederekê man, vê çalakiyê cesaretek pir mezin da me.

Me dît ku heke em bi taktîkên rast ên Rêbertiyê şer bikin, “navbeynkarê wê hevalê Erdal e, fermandarê me yê mezin, di çalakiyê de jî li pêşiya me hemûyan de bû” emê misoger serbikevin. Di çalakiyê de çekên ku me li ser dijmin rakirin, me anîn wargehê. Wê demê yekem car topa 57 ketibû dest me. Di nav me de hevalek hebû leşkertiya artêşa tirk kiribû. Hevalê Celal, jê re dihat gotin Kobra Celal. Ez wî jî bibîr tînim. “di Sala 1999’ê de li Garê di encama lêdana tanqan de şehîd dikeve. Heta şehadeta xwe her tim di nav şer de risteke girîng lîst.” Hevalê Celal wê demê nû tevlî şoreşê bûbû. Mîlîstî dikir, ji ber aşkere bûbû, hat nava gerîla. Dema me çeka 57 anî, bi lingê wê ve anîbû. Me nedizanî lingê wî jê vekin. Me du hevalan, di berfê de xişikand û pişt re da ser milên xwe û anî. Hevalê Celal dema ew çek dît wiha got: “ez jê fam dikim.” Çek ji hev vekir. Dema wî ew kar kir me jî lê temaşe kir ku em fêr bibin. Çek ji hev xist şûn de dîsa parçe li hev da û çek kom kir paşê jî got: “temam e.” Me jî wê kêliyê li erdê dinihêrî ku parçeyeke çekê li erdê ma ye. Me ji hevalê Celal re got: “parçeyek zêde maye.” Wî got: “erê wele, min xeletî kiriye.” Çek dîsa ji hev xist û komî ser hev kir lê dîsa parçeyek zêde ma. Cara sêyem heman tişt dubare kir wê carê jî parçeyek zêde ma, paşê heval got: “evê ku ew parçe lê daye, zêde, lê daye.”

Li gor rêzikên rêxistinî, pêkanîna çalakiyê şûnde civîn hat li darxistin, di civînê de çalakî hat nirxandin. Me wê çaxê

coşeke mezin ji vê çalakiyê girt. Weke xala sereke, ez dixwazim dubare bînim ziman hevalê Erdal bi vî taktîkî dixwest em nehêlin dijmin weke dixwaze bikeve qadê. Ew taktîk jî bi wir ve sînordar nemine, belav bibe. Ji bo wê operasyonên ku dijmin xwestin piştî çalakiya me li ser Cûdî bike, vala derketin. Ji ber ku me gelek çalakiyên bi vî rengî li darxistin. Ez dixwazim wan çalakiyan jî vebêjim, ji ber ku wan çalakiyan Cûdî kir cihekî ku heta sala 1994'ê dijmin nikaribe têkeveyê. Ji bihara 1992'an heta 1994'an dijmin ji ber rast pêkanîna taktîkên Rêbertiyê, nedikarî têkeve çiyayê Cûdî. Dema di sala 1994'an de bi pêşengtiya deshilata faşîst a Tansu Çîler de operasyonên giştî û mezin hatin destpêkirin, nû dijmin karî bikeve Cûdî. Ê ku ew tişt pêşxist û pêk anî ew fermandarê mezin û hêja bû.

Di çarçova heman taktîk û şêwazê de me hinek çalakiyên din jî kirin. Paşê nêzî 15-20 rojan şûndetir dijmin dîsa xwest bikeve Cûdî, operasyonên dijmin bi şêwazên têne zanîn dihatin kirin. Destpêkê girên ku li dora Cûdî ne û karîn bejahiya Cûdî bibînin, digirtin. Rojek du rojan paşê jî gav bi gav dihatin bejahî digirtin û diketin nava Cûdî. Lêgerîn di nava bejahiyê de dikirin. Dema ku heval bidîtana pevçûn derdiket.

Teknîka şer a ku di destê dijmin de bû, weke niha nebû, hawan û helîkopter hebûn. Di bihara 1992'an de helîkopterên kobra nû derketibûn. Ji bo ketina nava şer û şer kirinê pispor nebûbûn, ji dûr ve lê didan lê zêde bandora wan çênedibû.

Di nava operasyonê de çete ji palekê hatin xwe nêzikî navsera Cûdî kirin. Dijmin di operasyonê de cihên girîng girtin. Wê çaxê hevalê Erdal got: "çalakiya berê me ber destê siharê kir, em vê çalakiyê jî berêvarê bikin" ne şev berêvarê me dê lê daba. Ji ber ku dijmin wisa fêr bûbû ku em êvaran şevreşiyê de çalakiyan dikin. Çalakiya berê siharê bû vê carê meyê berêvarkî çalakî kiriba. Bi rengê çar koman, ji bo êrîşkirinê, em hatin rêxistin kirin. Du kom jî ji bo parastinê bûn. Hejmara me kêm e, lewre jî di her komeke êrîşê de 3-4 heval hene, dîsa cebirxaneya me jî kêmbû. Bi her hevalekê re çar şarjor gule û bombek du bombe hebûn, her wiha li gel hevalên ku B-7 hilgirtî 1-2 roket hebûn. Pirsgirêka xurak wê demê tine bû. Ji ber ku gel bi me re bû. Gel piştgiriyeke mezin ji me re dikir. Şerê ku me di bihara 1992'an de dikir coşeke mezin dida gel, bi taybet jî gelê Şirnex û Botanê. Di Newroza 1992'an de coşa li Botanê derket, lûtke bû. Girêdaniya gel bi pêşveçûna hereketê ve têkildar bû, lê şerê Botan û bi taybet şerê ku li Cûdî hate kirin şênber bû. Lewre hem bi bandor bû, hem jî rista xwe lîst.

Me çalakî bi çar qolan pêk anî, di çalakiya berê de jî em bûbûn xwedî ezmûn. Cara çûyî mijê alikariya me kir, lê vê carê mij nebû, dem êvar bû û me zehmetî kişand. Me digot, di çalakiyên bi roj têne kirin de, em ê hema biserkevin, weke çalakiya destpêkê. Lê belê wisa nebû, ji ber dijmin li ber xwe da. Şehîd Erdal di çalakiyê de di nava koma parastinê de bû. Wexta ku dît weke koma êrîşê em zehmetiyê dikişînin, bi xwe hat kete nava koma êrîşê. Heta hingê du hevalên me şehîd ketibûn. Hevalek birîndar jî pişt re şehîd ket. Di her

komê de hevalek, koma me ya din jî fermandarê wê birîndar bûbû. Lewre ji dewrê derketibû. Komeke me saxlem mabû. Birîndarên wan jî hebûn. Her çar komên me jî ketibûn rewşekê ku nikarîbûn pêşdetir biçin. Wexta ku hevalê Erdal hat ew hevalên ku em saxlem mabûn, “şeş kes bûn” li gel hevalê Erdal em bûn heft kes. Rexmî ku heval jî şehît ketibûn, bi hatina hevalê Erdal re me coşek mezin girt. Me êrîşa xwe berdewam kir. Bi hatina hevalê Erdal şûnde di nava deh deqan de me ew tepe girt, ango xiste destê xwe. Em çûne ser neh termên dijmin. Me ji wî girî 11 çek ji ser dijmin rakir û anî. Çante, bêtêl, dûrbîna şev û roj, wênekêş, kel û pel ê leşkeran me anîn. Ew çalakî jî wisa bi serkeftî bû.

Di vê çalakiyê de sê hevalên me şehîd ketin, ji wan 2 heval ji heman gundî bûn, yan xal û xwarzî, yan jî mam û birazî bûn, navê hevalekî Baran yên din jî Gabar bû. Her du jî ji gundê Serêdehlê ne, gund girêdayî Şirnexê ye, her du jî di cihê çalakiyê de şehîd ketin. Cenazeyên herduyan jî me hilgirt û sipartin axê. Hevalên birîndar jî me xelas kirin. Hevalê Baran hîna genc bû. Ew salek bû tevlî refê gerîla bûbû. Hevalê Gabar jî xwedî malbat bû, ew jî 2-3 sal bû tevlî gerîla bûbû. Rista wan a pir girîng di qadê de hebû. Ji gelê qadê bûn, herêm baş nas dikirin. Ew cihê ku lê şehîd ketin, derdora 200 metre jora gundê wa ne. Ewqas nêzikî gundê xwe bi lehengî şehîd ketin. Hevalê Gabar fermandarê mangê bû. Wê demê rista fermandarê mangan pir mezin bû. Hevalên ku rêbertî ji çalakî û rêxistinê re dikirin her ew bûn. Ji hevalê Baran, hêviyên mezin hebûn lê mixabin zû şehîd ket. Hevalê din ê ku şehîd ketî, me destpêkê nedît, pişt re nêzikê çalakiyê

cihêkî me ew dît. Di çalakiyê de birîndar dibe, dixwaze xwe bigihîne cihê koma parastinê. Di navbera komên êrîşê û komên parastinê de mabû, nikarîbû xwe bigihîne hevalan û li wir jî şehîd ketibû. Navê wî Metîn bû, ji gundê Sipîndarok a Cûdî bû. Lê li metropolan mezin bûbû. Salek û nîv bû ku hatibû nava gerîla.

Weke fermandarê qadê, yê ku taktîk datîne, di koma êrîşê de jî cih digire, ew fermandarê mezin hevalê Erdal e. Pêwîste em wî hevalî ji xwe re mînak bigirin û weke pêşengê xwe bibînin, hertim bibîr bînin. Ew kesên weke hevalê Erdal'in, em fêrî şer kirin, fêrî parastinê kirin, hem jî rastiya me û ya dijmin bi me dane fam kirin. heke hevalê Erdal nebûya, ew çavaniya xwe li gel Rêbertî neanîba, gelo me yê bikaribûya bi roj êrîşî dijmin kiriba yan na? Bi baweriya min me yê nekiribiya. Me yê wisa nikaribiya cesaret jî bikira. Di çalakiyê de wexta ku dît emê şikestinê jiyan bikin, hevalê Erdal hat bi xwe beşdarî êrîşê bû û bi ser jî xist. Ji ber dizanî taktîk tê ceribandin, heke şikestin bê jiyîn dê tirseke mezin çêbibe, em ê nikaribin wî taktîkî bi cî bikin. A din jî em ê nikaribin çalakiyan nekin. Emê bêjin ew taktîk xelet e. Em ê bi roj çalakiyan nekin, ew jî ji bo me dibe şikestinek, ew jî tê wateya em gavan ber bi paş ve diavêjin. Ev tişt hîs kirin lewre bi xwe hat kete êrîşê, ji bo rastiya taktîkê bi me bide qebûlkirin. Da ji me û dijmin re wî tiştî îspat bike, ya ku îspat bû ew bû ku em dikarin nava rojê êrîş bikin, dijmin ji çeperê wî derxin û bi serbikevin.

Di dîroka şerê me de ev gavên mezin in, bi kesayetên mîna Erdalan hatine avêtin. Van kesayetan û van çalakiyan, di dîroka şerê me de rista mezin lîstine.

Ew tişt di pêvajoyekê de hatin jiyîn ku li qada Cûdî bi vî şêwazî çalakî berdewam bûn. Wî wextî dijmin bi roj di bejahiyê de hereket dikir. Ez dixwazim bi çalakiyekê bînim ziman ka rewş û atmosfer çi bû. Di nava bejahiya Cûdî de gundê Bilika heye, Şirnex jî jê dûr e. Riya Şirnex û Qlebanê tê zanîn, dijmin wê wextê rêyên gundan çêdikirin. Dozerek anî bûn riya 10-12 km di nav daristanê de çêdikirin, ev rê jî diçû gund. Li gel dozerê komek leşker danîbûn, ku qaşo em dozerê neşewitînin. Wê wextê, bi roj li gel dozerê, hatin û çûna leşkeran asayî bû, lê bi hatina hevalê Erdal re ew rewş hat guhertin. Rojekê em di wargehekî xwe de sekinîbûn, dengê dozer û maşînan hate guhê me, girvanên me hebûn wan jî agahî dan û gotin ku dozer di rê de kar dike. Hevalan gotin diçe ku derê? Wan jî gotin diçe gundê Bilika. Hevalan gotin, çi li gel heye? Gotin leşker pêre ne. Hat pirsîn hejmara wan çiqase, girvanan gotin, bi qasî yekîneyekê ne. Hevalê Erdal yekser rabû ser xwe, di rewşên asayî de me bi roj hereket nedikir. Rixmî ku me du çalakî kirine jî lê hêşta em tam fêrî hereketa roj nebûbûn; Em hîna li pêşiya tevgera dijmin a bi roj nebûbûn asteng. Hevalê Erdal bi rabûna xwe re ji me re jî got: “rabin ser xwe.” Me got çima? Wî got: “em nahêlin dijmin bê.” Hevalan gotin, nabe em bi roj hereket bikin, em gerîla ne. Wî jî got na, em gerîla ne lê dijmin jî hatiye, ketiye bejahiya gerîla de. Heke leşker dikare bi roj were û bikeve nav bejahiya gerîla, gerîla jî dikare li wî leşkerî bide. Hevalê

Erdal da rê çû, em jî ketin pey wî û çûn. Heta em çûn, dijmin derbasî nava gund bûbû. Me got: “em çawa bikin.” Wî got: “ma ne di gund de namînin, dê her vegerin.”Em li bendê man ku dijmin vegere, saet der û dora yekê nîvrobû dijmin hat. Me li kêleka rê, li ser serê wan kemîn danîbû. Di hevalê Erdal de cesaret û dilêriyeke bêqedîn hebû, wê dilêriya wî em jî bi xwe re kaş dikirin. Pêl çawa belav dibin, agirekî mezin û geş çawa dora xwe germ dike, hevalê Erdal jî wisa bû. Bêtirs bû, dudilî pêra tine bû, nêzikatiyên bi guman raber nedikirin. Ew taybetmendiyên wî der û dora wî jî bandor dikirin. Hewa pir germ bû, lê xema me nebû, ji ber ku me dê çalakiyek kiriba, ji ber kelecana çalakiyê haya me ji sincirîna germahiyê nebû. Çawa ku biharê di berfê de me çalakî kir, em bi sarmayê nehesiyan, havînê jî ji ber kêfxweşiya pêkanîna çalakiyê, me germahî hîs nedikir.

Ji sê hevalan yek jî hevalê Erdal bû “bi qasî tabûrekê hêza wan hebû” ji dijmin re kemînek vedan. Me li dijmin da û li wê derê 15 leşkerê artêşa tirk hatin kuştin. Yên mayî jî ketin nav bejahiyê wenda bûn, kes nema. Me çekên leşkerên ku hatine kuştin, wergirt û paşê jî me milê xwe hejand û em vegeriyan wargeha xwe.

Nexasim dema ez behsa cesareta hevalê Erdal dikim ev nayê wateya ku di hêzên me de cesaret tine bû, bêguman cesaret hebû. Ez çima wê dibêjim, ji bo ku bê famkirin fermandarê herêma me çima bi du hevalan ve di kemînê de rûdine, ez dixwazim îşaret bi vê bikim. Di wan salan de em du taxim heval bûn û yekpare bûn, hevaltiya me jî wisa bû.

Em nêzikî 40 kesî bûn lê yek dest bûn. Şehadeta hevalekî dibû êşa me hemûyan, birîndarî jî bi heman şêweyî bû. Yekî xwe bitirsandiba, bandor li ser me hemûyan dikir, heke yekî jî wêrekî nîşan daba bi heman rengî bandor li me hemûyan dikir. Her hevalekî jî dixwest çi tişta başe, wî bike. Diyardeya ku em dibirin serkeftinê wêrekî bû, pirsgirêk ne ew bû ku hevalan xwe paş didan ku hevalê Erdal xwe dide pêş. Berevajî hemû hevalan xwe didan pêş, xwe dana pêş a hevalê Erdal, sedem ew bû ku dixwest taktîk bide rûniştandin. Hedefa wî hevalî jî hemû ev bû.

Piştî çalakiyê êdî me bi roj hereket dikir, ew tirsa tegera bi roj hate şikandin. Feraseta ku heye dibêje em bi roj nikarin çalakiyan bikin hate şikandin. Fikra ku digot, dijmin dikare bi roj bikeve qadên gerîla, hate têk birin. Weke dihat gotin: em nikarin, nehêlin dijmin têkeve araziyê, em nikarin pêşî lê bigirin hate derbas kirin. Êdî em difikirîn ku dijmin bikişînin qadên xwe û lê bidin.

Rojeke di xeta Qilebanê re dijmin kete qadên ku em lê tevdigerin. Hevalê Erdal, ji min û hevalê Ferhad re got: “xwe hazir bikin”.

“hevalê Ferhad ji gundê Hewlerê bû, pişt re şehîd ket, bi vê qalkirinê ez fermandarê xwe hevalê Ferhad bi bîr tînim. Hevalekî pir hêja bû, risteke pir girîng di pêngavên 91, 92 û 93 a Cûdî de dabû ser milên xwe di wî şerî de roleke girîng lîstibû.”

Hevalê Erdal got: Hûn dê biçin cihê ku jê re Riyalê Cevher tê gotin, paleke di navbera Şirnex û Qlebanê re dirêjî nava Cûdî dibe. Dijmin di wir de derket bejahiyê. Dem ber êvarê bû. Ji me re hat gotin: “biçin binêrin dijmin heta kuderê hatiye.” Me nedizanî hevalê Erdal amadekariya çalakiyekê dike. Ji me re got: “herin lê binêrin û werin.” Em her du heval di nava daristanê re çûn. Di nav daristanê re me xwe zaf nêzikî dijmin kir. Di heman kêliyê de me dît ku dijmin di nav daristanê de li cihekî rût kom bûye. Em 60-70 metre nêzikî dijmin bûbûn. Me got, em çi bikin çi nekin, haya me ji hevalê Erdal wan jî nîne ku amadekariyên çalakiyê dikin. Me got, dijmin kom bûye vaye em jî li vê derê ne, emê lê bidin. Ji ber ku em wisa fêr bûbûn em li kuderê dijmin bibînin emê lêbidin, hevalê Erdal em wisa fêr kiribûn. Me herduyan bi hev re lêda, lê me êrîşî ser dijmin nekir. Me 4-5 kes ji dijmin kuşt, erd zaf rûtbû û termê wan jî li erdê xuya dikirin. Em bi keyf û coş hatin wargehê, me got qey keyfa hevalê Erdal dê zaf were, dê ji me re bêje destê we xweş. Lê dema çavên me li hevalê Erdal ket, me dît ku moralê wî ne li cih e. Wî ji me re got: “we çi kir, ew çi deng bû?.” Me got: “heval me çalakî kir, me dijmin kuşt.” Xwe bi me re aciz kir, got: “we çima bê destûr wisa kir.”Me jî got: “heval em îsal pêde her wisa dikin.” Wî got: “ma bû çi hûn her yek bi serê xwe bûne Ernesto Che Guevara?.” Wê demê me Ernesto Che Guevara jî nas nedikir, me nedizanî kî ye.”Pişt re me Ernesto Che Guevara jê pirsî kî ye, ne kiye, ji me re ew jî got û ji me re behsa wî kir. Domand û got: “we karê me têkda.”Me got: “çima?” wî got: “em difikirîn ku îşev lê bidin, lê teze plansazî

xira bû, dijmin bi me hesiya ku em li vir in. Êdî dê tedbîrên xwe bigire, lewma em nikarin çalakiyê bikin."Piştre em çûn rûniştin. Me jî jê pirsî, me got: "ka te digot emê bi roj çalakiyan bikin?" Wî jî bersivand: "hûn pêwîste wisa fêr nebin, erê em dibêjin emê bi roj çalakiyan bikin lê nayê wê wateyê ku emê her car tenê bi roj çalakiyan bikin. Ev taktîk in, di taktîk de sînor tine ye, em dê sibehan, nîvro, êvarê çalakiyan bikin. Em bizanibin kîjan wextî dijmin ne amadeye, li bendê nîne, ji me re firsete, emê têde dijmin şaş bikin, em dê çalakiyan bikin." Wê wextê me zanî, taktîkên gerîla ên pêkanîna çalakiyan, bê sînorî û dewlemendî û pêşdestî heye.

Di destpêka havînê de em çûn herêma Besta, li wir civîna fermandariya eyaletê hebû. Em du heval jî li rex hevalê Erdal çûn. Ew beşdarî civînê bû, roja duyem "wê çaxê bêsîm di qada gerîla de nû dihatin bikar anîn" hevalên li Cûdî bûn, bang kirin û gotin dijmin dixwaze têkeve qadê. Me jî got: "çi bûye?" Wî got: "diyare hevalan lê nedane." Me got: "dê çawa be?" Wî got: "em dê bişopînin." Roja 3'ê mîsoger bû ku dijmin lûtkeya ser serê Cûdî girtiye. Ew der jî Sefîn e, cihê din wek deriyê Keran jî girtibûn. Ji milê Silopya ve dijmin bi şev hatiye. Dijmin jî êdî taktîkên xwe guhertiye û bi şev tê dikeve bejahiyê. Berê bi roj dihat û operasyon dikir, vê carê bi şev hatiye. Hevalê Erdal ji min re got: "tu yê biçî, komek heval hene tu yê hem wan bibî, hem jî ji hevalan re bêjî, pêwîste nehêlin dijmin hinde bi asanî bikeve bejahiyê. Bi hêsanî ketina dijmin a nava bejahiyê nayê pesend kirin. Eger derfet hebe û heval lê nedin, ev îxanete. Pêwîste ev rewş neyê

asayî kirin. Dijmin were operasyon bike û here; ev nayê qebûl kirin.”

Ez bi komekê re vegeriyam hatim Cûdî. Koma min bi xwe re anî dê derbasî Başûr bibûna, ew derbas bûn. Ez jî çûm gel hevalên Cûdî û fermandarên ku li wir mayîn. Min ji wan re fermana hevalê Erdal ragihand. Em ketin nava liv û tevgerê, roja paşî jî hevalê Erdal bi xwe hat. Rixmî ku hîna karê wî li Besta temam nebûbû jî sebra wî nehatibû û bi rê ketibû, hate Cûdî. Heval hat nehat 2 saetan bêhna xwe veda û saet 10’ê roj em li gel komek hevalan ji wargehê derketin. Got: “em ê biçin keşfê, cihên ku dijmin girtiye keşif bikin, ka em dê karibin lê bidin an na.”

Diçin, gav bi gav xwe nêzîkî dijmin dikin, dijmin jî komeke leşkeran dişîne girekî ku ji girê lê dimînin piçûktire da ku dora xwe keşif bike. Ew gir jî dikeve navbera koma hevalê Erdal û girê dijmin. Ev koma leşkeran û ya hevalê Erdal sing bi sing rasta hev tên, wê çaxê heval li leşkeran dixin. Di heman kêliyê de pevçûnê destpêkir. Me jî dengê çekan bihîst û em derketin ser gir ku parastina hevalan bikin. Saetek ji êvarê re mabû ango ber êvar bû, pevçûnê dirêj kir, heya êvarê. Me jî xwe amade kir ku em xwe bigihînin hevalê Erdal wan. Ji ber ku di navbera me û hevalê Erdal wan de hinek valahî hebû û ew der jî di bin kontrola dijmin de bû. Me xwest em êvarê xwe bigînin hevalê Erdal ji ber em dizanin dê êrîşî dijmin bike. Me amadekariya xwe dikir da biçin, mixabin dema me xwe amade dikir ku em biçin, me dît ku hevalên li gel wî hatin. Hevalê Erdal ji serê xwe ve birîndar

bûbû, fîşek li eniya wî ketibû pişta serê wî re avêtibû. Beşek ji bedena wî diliviya lê beşek jî qerimî bû, zimanê wî jî nedilivî lê çavên wî vekirîbûn. Bi qasî ku min jê fam kir, dikarî me nas bike, hişê xwe winda nekiribû; nedikarî tiştekî bibêje, hema wisa sekinî bû. Di wê kêliyê de, hêşta nîv saet roj mabû, me dikarî bi çavan hev bibînin. Hestên ku wê demê hatin jiyan kirin, anîna wan a ziman mirov zehmetiyê dikişîne. Gelek hestên ku heta niha jî bandor li ser jiyana min kirî, min çavên wî de dîtin. Hêviyên wî ji me hebûn tiştên ku dixwest pêş bixe, vê carê bi awirên xwe ji me re digot. Weke ku bêje êdî hûnê berdewam bikin. Tiştên me dixwest em bi hev re bikin êdî ji vir û pêve hûnê berdewam bikin, nesekinin. Di wê kêliyê de destê min digirt, destê hevalên din jî. Jixwe destekî wî tenê diliviya lê dîsa jî bi destekî xwe, destên me ango hevalên ku em dora wî kom bûbûn digirt. Bi nêrînê û bi girtina destê me ve bi me dida hîskirin weke ku bêje: “**ev têkoşîn ne bi min dest pê kiriye, ne jî bi min xelas dibe.** Tişta ku min daba we min da, êdî hûn şopdarê wan bin, hûn dê têkoşînê mezintir bikin.” Piştî 22 sal ez vê şehadetê vedibêjim, hestên ku wê demê min jiyan kirî, ez bi heman rengî niha jî jiyan dikim. Ewçend bandora xwe li ser min kiriye.

Me hevalê Erdal rakir û bir. Hestên ku min jiyan dikirin, hemû hevalan jî heman hest jiyan dikirin. Şansê min û hevalê Erdal bû “berê navê wî Cîhat bû, piştî şahadeta hevalê Erdal, wî jî navê xwe Erdal danî, eslê xwe Asûrî bû, ji gundê Bêspînê yê Cûdî bû, bav û birayê wî jî şehîd in. Wî hevalî, pişt re çav û lingê xwe ji dest da” ez û wî hevalî, em ketin

nava hewildanê, me hevalê Erdal rakir bir heta deşta Silopya. Gund û gundiyên welatparêz hebûn, alikariyeke zaf mezin dane me. Dubare dibêjim, xwe fedakirin ji bo hevalên xwe, rêgezeke vê hereketê ye, em ji hereketa xwe fêr bûn, bi taybet jî ji kesekî weke hevalê Erdal. Me jî ji bo hevalê Erdal xwe xiste nava xeteriyê, ji bo em hevalê Erdal bigihînin bijîşkên baş û em wî tedawî bikin, em di deşta Silopya re, di nava dijmin re derbas bûn û me ew bir gundekî welatparêz. Me bijîşk jî “bi riya milîsan û rêxistina me ya nav bajêr ji Silopya anî. Me hevalê Erdal li wê derê da tedawî kirin. Du rojan em li gel man, rewşa wî baştir bû.

Piştî wî qasî, guncaw hat dîtin û bi fermana rêxistinê, pêwîst bû ku hevalê Erdal di deriyê Xabûr re derbasî qada Başûr bûba. Ti çare nemabû, di nav bajar û dijmin re dê bi rêya rêxistina me ya deşta Silopya bihata derbaskirin. Risteke mezin a hevalê Egîd di derbaskirina hevalê Erdal de hebû. Hevalê Egîd berpirsê rêxistina deştê bû, jixwe pişt re hate Cûdî û bû mamosteyê min. Ez ferî çalakiyan û çalakiyên sabotajê kirim. Hevalê Egîd ji Rojava, Ji bajarokê Endîwerê bû. Ew jî pişt re li deşta Silopya şehîd ket. Ez wî hevalî jî bi bîr tînim. Rêxistina ku hevalê Egîd di deşta Silopya de pêş xistî, bi rêya wê rêxistinê me heval Erdal derbasî Başûr kir. Peywira me jî hetan sînor bû, pêwîst bû ji sînor em dîsa vegeriyana Cûdî.

Pêwîstbû hevalê Erdal di milê Zaxo re derbasî gel hevalên Başûr, Heftanînê bûba.

Bi vegera me ya Cûdî re me dît ku heval bi kelecaneke mezin li benda me ne. Bi hestyariyeke mezin çav li rêya me bûn, dixwestin ji me fêr bibin ka çi ji hevalê Erdal hatiye. Dema ku em ji hevalê Erdal qutbûn, hêviya me hebû ku dê baş bibe. Me ew xweşhalî-keyfxweşiya xwe bi hevalan re parve kir.

Lê mixabin piştî du rojan agahî ji me re hat ku hevalê Erdal şehîd ketiye. Me pişt re bihîst ku dema derbasî Başûr dibe li nexweşxanê dimîne, li wir jî şehîd dikeve. Raste hevalê Erdal ji serê xwe ve birîndar bûbû, birîna wî jî giran bû. Lê şehadeta wî ya li nexweşxaneya Zaxo, tarî ma, hîna jî şehadeta wî zelal nebûye. Bijîşkê destpêkê ji Silopya hatî ser şehîd Erdal, baweriya wî kêm bû ku şehîd Erdal bijî. Piştî du rojan bijîşk got: "dê bijî lê dibe ku kêmendam bimîne". Ango dê milekî wî ji kar bikeve. Lê mixabin piştî du rojan di nexweşxaneya Zaxo de şehîd ket.

Piştî şehadeta hevalê Erdal, hevalên ku perwerdeya wî dîtine, ên ku ew qonax bi wî re jiyan kirin, hemûyan; ew biryardariya ku jê girtin, di pratîka xwe de bi cî anîn. Şêwazê çalakiyê yê hevalê Erdal, ji aliyê wan hevalan ve hate berdewamkirin. Hevalan nehîşt ku li Cûdî valatî li ber çavan bikeve ku dijmin jî bizanibe hevalê Erdal şehîd ketiye, da nebêje piştî şehadeta wî bi şêwaza wî çalakî nayên kirin. Ji wê demê û pêve heta sala 1994'ê dema operasyonên giştî û mezin ên Kurdistanê, dijmin nedikarî bikeve Cûdî, heman şêwaz, taktîk û ruhê şer li Cûdî hate pêşxistin.

Xaleke din jî ez dixwezim vebêjim, ev xal jî me pişt re fêm kir. Wexta me ew şer dikir, aliyê wî taktîkî yê siyasî, pêşxistina şer, ruhê şehîd Erdal dixwest pêş bêxe, me nedizanî. Me nedizanî li der û dorê çi diqewime. Pişt re tişta em pê hesiyan, di bihara 1992'ê de, pêngaveke pir mezin hat xwestin li ser hereketê bê çêkirin. Ew pêngav jî li Başûr de bête çêkirin. Êrîşeke mezin li Başûr de were kirin. Em têgihiştin ku şehîd Erdal dixwest giraniya ku tê xwestin li Başûr bê kirin, bi pêşxistina şer ya li qada Bakur belav bike. Ji bo dijmin nikaribe xwe komî ser hev bike û êrîşî Başûr bike. Pêşî girtina li êrîşên Başûr, bi pêşxistina şerê Bakur pêkan e, ev aliyê girîng yê şehîd Erdal me pişt re fam kir.

Şehîd Erdal kesayeteke Botanî bû. Li Botanê jî ji gelê Şirnexê ango niştecihê gundekî Şirnexê bû. Kesayeta Botanê jî zêde na axive, kesayeta ez dixwazim vebêjim, ya ku heta niha jî di Botanê de berdewame û dijî. Zêde pêwîst nabîne biaxive, dema têgihîşt tiştek raste, dixwaze bi kirinê nîşanî te bide. Ew taybetmendî min di fermandarên ji Botanê û di şervanan de jî gelek caran dîtiye, mînakên wan jî zahfin. Hevalê Rojhat Bilûzerî, Hevalê Şerîfê Sipêrtî, Hevalê Reşît Serdar, Hevalê Hemze, Hevalê Adil, û gelek hevalên ku navê wan nayê bîra min bê hêjmar hene. Ev heval hemû lehengên ku li Botanê derketin e, wan hertim xwestin bi kirinê tişta bibêjin piştrast bikin.

Tiştên şehîd Erdal dikirin heta niha jî mane, ji ber ku di mejiyê me de hatine çandin. Lewre ti carî ji hişê me dernakeve, ew fermandarî û rêvebertiya wî kirî û pêşengtiya

wî raberkirî, ya herî rast e. Ew rastî, rastiya Rêbertiyê û hereketa me jî derdixe holê. Ev jî wiha ye: kesayeta hatiye parçekirin û ji xwe hatiye biyanîkirin bi rastiya rêbertiyê dibe pêşengê şerê herî mezin û dijwar. Kesayetên wisa ji Botanê derketin ku karîn rêbertiyê ji şerên pir mezin re bikin. Ev jî rastiya Rêbertî û PKK derdixe holê. Tevî ku demekî dirêj di ser re derbas bûye jî hîna bandor û olana wê heyamê di zihnê me de ye. Digotin ji Botanê fermandarên mezin dernakevin ku fermandariyê bikin. PKK ew fermandarên wisa derxistin holê. Ew jî di şexsê Erdal'an de, Adil'an de, Reşîd'an de, Şerîf'an de, Rojhat'an de, Hamzeyan de îspat bû. Bi ya min di bihara 1992'an de şehîd Erdal ew şikand. Teorî û nêrînên berê bi sekna xwe ji holê rakirin, di encamê de ew jî rastiyeke PKK'ê ye.

Bi bîranîna kesayetên wisa, girînge. Pêwîste em xwe di kesayeta wan de bibînin. Ji xwe re mînak bigirin, ji kiryarên xwe re wan bikin rêber. Da ku em bikaribin li ser xeta rast bimeşin, serkeftinê bînin û wan jî bi bîr bînin. Wan bidin jiyankirin.

## LEHENG EW E KU
## MEJÎ, DIL Û HÊZA BEDENA XWE DIKE YEK

**EV DINYA NAN Û BEXTE**

**EVÎN NEBE GELEK SEXTE**

**HÊVÎ NEBE ÇI BEDBEXT E**

**HIŞYAR BE NIHA WEXT E**

**Zerdeşt Bedirxan**




**Nasnav**: Karker

**Nav û Paşnav**: Kawan Brahîm

**Cih û Dîroka Ji Dayikbûnê**:1979 Silêmanî

**Dîroka Tevlêbûnê**: 1997

**Dîroka Şahadetê**:25 Adar 2006 li Mûşê, deşta Şînê.




**Nasnav:** Sîpan Sason

**Nav û Paşnav**: Muzaffer Öndeş

**Cih û Dîroka Ji Dayikbûnê:** 1981 Sason

**Dîroka Tevlêbûnê:** 2001 Stenbol

**Cih û Dîroka Şehîtbûnê:** 11 Adar 2007 Pasûr, Amed





**Nasnav**: Welat Xerzan

**Nav û Paşnav**: Musa Bostan

**Cih û Dîroka Ji Dayikbûnê:** 1975 Mereş

**Dîroka Tevlêbûnê:** 00 00 1999 / Êlih

**Cih û Dîroka Şehîtbûnê**: 19 Gulan 2012 Heftanîn





**Nasnav:** Xerzan

**Nav û Paşnav:** Şehmus Değirmenci

**Cih û Dîroka Ji Dayikbûnê:** 10 Mijdar 1980 Sason Êlih

**Dîroka Tevlêbûnê**: 1996

**Cih û Dîroka Şehîtbûnê**: 5 Îlon 2006, Hezo-Êlih




**Nasnav**: Berxwedan

**Nav û Paşnav**: Xalif Akbıyık

**Cih û Dîroka Ji Dayikbûnê**: 1982 Êlih

**Dîroka Tevlêbûnê**: 2001, İstanbul

**Cih û Dîroka Şehîtbûnê**: 5 Îlon 2006 Hezo-Êlih

## Azad Ararat

Li Sasonê çiya hene, dema ku tu lê temaşe dikî, çiya bang dikin û dibêjin: “dema tengav bûyî, neçar mayî, were vaye ez li vir im.” Bi vî awayî, xwedî li niştecihên quntarên xwe derdikeve. Weke dayîka Star, himêza xwe vedike û dibêje: “were, vaye bi hezaran sal in ez li vir im; min parastiye çand, keramet û hebûna we. Her ku we serî hildida ez bûm ew a ku ji we re baskên xwe vedikir.” Çiyayan bi vî şêwazî di bîreweriyên Kurdan de cih girtiye. Li hemberî dagirkerî, mêtinkarî û spartina bêkerametî, mirovên ku li van deveran dijîn her tim xwe xwedî hêz û berxwedanê dîtine. Ji ber ku xwedî çiyayên Mereto û çiyayên mîna wî ne.

Belê, Sason herêmeke çiyayî ye. Li gel çiyayan, xwedî deştên berhemdar e. Çemên Sason û Zorê jî li heman heremê ne, ji çiyayan derdikevin û heta Dîcleya nazdar diherikin. Geliyê; Zorê, Xî û Sason li wê herêmê ne. Ew gelî jî ji wan geliyan e ku xwedî taybetmendiyên xwedîkirin û parastina mirovan in û ji bo çandinî, ajaldarî gelek guncaw in.

Sason di dîroka Kurdistanê de jî xwedî cihekî taybet e. Di serdema împaratoriya Osmaniyan û di serdema komara tirk de jî hertim bi risteke serhildêr rabûye. Eşîrên herêmê piranî temsîla Kurdên azad ên xwe radest nekirî dikin. Ji pirtûka Şerefname jî em dizanin ku serhildanên Kurdan li hemberî Osmaniyan hebûne. Di çarika sedsala bîstan de Eliyê Ûnis serî rakiriye û pêşengtiya berxwedanê girtiye ser xwe. Li gel van rastiyan rastiyek din jî heye ku mîna kurmê darê ye; ji darê peyda dibe. Ev jî ew e ku weke takekes û weke eşiret her dem îxanet digel berxwedayinê hebûye. Dagirker pir bi hêsanî dikaribûn êlan li hemberî hev sor bikin û bidin şerkirin. Li gel berxwedanên pir hêja dema Osmaniyan û dema komara Tirkiyê; Kurdistan di bin potînên leşkerên dagirker de maye.

Bi derketina ser dika dîrokê, PKK'ê karîbû hemû leyistokên dijminan ên li ser Kurdistanê pûç bike.  Bi vî awayî êdî li Kurdistanê xeta berxwedan û xeta îxanet-noker ji hev hate cihêkirin. Ev diyarde jî bi dayîna xwîna pîroz a şehîdan şênber bû. Salên 1980 têkoşîna hemdem li Êlihê rayên xwe berda nav civakê. 1980 û şûn de têkoşîna azadiyê êdî şêwe guhert û xwe gihand asta gerîlatiyê. Ji wê rojê û şûn de heta roja me ya îroyîn li çiyayên Sasonê gerîla kêm nebûne.

Di encama pevçûnan de, Li Sason û çardora çiyayê Mereto gelek berxwedan hatine jiyîn. Lewre strana li ser şehîdên Sasonê, bilêvkirina çiyayên Sasonê dest pê dike.

Ez jî wek şopdarê dîroka nêz û dûr a van rastiyan, di sala 2005'an de çûm Sasonê ligel hevalê xwe, yên ku hê em hev nas nakin. Çûyina min a herêma Sasonê, çûyineke mayinde nebû. Ji bo bicihanîna erkekê, ez li wir bûm. Çend rojên me yên destpêkê bi naskirina hev du derbas bû. Hevalên ku me li wir hev nas kirin, yek ji wan hevalan Karker Ciwanro bû. Hevalên din jî Berxwedan bû. Yê dîtir jî hevalê Welat Pazarcix bû.

Karker Ciwanro hevalekî ji başûrê Kurdistanê ji paytexta rewşenbîrî ji Silêmaniya rengîn bû. A ku hinek hêzên kurdî bi salane dixwazin bikin paytexta xiniziyê (îxanetê). Hevalê Karker di eslê xwe de ji beşê zaravayên Kurdî kurmanciya jêrîn (soranî) bû. Li hemberî xeta xiniziyê ya ku li başûrê welatê min tê sepandin, hevalê Karker rabû û tevlî refên gerîla bû. Li başûrê welat dagirker hatibû derxistin, lê derxistina dagirkeran bi xwe re azadiya civakî neanîbû. Azadiya ku bi dest ketibû ji bo hin axa, şêx û malbatên derebegan bû; ango çîna jorîn a Kurd. Lewre hevalê Karker beşdarbûna nav refên gerîla ji bo azadiya rasteqîne guncaw dîtibû. Naskirina me ya hev û din li çiyayên jorîn ên bi heybet destpê kiribû. Hevalê Karker li deşta ku îxanetê li ser gelê me disipêre rabû û hatibû çiyayên jorîn. Ji ber ruhê wî yê asî û xwesteka ji azadiyê re. Hevalê Karker hertim bi coş bû. Kedeke wî ya bê dawî hebû. Di mercên zahmet de jî dikarî henekan bike û hevalên dora xwe bide kenandin. Tê gotin:

‘’Di şer de ken diyardeya herî cidî ye.’’ Hevalê Karker jî li gorî vê rastiyê tevdigeriya. Herêma Sason bi paşvekişîna gerîla ve vala mabû. Rêveberiya qada navîn a navenda xwe Amed e erk ji nû ve mayina li herêma Sasonê dabû hevalê Karker digel hevalê Welat û Berxwedan. Hilgirtina vî erkî; ango girtina ser milê xwe ne karekî asayî û ji rêzê bû. Ev her sê heval, ango welat, Karker û Berxwedan jidil û bi xwestekeke mezin ji bo bi cihanîna erkê xwe rabûn.

Hevalê Karker di nav gelê qada navîn de ji hevalên din zêdetir dihate heskirin. Ji ber ku gelê Amedê xwedî rabihûriyeke bi rûmet e. Gel ji bo hevalê Karker digot: “Ji warekî dûr hatiye û li vê derê ji bo me şer dike.’’ Ji her kesî zêdetir qedir û qîmeta hevalê Karker digel girseya welatparêz hebû. Hevalê Karker dema mayîna xwe ya li qada navîn “dewr û berê bajarê Amedê” fêrî zimanê tirkî jî bûbû. Lê belê tirkiya wî mîna tirkiya Amediya şikestî bû. Dema ber bi dawiya salê ve em çûn herêma Dorşîn û li wê derê jî me fermandarê qada navîn dît, hevalê Karker ji me hemûyan zêdetir bala hevalan dikişand û dibû navenda ber bi xwe ve kişandinê. Li zozanên Dorşîn di bin naylonekî nîvçiriyayî de li hemberî sarmaya payizê, li gel hevalên ku me ji mêj ve nedîtine; êvareke tijî henek, ken û bîreweriyên salê, ên derbas bûyî dihatin ziman. Hevalê Karker ax û gelê bakurê Kurdistanê ve hatibû girêdan. Lewre jî hevalê Karker nedixwest ji bakurê Kurdistanê biçe cihekî din. Heval û gel jî di vê astê de hevalê Karker radikir ser milê xwe û cihekî taybet didanê.

Hevalê Berxwedan hevalekî bi eslê xwe ji navçeya Sasonê ji êla Bekiriyan bû. Ev êla han li herêmê, di wata welatparêzî û berxwedayinê de navdar e û xwedî rabihûriyeke baş e. Malbata hevalê Berxwedan hê di temenê piçûk de xwestibû bizewicînin. Rojekê bang lê dikin û dibêjin: ‘’Emê te bi vê keçikê re bizewicînin. Keça ku ji bo hevseriyê behsa wê tê kirin, hevala Berxwedan a zarokatî û leyîstokan e. Lewre hevalê Berxwedan digirî û dibêje ev keçik mîna xwişka mine û nabe ez pêre bizewicim. Bi vî awayî hevalê Berxwedan hem pêşiya zewaca hevala xwe ya leyîstokan digire, hem jî li pêşiya zewaca di temenê piçûk de dibe kelem. Jixwe hevalê Berxwedan di wan salan de difikire ku beşdarî refên PKK’ê bibe. Di temenê herî li ser xwe û çavnetirs de hevalê Berxwedan bû gerîla. Piştî demekî kin jî hat herêma ku lê ji dayîk bûyî. Ji ber di wê herêmê de pêwîstî bi kadroyên xwecihî hebû. Hevalê Berxwedan jî hem ji bo naskirina bejahiya Sasonê, hem jî ji bo naskirina gelê welatparêz û dost bûbû alîkar. Hevalê Berxwedan xizmê xwe jî xistibû xizmeta gerîla, da ku gerîla li beramberî dijminê gel ê dîrokî bikaribe baştirîn şer bike. Hevalê Berxwedan di asta girêdana rastiyên PKK’ê û jiyana şoreşgerî de xwe ava kiribû. Hêza xwe ya fîzîkî û pratîkî jî hebû. Çi kar bihata pêşiya wî xwe jê nedida alî. Lewre yekîtiya hêza bedenî û hêza dil a wêrekî saz kiribû.

Hevalê Welat Pazarcix, di encama ji dûrxistina gel, ji axa xwe, ji aliyê dewleta mêtinkar ve ji Pazarcixê çûbû qadên Ewropa. Ji ber pişaftin û li navbirina çandî ya gelê Kurd, hevalê Welat li navçeya xwe nekarî rastiyan têbigihêje. Hevalê Welat encax dikarî li Ewrûpayê li rastiyên Kurdistanê

serwext bibe. Ji ber ku siyaset û kiryarên dewleta mêtinkar a tirkiyê, PKK baş tê gihiştibû, gelê Kurd ber bi ku ve hatibe koçberkirin PKK'ê berê xwe daye wir. Rêber Apo jî; bi koçberkirina gel dema ber bi Ewropayê dest pê kir, kadroyên PKK'ê ber bi Ewropa ve şand. Hevalê Welat jî di salên notî de li Ewropa bizava azadiyê baştir nas dike û pişt re jî tevlî nav refên PKK'ê dibe. Piştî tevlîbûna li Ewropa hevalê Welat vê carê bizanebûn û têgiştineke mezin û pîroz tê welatê xwe û di nav gerîlayên azadkirina Kurdistanê de cih digire. Dawiya van serpêhatiyan li herêma Sasonê, min û hevalê Welat me hev û du nas kir. Dema em cara yekem li cem hev rûniştin, hîna kêliyên destpêkê, diyar dibû ku hevalê Welat heta bêje hevalekî dilpak bû. Bi şêweyekî xwezayî li jiyanê temaşe dikir. Tişt çawa bûn, wisa jî lê temaşe dikir. Berjewendiyên takekesî nedida ber xwe, her tim berjewendiyên giştî esas digirt. Ji ber ku erkên bi cih anîna kuryetî de cih girtibû, êdî zêde dixwest di nav şerê germ de cih bigire. Lewre jî hatibû herêma Sasonê. Di çalakiyekê de hevalê Welat bi tena xwe çûbû bajarokê Hezo'yê û çalakiyeke canfedayî pêk anîbû. Bi tena xwe êrîş biribû ser cihê qaymeqamtî û polêsan. Bîreweriyeke hevalê Welat li qada navîn belav bûbû. Ew jî bîreweriyeke wiha bû: hevalê Welat dema kuryetî dike, komeke hevalan ji bo Qada navîn dibe qada Botanê. Dema di herêma Farqîn'ê re derbas dibin; da ku heval karibin aveke sar a kaniyê vexwin, li ser kaniyekê radiwestin; di vê kêliyê de Hevalê Welat ji piştiyê xwe tozê şerbetê derdixîne, da ku bixin nav ava sar a kaniyê û vexwin. Hevalê Welat tozê şerbetê di dest de dema ber bi kaniyê ve diçe wiha dibêje:

“Haydî arkadaşlar îçelîm aşkin şarabini.” Ji ber ku di komê de hevalên jin jî hene, ji ber vê axaftina hevalê Welat, hevalên xort şermoke dibin. Piştî kêliyekê ji nû ve hevalê Welat bi xwe dihese ku di islûp de şaşiyek kiriye. Li qada gerîla, dema hevalên xort ligel hev bin ji aliyê islûp ve baldarbûn kêm e. Dema hevalên jin û xort li şûnekê di navhev de bin, divê ji aliyê henek û gotinan ve bi baldarî bê tevgerîn. Nexwe liv û lebat û axaftinên ne di cî de dibin sedema pêkenokan û di nav hevalan de belav dibe.

Piştî demekê em li Sasonê man û şûn de, du hevalên din li me zêde bûn. Ev her du heval jî jidayikbûna xwe ve hevalên xwecî bûn. Ji van hevalê Sîpan ji gundê Hêlîn bû. Hevalê Xerzan jî ji êleke navdar, “êla mele Ebdurehman” ji êla Timoq bû. Hevalê Sîpan mîna bahozekê bû, dema hat xwestin diliviya û kelemên pêşiya xwe radikir. Hevalê Sîpan lehengekî rasteqîne bû. Leheng bûn pênasekirineke ji rêzê nîne, divê ji bo her kesekî neyê bikaranîn. Leheng ew e: *ê ku mêjî, dil û hêza bedena xwe dike yek*. Divê ji aliyê fikrî ve têkûz be, ango welatparêz, şoreşgerekî/e baş bî, xwedî dilekî wêrek û çavnetirs bî. Li hemberî dijmin çiqas bi kîn û nefret bî, li hemberî gel jî ewqas xwedî heskirin û rêzgirtineke mezin bî. Beden, ango qelafeta Lehengekî/ê divê beriya her tiştî xwedî heybetekê be. Asta hêza wê/î mîna Rustemê Zal be. Nexwe lehengbûn di kesekê/î de peyda nabe. Hevalê Sîpan xwedan van taybetmendiyan bû û her çi hedef jê re bihata nîşandan bê dudilî yekser bi ser hedef û armanca xwe de diçû. Di awirên hevalê Sîpan de germahiyek dihat hîskirin. Lêvên wî her tim nîvken bûn. Ne tam dikeniya, ne jî tam rûtirş bû, di

navbera her duyan de sekinî dima. Ji bo wê jî kes jê aciz nedibû, jixwe wî jî tu car hevalên dora xwe ji xwe aciz nedikir. Lewre hertim hevalan dixwest digel hevalê Sîpan bimînin. Sîpan kesayetek pir xwerû bû. Mîna çiyayê Sîpanê Xelatê bi heybet bû, lê dema ew xwerûbûn û heybeta wî dihat gel hev du, Lehengek jê peyda dibû.

Hevalê Xerzan jî ji malbateke dorhêla wî welatparêz hatibû nava refên gerîla. Salên dirêj li Başûr û li zozanên Colemêrgê mabû. Xwedî ezmûna jiyana gerîla bû. Hatina ser xaka dapîr û bapîran gelek dilşad bûbû. Di têkîliyên xwe yên civakî de li pêş bû. Lewre digel welatparêzên ku li gundan diman pir zû dikarî hevalbendiyê bi pêş bixîne.

Belê, ev bûn hevrêyên ku me bi hevdu re li herêma Sasonê pratîk dikir. Pratîka me carinan bi dînatiya gerîla derbas dibû. Dînatiya gerîla jî eve: tişta ku mêjî û fikirîna asayî hilnagire gerîla dike. Lewre jiyana gerîla ne asayî ye. Di nav pratîkeke wiha de, rojekê em li Gomika bûn. Li Gomika emê bihatana çiyayê Golavê. Di navberê de riya ku ji Êlihê tê Sasonê heye. Li ser riya me hinek gir hene ku nêzîkî rê ne û tê de cerdevan hatine bicîkirin. Pêwîstiya me jî bi naskirina riyên çûn û hatinê yên nû hebû. Riya me ya her carî em tê re diçûn û dihatin hinekî dûr û tijî fetlonek bû. Diviya bû em riyên nû keşif bikin. Êvarê bi avabûna rojê re em ketin ser riya ku diçe Golav’ê. Di vê kêliyê de min ji hevalan re got: “gelo em nikarin di cihekî nû re biçin.” Hevalê Berxwedan û hevalê Sîpan li çavên hev mêze kirin û piştre jî gotin: “Hevalê Azad tu dizanî?” Bi hatina bersivekê wisa jixwe ez li bendê bûm. Paşê min got: “em di riya ku li kêleka girê ku cerdevan

lê ne re biçin.” Hevalan yekser gotin: “Em dikarin biçin.” Paşê jî min got: “heval ma ji bo çûyînê ev rê ne xetere.” Her du hevalan gotin: ‘’Belê.’’ Rê pir nêzik bû ji bo çûyîna me ya çiyayê Golav’ê. Lê ji bo me, rê pir metirsîdar bû. Kêliyek em ponijîn û paşê me biryar da ku em vê xeta nû biceribînin, ka ji bo çûyin û hatina me bi kêr tê an na. Li ser vê bernameyê ku me bi lez danî, em ketin rê. Dema em hatin rasta girê ku cerdevan lê ne, em ketibûn ser rêya maşîneyan. Şiverê di pêşiya me de xilas bû. Di riya gund a fireh re em dimeşiyan. Di heman kêliyê de dengê cerdevanan ji ser gir pir xweş dihate me. Cerdevan li jor em jî li jêr bûn. Riya ku em li ser dimeşin, ji cihekî şûn de ji her du aliyan ve dibû baxçe. Heke cerdevan me bibînin û guleyan berdin, pir bi asayî dikarîbûn me bidin erdê. Jixwe tu cihê ku em karibin birevin û xwe xilas bikin jî tunebû. Em bi gavên lez meşiyan û me xwe ji bin bandora girê ku cerdevan lê ne derxist. Êdî me dizanî ku me şaşiyek kiriye, lê veger jî jê nîne. Bi lez û bez me xwe gihand riya qîr a ku diçe Sasonê. Bi gihîştina me ya rê re em careke din matmayî bûn. Ji ber ku li pêşiya me gund û li derdora rê jî mal hebûn. Em ne gund nas dikin, ne jî dizanin ka cerdevan lê hene an na. Em nizanin gund welatparêz û dost in, an na. Zêde derfetên me yên fikirandin û nirxandina rewşê tine bû. Lewre me xwe li nav malan xist û paşê em ketin nav zeviyên gund. Ji bo gerîla jî di nav zeviyên gund de bi şev tarî rê peydakirin pir zahmet e. Di ser çîtên zeviyan de derbasbûn jî jê zahmetire. Geh li çep geh li rast em dimeşiyan. Ta ku me zevî derbaskirin û em ji nav gund û zeviyên wî derketin. Dema me da pala girekî, em hinek meşiyan û şûn de ku em

gihîştibûn cihê bi ewle, em li pişt xwe zivirîn û me li riya ku em tê re hatin temaşe kir. Em her sê heval jî, me ji hev re got: “Careke din em di vir re derbas nebin. Ev a me kirî ne tişteke ji rêzê bû, şaşiyeke mezin bû.” Ji ber di qewimîneke ku em ne li bendê bûn de dijmin dikarî me şehît bixîne.

Demekê em nêzikê Golavê tevdigeriyan, ji ber erdnigariya em têde bûn dest nedida em bi roj tev bigerin û kar bikin, piranî em li cihê xwe sekinî diman, heta ku dibû êvar. Rojekê ji van rojan hinek gundî hatin gel me û rûniştin. Piştî kêliyekê bi naskirina hev em têgihîştin ku gundî welatparêz in û ji mêj ve hevalan nas dikin. Gundiya ji me re bahsa salên 1993’yan dikirin û jiyana hevalan ji me re vedigotin.

Wê demê heval bi hêjmareke zêde li herêmê diman.

Di nava rojê de piranî em li sîberekê rûdiniştin û bi hev dişêwirîn. Gotubêjên me jî piranî li ser jiyana me û çalakiyan bû. Ji bo wê jî şopandina dijmin ji bo me pir girîng bû. Hevalên ku li herêmê bûn gilî û gazinc dikirin û digotin: “Hedefeke guncaw nîne ku em çalakiyeke bi bandor pêk bînin.”Ji ber wê lewaziyê me gotûbêjên xwe firehtir û geştir kirin. Ji aliyê rêbazê ve jî me gotûbêjên xwe dewlementir kirin. Di serî de hemû pêkhateyên ku bi ser dewletê ve ne “li herêma Sasonê” me di berçavan re derbas kirin. Di encamê de hat hînbûn ku hin deverên ku pêkhateyên dewletê lê ne, “çi leşkerî, çi jî ramyarî” em hîna nas nakin. Ev ji bo me lewaziyek bû û me biryar da ku cihên em nas nakin pêwîste em biçin lê bigerin û nas bikin. Di encama gotûbêjên me yên bi rojan, şêwazeke asayî di nava jiyanê de dom kir, encameke

din jî derxiste holê. Ew encam jî wisa bû; divê em di zutirîn dem de hedefên nû û guncaw nas bikin. Her cih û hedefên me dîtî divê ji bo pêkanîna çalakiyan bên nirxandin. Di keşifkirina hedefan de feraseta sereke divê ew be ku; ji bo hedefan şewazê çalakiyan neyê diyarkirin. Piştî keşif û çavdêriyeke baş li gorî çonetiya hedefê şêwazê çalakiyê bê diyarkirin. Ev feraset, ango têgîştin ji bo me gerîlayan pir girîng bû. Ji ber ku şêwazê çalakiyê hat diyarkirin û şûn de çûna ser hedefê ne dewlemend bûn, lewazbûnê bi xwe re tîne. Ev haletên wiha encamê çalakiyan jî lewaz dixîne.

Di encamê de me gotûbêjên xwe gihandin bernameyê, li ser vê jî sê hevalên me çûn bajarokê Sasonê keşif bikin. Di encama vê xebatê de, hevalan erdnîgarî û bajarokê Sasonê bi hûrgilî nas kirin. Bi dawîkirina erka xwe re hevalê Karker, Sîpan û Berxwedan hatin rex me. Em dubare bi hev re li ser mijarê ponijîn, di encamê de van her sê hevalan ji bo çalakiyê madeyên teqemenî amade kirin û berê xwe dan cihê çalakiyê; ango bajarokê Sasonê.

Tê zanîn ji salên 2000 û şûn de peyderpey şêwazê gerîla guherî. Em ji armanca damezrandina artêşekê ya pispor ji bo avakirina dewleta Kurdî, derbasî hêzên parastinê bûn ku tenê parastina rewa ya xwe û civakê esas digire. Loma di şêwazê komên gerîla de jî guhertin hatin çêkirin. Li gorî vê jî bi yekîneyên çendaniya wan a baş zêdetir yekîneyên çonetiya wan a baş pêwîst bûn. Di encamê vê ferasetê de bi taybetî herêmên ku dijmin tê de zal e, komên gerîla ji sê an jî ji pênc kesan derbas nedikir. Em jî tevde şeş heval bûn. Sê ji bo çalakiyê çûbûn em sê kesên din jî ji bo karên din li cihekî

mabûn. Li nava rojê me di bin kevirekî pan de agir kiribû. Piştî germbûna kevir me hevîrê ku amade kirî, girêk bi girêk vedikir û li ser kevirî sor dikir. Ji ber em komeke piçûk bûn me nedikarî em sêlekê bi xwe re bigerînin. Lewre em naçar bûn li ser tenekeyek, an jî li ser kevirekî pan nanê xwe bipijînin. Li nava rojê em bi van karan re mijûl bûn. Di kêliyekê de, di ser me re helîkopterek pir bi nizmî firiya û çû. Paş çend kêliyên din helîkoptereke din jî di ser me re firiya û ber bi Sasonê ve çû. Em du heval li ber çêkirina nan bûn, lê hevalekî me yê din jî (hevalê Xerzan) li cihekî bilind der û dora me çavdêrî dikir, ka tiştekî neyînî heye yan na. Di heman demê de hevalê Xerzan guhdarî bêsîmê jî dikir. Bi derbasbûna helîkoptera dûyemîn re hevalê Xerzan hat rex me û got: "Hevalan çalakî kir." Bi vê gotina hevalê Xerzan re em her du hevalên ku me nan çêdikir, bi kelecaneke mezin me li hevalê Xerzan guhdarî kir. Diyar bû ku hevalê Karker ev çalakiya ku pir dixwest bike pêk anîbû. Hevalê Xerzan jî axaftina xwe dirêj kir û got: "Dijmin di axaftina xwe ya li ser bêsîmê de kirî; piştî pêkanîna çalakiyê, wiha gotiye: "bê dedektor neçin cihê bûyerê, heke dedektor tine be, cerdevanekî bişînin cihê bûyerê." Ev axaftinên wisa ên dijmin me di heman kêliyê de nirxand û me got: "Nirxa qoruciyekî digel dijmin bi qasî dedektorekê ye."

Hevalan teqemeniya ku bi xwe re birin, di cihê ku qet dijmin ne li bendê bû de bi cih kiribûn. Hevalan xwe gihandibû biniya tabûra Sasonê û riya ku di bin tabûrê re derbas dibe de teqemeniyê bi cih dikin. Pişt re hatibûn beramberî teqemeniya bicihkirî, li ser girekî sekinîbûn da ku

bikaribin di dema derbasbûna dijmin de teqemeniyê biteqînin. Mixabin, rê ji hevalan baş diyar nabe, lê hevalan di cihê ku teqemenî danîne de ji xwe re îşaretek danîne da ku bizanibin teqemenî li ku bi cih kirine. Kêliyên bi kelecanî tên û maşîneyên serbazî ji tabûrê derdikevin û ber madeya teqemeniyê ya bicihkirî re derbas dibin. Dema maşîna Reo derbas dibe (pazdeh leşkeran hildigre) heval tenê banê maşîneyê dibînîn û dema maşîne tê ber madeya teqemenyê, hevalê Karker pêçiya xwe ya pîroz datîne ser pişkoka(tûş) bêsîmê û bûm. Maşîn di nav dûmaneke rêş de winda dibe. Heval bi hestên çalakiyeke serkeftî dikevin rê û tên.

Me ji aliyekî ve nan çêdikir, ji aliyekî din ve jî, ji bo êvarê cih biguherin amadekarî dikir. Ji nişkave her sê hevalê çalakger hatin rex me. Me jî hal û hawalê wan pirsî, piştre jî me got: “we çawa dizanî em li vir in û hûn hatin gel me.” Hevalan jî wiha vegot: “Em di vir re derbas dibûn ku karibin xwe dûrî cihê çalakiyê bikin. Dema bêhna nanê germ hate me, me jî berê xwe dayê. Ji ber me dizanî ku hûn in û nan çêdikin.” Paşê nanê germ ê pîroz ê dayîka Star me dan hevalan da ku bixwin. Paşê hevalan aveke sar jî di ser nanê germ re vexwarin û hêdî hêdî em ketin ser rê û çûn. Di bêsîma mezin de me encama çalakiyê wek mirina du leşkeran da. Ji ber ku me ancam baş nedizanî. Bi derbasbûna demekê û şûn de me agahiyên mîsoger girtin. Ew jî wisa bû; Di çalakiyê de 13 leşker miribûn û du jî birîndar bûbûn. Vê çalakiyê dijmin hejand, baweriyeke berbiçav jî da gelê me yê welatparêz.

Hevalê Karker di sala 2006’an de li herêma başûrê

Mûşê meha adarê ku xweza singê xwe ji bo bişkivîna kulîlkan vekiribû digel 13 hevalên xwe yên din şehîd ket.

Hevalê Berxwedan û Xerzan xwestin biçin Êlihê çalakiyekê li dar bixin. Ji bo wê jî digel xayinekî siwarî maşînê bûbûn. Ajokarê xayin, ango sîxûrê MÎT'ê dayîk û xwişka xwe ya bi navê Mizgîn jî bi xwe re anî bû, ji bo hevalan bi şêweyekî malbatî bibe Êlihê. Ji ber bawerî bi ajokar anîne, her du heval çekên xwe dixin pişta maşînê. Maşîn ji gund ber bi bajêr ve diçe. Li ser rê qereqolê dijmin heye, dema heval digihêjin qereqolê dibînin ku dewrûbera wan bi leşkeran hatiye dorpêçkirin. Hema di vê kêliyê de hevalê Xerzan şeqamekê li patika ajokarê xayîn dixe. Lê belê êdî derenge. Ajokar yekser xwe ji maşînê diavêje derve. Di heman kêliyê de dijmin dest bi gulebaranê dike. Di encamê de hevalê Xerzan û Berxwedan şehîd dikevin. Mizgîna piçûk di encama bextreşiya birayê xwe ya ku li hemberî hevalan kiriye de jiyana xwe ji dest dide. Diya ajokarê xayîn jî di vê bûyerî de birîndar dibe. Di encama şaşiya hevalan a di şêwazê de (karîbûn bi piyan biçin Êlihê) xiniziya weke xencerê di pişta gelê Kurd de bû sedem ku du hevalên leheng bi şêwazeke nemerdane şehîd bikevin.

Hevalê Sîpan ku zivistanekê dibin sarma û seqamê de derbas dibû; li herêma Dorşînê di gulebarandina xinizekê de digel şeş hevalên xwe yên din şehîd ket.

Hevalê Welat li Heftanînê di encama çalekiyekê de, bû şehîdê nemir.

Weke barhilgirê doza şehîdan yê li jiyanê mayî ez im. Di heman demê de vegotina van şehîdan erkê wijdanî û sincî

(exlaqî) ye. Heke min dikarî piçek be jî, wan hevalan vebêjim, ez ê hinek bextewar bibim.

Belê, hevrê û şehîdên bi rûmet Karker Ciwanro, Sîpan, Berxwedan, Welat, Xerzan. Vaye li Bakur pêşketinên mezin jiyan dibin, Rojava azad dibe, hevalên we niha li derdora deşta Mûsilê li şûna şer û lehengiya Derwêşê Evdî mil dane hev û têdikoşin. Rojhilat bêdengiya beriya teqandinê jiyan dike. Belê, heval Karker niha bajarê ku tu lê ji dayîk bûyî, hê jî dengê xiniziyê tê bîstin. Lê bi saya hezaran şehîdên mîna te êdî xinizî li Kurdistanê hatiye sînordarkirin. Feraseta serwer a li Kurdistanê feraseta azadî û jiyana demokratîk e.

Bi saya ked, xwîdana eniya we û xwîna we ya pîroz, li Rojhilata Navîn gel tên rex hev. Desthilat ji her demê zêdetir bi fikar in. Li seranserê Kurdistanê dengê azadiyê tê bîstin. Sitrana me ya neqediyayî bi beşdarbûna hezaran keç û xortên gelan berdewame, hevalno! Lewre jiyan dê sosyalîst û komînalîst be, bi saya hezaran ên weke we.

## LI SER RÊ KETINE MILÊ HEV Û DÎLANÊ DIGIRIN

**ME HENE ÇEND JANÊN KÛR**

**XEDARTIRIN JI BIRÎNA ŞÛR**

**ME HENE ÇEND NEWA Û BILÛR**

**DIL GEŞTENE JI SALÊN DÛR**

**Zerdeşt Bedîrxan**

# Agirî Mazlûm

Di sala 2011'an de çalakiyên bi bandor ji aliyê gerîla ve hatin lidarxistin, ez jî beşdarî yek ji van çalakiyan bûm.

Rêber Apo pêngava stratejîk a çaremîn ji ber pêwîstiyan da destpêkirin. Rêber Apo dixwest bi rêbazên siyasî, pirsgirêka Kurd û Kurdistanê çareser bike. Li hemberî xwesteka Rêber Apo, dijmin her tim dixwest, bizava azadiyê, paşê jî gelê Kurd tine bike û ji holê rabike. Ji sala 2009'an bigre heta 2010-11'an dijmin ji her milî ve bi ser bizava gelê me de hat. Dijmin bi hovîtî êrîşî qadên çiya yên gerîla kir, di heman demê de li ser gel jî, êrîşên xwe dijwar û berfireh kir. Bi hezaran gelê me yê welatparêz, desteser kirin, avêtin girtîgehan. Ji ber van bêfahmiyên dewlet û deshilatê, qonaxa çaran a şerê gelê şoreşgerî destpêkir.

Ev pêngav pêwîst bû zûtir bihata destpêkirin lê belê di sala 2010'an de bizava me ev yek gotûbêj kiribû. Ew gavavêtin, pêwîst bû di 2010'an de biketa meriyetê. Rêber Apo jî wê salê derfetekî din da dewletê ku pirsgirêkê bê xwîn rijandinê çareser bibe. Ew hewildan, ji ber helwesta dewletê a neyînî bi ser neket. Di zivistana 2011'yê derbasî 2012'yê dibû de, dijmin hewlên xwe yên tinekirina gerîla, li çiya zêde kir. Bi operasyonên ku zivistanê hatin kirin, hindek cihan hêzên gerîla derbên giran xwar. Bi vî rengî hevalên me şehît ketin. Dijmin bi van derb lêdanan xwe xapand, xwe bi xwe digot, êdî ez dikarim gerîla tine bikim.

Pêngava çaremîn a şerê gel ê şoreşgerî her çiqas dereng jî mabe, di 2011 an de rêxistinê cî bi cî da destpêkirin. Bi taybet di bajaran de, cihên ku dijmin xwe lê xurt kiriye. Ji wan cihan yek jî, qad û bajarokê Şemzînan bû.

Destpêkê rêxistinê plansazî çêkirî bû, wê demê agahiya me ji vî tiştî tine bû. Dema amadekariyên çalakiyê destpêkirin, hingê fermandarî hat û plansazî ji me re aşkera kir. Ji ber pêkanîna çalakiyan dereng mabûn, bi lez liv û lebatê destpêkir.

Wê demê em di qada hundir de li bajarokê Şemzînanê bûn, fermandariyê ji me re nîşe şand. Fermandariyê ji me xwestibû, ku em biçin gel wan, wargehên hevalan jî wê demê li qada Şehîdan bûn. Em çûn wê derê. Şervan û fermandarî jî hatin wê derê civîn hatin kirin, plansazî ji me re hat aşkera kirin. Plansazî jî ev bû ku em êrîşî Şemzînanê bikin.

Di wê plansaziyê de li Şemzînanê nokteyeke polîsan hebû, me dê êrîşî wê derê kiriba, hedefa din jî lojmana polîsan

bû. Di heman demê de jandarmaya navçeyê jî di hedefê de bû. Alay û Tabûr jî di nava wan hedefan de bû. Bi wan hedefan ve girêdayî tabûra Garê hebû, ev der jî hevalan di plansaziyê de xistibûn nava hedefan. Di nava vê plansaziyê de hevalên ku cih digirtin, derdora 150 hevalî hebû. Me jî ji milê Şemzînan, xebata avakirina hêzên heremî dida meşandin. Ji ber vê jî di wê qadê de naskirina me hîn zêdetir hebû. Piştî ku cihê hevalan di nava komên çalakiyan de diyar bû. Hevalên ku nû hatine wê derê, bejahî nas nedikirin, hedefên ku biçin lê bidin jî nas nedikirin. Me hevalên ku nû hatine qadê birin keşfê. Ji bo hevalan hem bejahî nas bikin, hem jî hedefa xwe nas bikin û keşif bikin. Li ser vî esasî, hevalan, hedefên ku lê bidin nas kirin, ango dê çawa biçin û vegerin ji wan re hate gotin.

Beriya çûyîna çalakiyê bi rojekê vesazkirina hevalan hat kirin, paşê navê hevalan yek bi yek hate xwendin, bi vî awayî em ji qada Şehîdan derketin û çûn milê Şemzînan. Cihê ku em têre çûn, vekirî bû, daristan tine bû. Lewre jî em bi baldarî tevgeriyan. Hevalên ku em bi hev re diçûn jî, derdora 50 kesî hebû, em bi giştî bi şev û bi hev re çûn. Li cihekî nêzikî Şemzînan, em dabeşî du koman bûn û me rêwîtiya xwe dewam kir. Di nava me de, du hevalên ku pişt re şehît ketin hebûn, yek ji wan hevalê Adil'e yê din jî hevalê Rizgar bû. Ew heval di destpêka bi serde girtinekê de li gel me bûn. Wana dê êrîşî jandarmaya navçeyê bikirana. Beriya ku komên me ji hev cûda bibin, di nava rojê ez razabûm, min xewnek dît. Di wê navberê de hevalan em rakirin ku biçin çalakiyê, ji bo vê jî me plansazî çêkir, ka em ê çawa biçin ser hedefê. Ew qada ku em têde, ji ber em bi ser de zal bûn, heval bi bawerî

nêzikî me dibûn. Bi taybet jî, li hemberî min. Piştî plansaziyê min xewna xwe ji hevalan re vegot.

Xewna min wisa bû. Min di xewnê de didît ku koma me ku di milê din de sekiniye, hevalên koma din êvarê tên gel me, pirsgirêkek di wê komê de derketiye. Ji ber wê sedemê ez dibêjim ezê biçim çalakiya jandarmaya navçeyê, heval jî vê daxwaza min pesend dikin. Min ew xewna xwe weke min dîtî, ji hevalan re vegot. Di navberê re 2-3 saat derbas bû, koma navborî hat gel me ku bi rastî di nava wan de pirsgirêk hatibû jiyan kirin.

Me berê jî gotibû, ketina bajêr a baskê lêdana alayê, guncaw nîne, ji ber ku xetere, ew kom dê biçe lê hemû jî tine bibin. Hevalan ew rewş di ber çavan re derbas kirin, ber êvarkî hatin û gotin, me ew koma ku biçe navendê, di ser hedefa Alayê re betal kiriye. Min li wê derê pirsa hevalekî kir. Min got hevalê Azad dê biçe kuderê, hevalan gotin dê biçe jandarmaya navçeyê. Wê demê min ji fermandariyê re got, hevalê Azad bejahî û navenda Şemzînanê baş nas nake. Kolanê bajêr yên teng û fitlonekî hene, her wiha riya ku diçe cihê çalakiyê jî, di nava gel re derbas dibe. Heta cihekî jî, pêwîste ti kes hevalan nebîne. Piştî kolanên teng re mirov diçe, derdikeve ser kolana giştî. Wê demê jî êdî mirov nikare xwe veşêre. Dema min ev agahî dan hevalan, êdî hevalan jî got, temam tu biçe ser hedefa jandarmaya navçeyê. Xewna ku min bi roj dîtî û piştre jî min ji hevalan re vegotî, hemû pêk hat. Ew koma ewil, hatibû bi rêxistinkirin ku, biçûya jandarma navçeyê, ji ber pirsgirêkan ji nava çalakiyê hate derxistin. Hevalê Azad dabûn çalakiya jandarma navçeyê. Min jî ji ber

car din pêşniyar kir, min got ez biçim jandarmaya navçeyê, hevalan jî ew pêşniyara min pesend kirin. Beriya wê min ji hevalan re gotibû ku, ez di wê komê de me. Em ê baweriya xwe bi hevdû bînin. piştî ku min xewna xwe ji hevalan re got, hevalan ez xistim nava wê komê. Dema ez ketim wê komê, hevalê Rûbar û hevalê Adil hebûn, her du jî ji Wan'ê, ji Ozalp'ê bûn. Ew herdu heval jî di wê komê de bûn. Nû dihatin wê qadê û dê biketana navenda Şemzînanê. Ji ber ku ez ji koma din derketim û ketim koma wan, her du heval jî hatin ez maçî kirim û hemêz kirim. Kêfxweşiya xwe wiha anîn ziman.

Bi vî rengî ez ketim komê û em çûn heta nêzî Şemzînan. Baskekî din jî li gel me bû, ew bask dê cuda bibûya, çûba pişt jandarmaya navçeyê, yan wan dê ji piştê re, li navenda jandarma daba. Em heya cihekî bi hev re çûn. Piştî ku komên me ji hev cûda bûn, me hinek gotubêj kirin.

Wê şevê li Şemzînan 3-4 heb dawet hebûn, hevalê ku ser komê bû, şehîd Ferhad Colemêrg bû. Me gotûbêj kir ku koma wan dê di kuderê re biçe, em ê di kuderê re biçin. Ez carekê li xwe zivirîm, ew û hevalê Adil û Rûbar, li ser rê ketine milê hevdû û dîlanê digirin. Min got qey heval ne şer, diçin dawetê. Ji ber ku di nava bajarok de dawet hebûn, dengê muzîkê jî gelek bilind bû. Hevalan bi coş govend girêdabûn. Wê demê min ji hevalan coşeke mezin girt. Wan hevalan çi fikar jiyan nekirin, ji ber bê fikariya wan û coşa wana, ez pir pê bandor bûm.

Dema em ji cihê xwe rabûn, di çûyînê de komên me yên din ji hev cûda bûn. Em li cihekî heta demekî man. Piştre koma me ya heft kesî, bû du beş, em diçûn ser jandarma.

Hevalê Rûbar li gel min bû. Hevalê Adil jî di koma din de bû. Dema em çûn ber deriyê jandarma, li ber derî hejmareke zêde çawişên pispor hebûn. Ji me du heval roketavêja B-7 hilgirti bûn. Li gor plansaziya me, pêwîst bû bi B-7 ê hevalan li deriyê jandarma bidana. Hevalê din jî deriyê jêr bixin. Dijmin bi çûyîna me ya ser jandarma hesiya. Dema ew bi me hesiyan ez û hevalê Adil bi klêşan me êrîşî wan kir. Pişt re em ketin deriyê jandarmaya navçeyê. Piştî ku me êrîş bi klêşan kir şûn de, hevalên me bi B-7 roket avêtin deriyê jandarma. Hevalê ku di koma din de B-7 hilgirtibû, roketên wî pûç derketin. Du roketên B-7 ên destpêkê, dema pûç derketin, hevalan nekarî êrîşî deriyê jêr bikin. Bi vê sedemê jî leşkerên ku li wir bûn, fîşek avêtin me. Em û dijmin bi pevçûn, hatin beramber hevdû. Lewre jî me nekarî em di derî re têkevin nav avahiya dijmin. Lê belê hevalê Rûbar, hewil da ku têkeve hundir. Bi hewildan û çûyîna wî re, li ber derî birîndar bû. Heval ji zikê xwe ve birîndar bû, pişt re li heman cihî jî şehîd ket. Hevalek çû ku wî bîn, di heman demê de gule barandina zêde li ser me dihat kirin, ew hevalê ku çû hevalê Rûbar bîne, ew jî li wêderê birîndar bû.

Rihê hevalan ê fedayî pir li pêş bû, wî rihî dijmin tengav kir û dijmin neçar ma xwe ji wê derê paş de bikişîne. Piştî ku heval bi pevçûn ketin hundir, dijmin bêdeng bû. Hevalê Rûbar û Adil, her du jî ciwan bûn. Ev hevalan zêde jî ne kevin bûn. Bi qasî ku dizanim, her du jî di sala 2008’an de tevlî nava şoreşê bûbûn. Ligel nû beşdarbûna wan, xwe bi rêxistinê re kiribûn yek, yanî felsefeya Rêbertî baş fam kiri bûn, di asta jor de guhertin, vegohartin di kesayeta xwe dabûn

çêkirin. Dema mirov li wan hevalan dinêre, hêza ku mirov ji wan digire pir li pêş e. Dema min moral û coşa wan hevalan û rihê çûyîna ser dijmin di wan hevalan de dît, dihat hînbûn ku ev heval cûdane. Weke ku hêza hemû dinyayê di destê wan de be, tevdigeriyan. Ew hêz û bawerî di me de jî çêdibû. Ez û hevalê Adil, em carekê ketin hundir û derketin, di wê kêliyê de me şarjorên xwe guhartin. Car din bi ketina min a hundir re, ez li wê derê birîndar bûm, di vê navberê de têkiliya me û hevalên din jî qut bû. Hevalekê ez girtim û kaş kirim, derxistim dervayî navenda jandarmaya navçeyê.

Hevalan rasterast ez derxistim milê jor. Hevalê Rûbar şehît ket, hevalê ku çû wî bîne jî birîndar bû. Hevalek jî li gel min ma. Bi vî rengî em ji hev qut bûn. Hevalê Adil jî diçe hundirê navenda jandarma û ew jî li wir ji çoka xwe ve birîndar dibe, lewre nikare paşve bê. Hevalekî me jî ji me qut bûbû, çûbû tevlî komeke din bûbû. Me jî wisa zanî ku hevalê Adil jî gîhiştiye wê komê û çûye, pişt re hate zanîn ku, hevalê Adil heya siharê di cihê xwe de dimîne.

Dema çalakiyê destpê kir, dukandar ji dukana derneketin kesên ku li kolanan bûn ew jî çûn ketin dukanan. Hevalê Adil bi birîndarî bang li wan dukandaran û kesên ku li wê derêne dike. Da ku wî ji wir derxînin lê bele ti kes newêre ku nêzî hevalê Adil bibe û wî ji cihê lê birîndar bûye dûr bixe.

Dema em behsa Şemzînan dikin, weke tê zanîn cihekî dîrokî ye. Pêngava 15'ê tebaxê guleya yekemîn li wê derê hatiye avêtin. Ji ber ku bajarokekî biçûke, dijmin jî xwe bi ser de zal kiriye. Ew bîst sîh kesên ku di dukanê de bûn newêrîn herin hevalê Adil bi birîndarî xelas bikin. Sibê di saet pêncan

de, dema dijmin bi panzêran tê, bomba xwe, bi xwe de diteqîne. Ew heval bi vî awayî şehît dikeve.

Dema ez birîndar bûm, hevalekî ez heya cihekî tenahî xişikandim, li wî cihî jî dayîkek hebû. Dayîk ji mal derket û digiriya, hate gel min dema ku birîna min jî dît, zêdetir giriya. Min jî, jê pirsiyar kir, min got: “ew xanî yê kê ne?” bi vê pirsê min xwest ez bizanim ka nasyar hene yan na. Eger nasyar hebin, bikaribin alîkarî bidin û em ji vê derê derkevin. Dema dayîkê mal bi min da naskirin, malbateke ku min nas dikir, di navê de hebû, lê belê ew malbat li dijî me bû. Bi riya şandin û girtina nîşeyan, peywendiya me bi wê malbatê re hebû. Zêde xirabî nedikirin lê, li gel rêxistinê jî tiştê ku bikirana tine bû. Hevalê ku li gel min bû, min jê re got: “here bang li malê bike, bila werin alîkariya me û em ji vê derê biçin.” Dema heval çû, min berê xwe da dayîkê û min got: “dayê çima digirî? Dayîkê got: “di bajêr de dawet heye, zarokên me jî çûne wê derê. Dijmin jî bi roketan nava dawetê xistiye. ”Min ji dayîkê re got: “hewce nake tu bigirî. ”ji min re got: “çima?” Min got: “pêwîste niha rabî, dîlan bigirî, bêjî gerîlayên me ketine bajêr li hemberî dijmin şer dikin, dijmin jî nikare ji cihê xwe derbikeve.” Dema min wisa got, dayîkê hinek xwe komî serhev kir. Bi gotinên min re dayîk hat birîna min pêça. Birîn jî min berê pêça bû wê xwest qayîm bike. Dayîkê xwest min hilde saxlemiyê, got: “sekna te li vê derê nebaş e.” Min ji dayîkê re got: “tişt nabe heya heval tên ez ê di vir de bim.” Hevalê ku çû banî maliyan bike, zû zîvirî. Got: “malî gotine, kes li vir tine ye, lewre em nikarin alîkariya we bikin.” Min ji heval re got: “car din here navê min ji wan re bêje, bila

bizanin ku ez im, wê çaxê dê werin.” Heval dîsa çû û vê carê navê min got, piştî ku malê ez nas kiribûm, du ciwanên xwe şandin. Malbatê ji wan ciwanan re gotibû, kuder dibe bila bibe, cihê ku heval dixwazin heya wê derê bibin. Her du genc bi maşîna xwe hatin, em siwarî maşîna wan bûn. Bi vî awayî em ji navenda bajêr derketin, em kêmekî derketin pişta bajêr, şer hîna berdewam bû.

Bi derketina me pişta bajêr re, du helîkopterên şer ên kobra hatin. Li ser tepeyê Gomak'ê hevalê Ciger hebû, doçka bikar dianî. Ekîn, Argêş, Bager û Ozgur jî, li wê derê bûn, tev pênc heval bûn. Ew koma doçkayê bûn, ji bo parastina giştî li wê derê bûn. Hevalê ku doçka dida şixulandin jî hevalê Ciger bû, dema wî doçka dida şixulandin, firsend nedida helîkopteran ku guleyan bavêje. Me demekê wisa li wan temaşa kir. Piştî çalakiyê hinek gundî dihatin gel me û diçûn. Hemû gundiyan, behsa wî hevalî dikir, di gotin: *kî li ser çîyayê Gomak'ê bû, ew kîjan heval bû. Li ser wê doçkayê du kobra digeriyan bi hev re lê didan dîsa jî nekarîn serî pê re derxin.* Bi rastî jî, wî zaf bandor li ser wê deverê çêkiribû. Hevalê Ciger bi şixulandina xwe ya doçkayê di wê çalakiyê de navdar bûbû.

Dema şer hinekî hate sekinandin em ê çûbana cihekî ku hinek dûrî bajar bû. Min ji wan her du ciwanên ku hatinbûn alîkeriyê re got: “me heta wê derê bibin” em heta cihê ku pêwîst bû çûn. Dema min xwest ez ji maşînê paya bibim, hevalên me yên tenduristiyê û du hevalên din li gel min hebûn. Wan ji milê min ve girtin û ez ji maşînê derxistim, bi derxistina min a ji maşînê re ez ji ser hişê xwe ve çûm. Heta

demekê wisa ji xwe ve çûyî mam, pişt re hatim ser hişê xwe. Min dît ku hevala di ber tenduristiyê de erkdar e, min pansûman dike. Tedawiya destpêkê li wir hate kirin. Ji ber ku dem jî bû ber destê sibê, me nekarî em biçin cihekî ewletir. Lewre em çûn stargehekê ku, berê hatîbû çêkirin. Ji ber ku çalakî berfireh hatibû kirin liv û lebata dijmin zêde bû. Em jî gelekî li derveyî bajêr nebûn dijmin jî her diçû û dihat. Nêzî 15 rojan ez, du hevalên xort, yek jî hevala jin, em gel hevdu, di bin erdê de man. Di wê stargeha binerd de nêzikatiyên wan hevalan, alîkariya wan dayî, mirov ji xwe şerm dikir. Wan hevalan xizmeta min dikirin, birîna min jî wisa ne sivik, giran bû. Bi qasî giranbûna birînê moral dayîna hevalan jî hebû, Ji ber nêzikatiya wan hevalan min nedizanî ku ez birîndarim. Heval jî şaş mabûn digotin, birîna te pir girane lê tu qet dengê xwe nakî. Ew bi şev ranedizan li ber serê min disekinîn. Min xwarin nedixwar, bi zorê xwarin didane min. Alîkariya wan hevalan bi her awayî dayî min, çi dibe bila bibe bi qasî serê derziyê jî mirov nikare wan rojan jibîr bike. Demekê em li wir man piştî ku me dît derdor hinekî tenahî bûye, me nîqaş kir ku em derkevin xwe bigihînin hevalan. Dema em gihîştin hevalan, li wir hevalê Ferhat hebû, demekî dirêje me hev dinasin. Ji min re got: “dema tu çûyî Başûr wê demê tu yê qedrê vir bizanî.” Min got: “çima?” Wî got: “li wê derê heval tinene, kes nayê gel te û naçe dema tu li nexweşxanê bimînî, dê tenê hevalek li gel te be.” Bi rastî dema ez derbasî Başûr bûm û çûm nexweşxanê ew rojên ku ez birîndar bûbûm yek bi yek, xulek bi xulek, dihatin ber çavên min. Min ji hevalan re bigota ez dêşim, hevalan ez masaj dikirim. Dema min digot,

serê min dêşê, masaj dikirin. Demeke kurt ez li nexweşxanê mam şûn de ez çûm wargeha şehît Rustem. 2-3 mehan ez li wir mam. Piştî ku hinekî bi ser xwe ve hatim, min berê xwe da çiyê. Dîsa wek berê min xebata xwe da meşandin.

Ew zehmetiyên ku me kişandine, berdêlên azadiya gelê me ne, lewre jî, zehmetiyên di nava şoreşê de zêde watedar in. Xweşiyên şoreşê jî hene hertim me li ser linga digirin. Jiyana nû ya Rêber Apo jî wiha pêş dikeve û dibe para civakê. Lewre emê hertim di vê rêkê de ji bo jiyana bi rûmet têbikoşin.

# LI GABARÊ BUHIŞTEK JI BO GERÎLA HATIYE ÇÊKIRIN

**EVÎN PEYVEK CIWAN E**

**NE YA ŞAH Û MÎRAN E**

**HER ÇÎ ŞEYDAYE WÊRAN E**

**NAYÊ PÎVAN BI DIRAV Û ZÊRAN E**

**Zerdeşt Bedîrxan**

## Nûman

Dixwazim, çûyina me ya ji Başûrê Kurdistanê, ber bi Gabarê ve parve bikim. Ji bo min, cara yekem bû ku, ez diçûme Gabarê. Wê demê, di her gerîlayekî de xwesteka çûyîna Gabarê hebû, çûyîna Gabarê, weke hemû hevalan di min de jî weke xewnekê bû. Weke her hevalekî min jî bi biranînên hevalan çiyayê Gabar nas kiribû. Bi taybetî ew warê ku em tînin ziman me bi hevalê Egîd bi bîranînên hevalê Egîd nas kir. Bi sekna hevalê Egîd, bi têkoşîna wî re em bi Gabarê re bûn yek. Ji bo wê jî min pêşniyar kir ku ez herim Gabarê. Bi gotina hevalê Cemal; Gabar weke cihekî buhişta gerîla be, min di serê xwe de çêkiribû. Ji bo wê jî hertim berê me li wê derê bû, bi taybetî berê min jî li wê derê bû. Min tim dixwest bibînim, bijîm û bi taybet jî weke gerîla, cil û bergên gerîla, bi pratîka gerîla, wê derê bimînim. Xwestekekî min a bi vî awayî hebû.

Lê belê, beriya wê dixwazim tiştekî bêjim. Pêvajoya ku me berê xwe da Gabarê serê sala 2000'î bû. Piraniya hevalan jî dizanin wê demê di nava partiyê de gengeşiyek hebû, nefêmkirinek ji Serokatî hebû. Ji hin milan ve hêzên me yên di Başûr de dûrketinek ji çand û sinca gerîla hebû. Bi taybetî, piştî Serokatî dîl ket destê dijmin, rewşa aloz a ku li Başûr hat jiyankirin weke şexs jî min xwest ez ji wir dûr bikevim. Li Gabarê bêhna azadiyê bistînim. Di rewşeke wiha de me xwe siparte Gabarê, xwespartina min hebekî balkêş bû.

Em li zozanên Qendîlê bûn, hevalê Şahîn Cilo jî li wê derê, fermandarê me bû. Ji bo ku em biçin Gabarê kêm ma bû em li ber deriyê pêjgeha hevalê Şahîn Cîlo razabana. Me nûsafên xwe pêşkêş kiribû.

Rewşa giştî jî wiha bû; piştî paşve kişandinê agirbest hate ragihandin. Hinekî pêvajoya siyasî zelal nebûbû ku dê bi kîjan milî ve biqulibe. Şîmane çûyîna bakur jî pir kêm bû. Di nava wan şîmane biçûk de jî her tim bi vê hêvî û bendewariyê me xwe li ser rêveberiyê disepand. Herî dawiyê kom dihatin amade kirin, hevalan jî xwestek û xwe sepandina me dît. Hevalê Şahîn Cîlo em bi vî rengî şandin; em li zozanên Qendîlê bûn. Di navbera Xirpap û Qendîlê de em li wan zozanan bûn. Me nizanî bû komên din jî têne amadekirin piştî hevalê Şahîn gazî me kir û şûn de got; komeke bi vî rengî tê amadekirin, xwesteka we jî heye, hûn dikarin biçin. Hingê bi rastî dema ev gotin got; em pir kêfxweş bûn. Lê li gel ewqas xwestek û xwesepandina me, ji milekî ve jî şîmale neçûnê jî hebû. Lewre me got; renge çûyîn nebe jî fermandariyê ji min re got, pêşniyara te hatiye pesend kirin, guncaw hatiye dîtin.

Dema em zivirîn yekîneyê, ji xwe Egîd Suruç fermandarê yekîneya me bû. Bi pêşengtiya wî me wê şevê ji bo çûyîna xwe wek şahiyekê pîroz kir. Heya siharê em axivîn, hevalên ku li Gabarê mabûn qala wir dikirin. Rojekê heta êvarê jî em her li ser lingan bûn, xew nekete çavên me. Hestên me gihîştibûn asta herî jor. Gelek hevalan gazinê xwe dikirin digotin: "nabe ku navê we ketiye komê, navê me jî neketiyê." Weke ku ji sedî sed em diçin nêzî me dibûn, hestên me wisa bûn ku ji aliyekî ve me bawer nedikir, ji aliyê din ve jî, ji bo çûyînê amadekarî hebû. Me ew hest jiyan kirin.

Dema em çûn milê Dolakokê hevalê Cemal li wir bû. Me bawer nedikir ku em ê biçin wê demê me digot: "ji bo 'hevalê Şahîn me ji ser guhê xwe bavêje wisa dike." Li Dolakokê dema me komên din dîtin me fam kir ku rewş cidî ye. Berpirsiyarê me hevalê Heqî bû, ew jî dihat. Hevalê me yê din jî ji şehîd Ayhan û zozanan tabura hevalê Hogir hatibûn. Em kom bûn şûn de ketin nava amadekariyên çûyînê. Êdî me çûyîna xwe ya Bakur bawer kir. Em çend rojan li wê derê man, paşê hevalê Cemal bi me re axivî. Bi taybetî hevalê Cemal ji me re qala Gabarê kir. Hingê amadekariyên me yên fikrî û bedenî dest pê kirin, xwesteka me jî bi wî rengî bû. Wê demê hîn zêdetir em hestyar bûn. Hevalê Cemal li ser çûyîna me ya Gabarê di warê wateyê de jî axivî şûn de hîn zêdetir em kêfxweş bûn. Du xalên divê ez bînim ziman hene. Yekemîn: piştî paşve kişandina hêzên me ji Bakur ji sedî nodî qada bakur vala bûbû. Pir yekeyên piçûk li bakur mabûn. Piştî vê rewşê yekemîn car bû komekê berê xwe dida wan qadan. Hevalê Cemal bi îsrar û bi xetên sor binê vê gotinê xêz dikir.

Weke ku hevalê Cemal bi xwe diçe wisa bi kelecanî bi coş diaxivî, dixwest em rastiyan fam bikin. Ji bo çi me berê xwe daye wê derê, çima em diçin. Bi vî rengî qala çûyîna me dikir. Duyemîn: qala xwezaya Gabarê û girîngiya Gabarê dikir. Bi taybet tiştên ku herî zêde ji bîra min naçe, tim wilo di serê min de hatiye bi cih kirin. Hevalê Cemal di axaftina xwe de digot: *"eger bihuştek hebe li ser rûyê Dinyayê, ew jî Gabar e.* Li wir Bihuştek ji bo gerîla hatiye çêkirin." Bi vî rengî pênase dikir. Hem di warê xwezaya xwe de hem jî di warê erdnîgariyê de wisa bû. Hem jî di warê fêkiyên ku li wê derê ne, bi her awayî, hevalê Cemal qal dikir, her wiha pir tiştên din jî gotin. Hingê atmosfera em têde bûn hate guhertin. Dema heval li ser Gabarê diaxivîn, ew bihuşta ku tarîf dikirin, me di dilê xwe de jiyan dikir. Em hîn neçûbûn jî me xwe li wê derê de hîs dikir. Te digot qey em li Basret, li derekê sekinîne. Weke ku em di bin dareke gûzê de runiştine, me xwe hîs dikir. Bi tiştê ku qal dikirin re em diçûn nava xewnên paşerojê. Bi axaftin û qalkirina hevalê Cemal re, em diçûn nava Gabarê û dihatin. Ji gotinan zêdetir ew coşa ku hevalê Cemal jiyan dikir, hal hereketên hevalê Cemal, ew der ji me re zindî dikir. Zêdetir ji bo wê ez dibêjim me dereke din jiyan dikir. Bi wê êdî em gihîştin rastiyekê, ne tenê hest, wate, rastiya çûyînê jî bi me re hin tiştên din ava dikir. Berpirsiyarî xist ser milên me, bi wê perpirsiyariyê jî çûyîna me wateyekî bilindtir me girt.

Berî ku em biçin ango bi rê bikevin ji me re merasîmek bi coş hate çêkirin. Ew hevalên di asta wan jor de, hevalê Cemal û hevalên din weke zarokan li wan hatibû. Hal hereketê hevalan, wekî ku ew bi xwe diçin bakur, ewçendî kêfxweş

bûbûn. Cihên ku hatine valakirin em diçin ku ji nû ve dagirin. Hevalê Cemal jî bi me re hat, piştî merasîmê heta cihekî bi me re meşiya. Derketina me ji Qendîlê bi vî rengî bû.

Ew hestên ku me jiyan dikirin, em bêjin hemû hevalan ew hest jiyan dikirin. Me xwest em wî hestê ku em jiyan dikin, wateya ku partiyê li çûyîna me bar kiriye, bi her kesî re parve bikin. Qada ku em têre çûn; ji Qendîlê heta Kelareşê tabûrên ku em lê man, me hewilda wî ruhê heyî bi wan re parve bikin û bi wî rengî biçin. Li ser vî esasî me ji Qendîlê heta Kelareşê dest bi meşê kir.

Çûyîna Gabarê ne hesan bû, rêveçûneke nêzî mehekê ajot, meşeke taybet bû. Hedefa me gihiştina Gabarê bû, hedefa dijmin jî me negihîne Gabarê bû. Diviyabû em bê wendahî biçin, ji ber ku erka ku partiyê dabû ser milên me û hîsên ku em ber bi Gabarê ve diherikandin pir bi wate bûn. Vê rastiyê hestên xwezayî di me de çêkirin. Bi van hestan em bi rê ketin lê heta em gihîştin Pîranê, çend hevalên me ji komê kêm bûn, hevalek jî ji komê hat derxistin. Hesreta çûyîna bakur di wan hevalan de bi dawî bû. Amadekariyên li Kelareşê hatin kirin şûn de, ser Elbakê re em ketin axa bakur. Her çiqasî dijmin sînor xistibe nav xwezaya Kurdistanê jî, hem binpêkirina wan sînoran hem jî nenaskirin, reda bi îsrar û dij derketin girîng e. Sînorên ku hene ne xwezaya gelan in. Di xwezayê bi xwe de jî sînor tine ne. Dema me ev sînor derbas kirin, hestên cudatir di me de ava dikir. Hêzeke veşartî derdixiste holê. Ez dikarim vê rastiyê bi vî rengî bi lêv bikim bi van hestan ve me gav avêtin bakurê Kurdistan’ê.

Bi rastî jî mirov dikare vê bibêje; Her çiqasî dijmin ev sînor xistibe nava Kurdistanê jî di me û gel de ferasetek çêbûye. Têkoşîna Bakurê Kurdistanê bi saya gerîla bilind bûye, gerîla hestên naskirina netewî û zanebûna netewî derxistibû pêş. Bi rengekî xwezayî wateyeke axa bakur a cuda heye, her çiqasî em bêjin sînor tinene jî, lê belê hem gel hem jî heval wateyeke wiha lê bar dikin. Vê diyardeyê jî em şaş nebinin, ji derveyî xwezayê nebînin. Ew têkoşîna ku li wê derê çêbûye, şehîdetên ku li wir hatine jiyîn bixwezî nexwezî watedayîneke bi vî rengî derdixe pêş. A niha jî em dibêjin navenda şoreşa Kurdistanê Bakur e. Em wê wateyê lê bar dikin. Ji bo çi? Ji ber ku bakur bûye dînamoya şoreşê, me jî bi heman nêrînê lê dinihêrî. Dema em bi rê ketin, tenê bi hestan rê neketin, rastiyên din jî hebûn me dijminê xwe jî nas kiribû. Zilma ku li me kiribû me dizanîn, em di zanebûna hovîtiya ku li ser gelê Kurd dabû meşandin de bûn. Bakurê Kurdistanê çi zehmetiyê tîne ber me, em di wê zanebûnê de bûn, nexasim pir astengî jî çêbûn lê me jî xwe li gorî wan amade kiribû. Partiyê em amade kirin em bi van amadekariyan ve ketin bakurê kurdistanê. Dema em ketin bakur şûn de operasyon çêbûn lê em şaş neman. Dema em ketin xaka Elbakê şûn de, em çûn Feraşînê. Zorî û zehmetiyên ku me kişandin hebûn em bi saetan tim dimeşiyan. Me êşa lingê xwe, êşa çoka xwe hemû ji bîr kir. Ew xwezaya ku em ketin têde, qadeke wek Feraşînê rasterast em ketin cih û xwezayeke bi vî rengî, zorî zehmetî dev jê berde, tu dibêjî qey em ne li ser rûyê dinyayê ne. Parçeyeke buhiştê bû, tam wexta hişkbûna hinek giya bû. Hêdî hêdî xwezayê rengê xwe diguherî, lê xwezaya Feraşînê

rengê xwe ne guhartibû. Weke deryayeke ji giya pir rengîn bû, dema destpêkê em ketin Bakur û me ew xweşikbûn dît, me got em hatine cihekî rast. Biryarbûna me jî, ji ber vê xweşikbûnê hîn zêdetir bû, biryara me mezintir bû û em di têkoşînkirinê de zêdetir bi îsrar bûn. Em bizaveke ilmî ne, lê milê me yê metafîzîk û hestyarî jî heye. Careke din me dît ka xweza çi guhertinan di mirovan de çêdike, dema em li dîrokê dinihêrin bi rastî jî bandora ku xwezayê li ser mirovatiyê kiriye zahfe. Tişta ku hiştiye mirovayî şaristaniyê biafirîne ev xweza ye, vê diyardeyê li ser me jî, pir bandor kir. Di me de hezkirineke hîn zêdetir pêş ket. Em tim dibêjin zorî û zehmetiyên gerîlatiyê hene. Bi rastî jî wisa ye. Hevalên ku Gabar dîtibûn her tim ji me re şiyarî didan; digotin: "xweşikbûna xwezayê, hezkirina hevaltiyê û hezkirina Kurdistanê nebûna, kesî nikarîbû li ser wan çiyayan 24 saetan bimîne." Gerîlayên ku li hemberî ewqas zehmetiyan disekinin, bi vînê dibe ya din jî sedema wê ew xweşikbûn e. Gerîlatî bi çavekî din li xwezayê nihêrtin e, her wiha bi heman çavî jî li civakê meyzandin e. Em pir di zanebûna tiştan de nebûn, ew jî rastiyeke ku xweza ya xwe bicih tîne. Bêyî ku tu bikevî zanebûna wî hestî û zanebûna veşartî di te de têgihîştinekê dide avakirin. Bi rastî jî bandora xwe li ser mirov çêdike, li ser xweşikbûna mirov jî, bandor dike. Dema mirov tiştekî xweş dibîne rûyê mirov geş dibe û hezkirina mirov pêş dikeve. Bi her awayî dema me xwezaya Feraşînê dît xwezaya Kurdistanê her devereke wê xwedî xweşikbûneke cûda ye. Em li Qendîlê jî man, xweşikbûna wê jî cûda ye, di warê manewî de jî cûda ye. Xweşikbûna Feraşînê jî cûdaye û bi vî rengî li ser me bandora xwe çêkir.

Her gava ku me davêt, me xwest em hîs bikin. Her kevirekî kete ber me, me dixwest em destên xwe bidinê. Her kulîlka ku derket pêşiya me, me dixwest em bêhin bikin. Kaniyên wê zahf bûn me dixwest em ji hemû kaniyan avê vexwin. Bêyî ku tu tahm bikî, bêyî ku tu destê xwe bidî, te nedixwest derbas bibî. Di wan kêliyan de ew hîn zêdetir bi min watedartir dihatin. Weke mêşa hingiv, me dixwest ji hemû kulîlk û giyayan em tahm bikin û wisa derbas bibin. Hîsên bi vî rengî di me de çêbûn. Bi vî awayî em di Feraşînê re derbas bûn û rêveçûna me dewam kir.

Dema em ketin rê, dijmin jî derketibû operasyonê ji ber ku haya me ji derketin û hereketa dijmin hebû, me berê xwe da milê Melîxan. Dijmin derketibû bejahiyê lê, haya me nîn bû ku hatiye cihê ku emê çûbana. Hevalên qadê ji berê de li wê derê bûn, ketin pevçûnê em jî li jêr noqta hevalan bûn. Em bi xwe neketin pevçûnê. Hevalên me tenê ji bo ewlekariyê derketin ser girekî. Hêzên wê derê jî nexwestin em têkevin pevçûnê. Ji ber ku dijmin jî dixwest me asteng bike. Taybetmendiyeke gerîla jî parastina hevalên xwe ye. Fermandariya giştî jî gotibû, pêwîste tiştek li wan hevalan neyê ji bo wê jî em li jêr hiştin. Heval heya êvarê ketin pevçûnê, bû êvar şûn de, hevalan ji cihê xwe vekişiyan. Em jî bûn du grub, ez jî di komekê de bûm. Li nêzikî cihê pevçûnê cihekî pezkoviyan hebû, em ketin wê derê. Em qasekê li wir man heta ku operasyon vekişiya. Ew der bi rastî jî weke sarincê pir sar bû. Xorakê me jî tine bû. Di devê derî de Şîlan hebûn me bi wan xwe têr dikir. Ji ber ku em li Botanê bûn, em

zêde li xorakê nedigeriyan. Li gorî şert û mercan xwe diguherîne û bi vê derûniyê jiyan dike. Her çiqasî me berê jiyan nekiribû jî xweza li gorî pêwîstiyan mirovan sererast dike. Gerîla bi perwerde û îradeyê wan tiştan jiyan dike. Ji bo hemû mirovan jî ew tişt derbasdar e.

Modernîteya sermayedar mirov xistiye rewşekê ku ew ji hêz, îrade û zanebûna wan dûr xistiye. Bi xwezaya mirovan zahf lîstiye, mirov ji xwe dûr ketiye. Haya xwe ji hêza xwe tine ye. Heman mirov dema vegere cewherê xwe, dikare di heman şert û mercan de jiyan bike. Ji ber terbiya ku partiyê dabû, zanebûna ku Serok Apo dabû û çanda ku bi salane kevneşopiya Apoyî û gerîla dabû afirandin hişt ku em jî bê ku hin tiştên ku nebe nabe, bin pê bikin. Tişta heyî bi kar bîne, xwezayê bikar bîne û pêwîstiya xwe ji xwezayê pêk bîne û bijî. Me jî pêwîstiyên xwe yên weke xwarin û vexwarinê ji xwezayê tedarik kir. Bi qasî ku em jiyana xwe dewam bikin, ev tişt têra me dikir. Armanca me ne xwarin e, armanca me şoreş pêkanîne. Tenê ew pêdiviyên ku ji mirovan re pêwîstin, hebûna wan bese ku em têkoşîn bikin û jiyana xwe bidomînin. Lê, mirovahî hatiye wê astê ku her tişt tevlîhev kiriye. Armanc bûye ew ku xwarina xweş bixwe, ne ku weke mirov jiyan bikin. Wateya ku gerîla li jiyanê bar dike berovajî modernîteya sermayedar e. Serok Apo ewqas meyzandineke berfireh û kûr daye çêkirin ku, her koma gerîla bi wê jiyan dike û bi serdikeve. Armanca me, ne tenê rizgarkirina Kurdistanê an jî rizgarkirina kurdan e. Gerîla, modela civaka nû, dinya û jiyaneke nû, esas digire. Bi van diyardeyan em fam dikin ku Serok Apo dixwaze bi gerîla çi bike. Bi tenê şer

bike? Na. Bi tenê Kurdistanê azad bike? Na. Serokatî bi piralî fikiriye û bi wî rengî şoreş mezin kiriye. Ji bo wî jî wate barkirina gerîla piralî ye. Divê mirovê nû çawa be, xwedî kîjan taybetmendiyan be? Ji bo wê girînge.

Paşve kişandina operasyonê şûn de, em hatin gel hev. Piştî ku em hatin gel hev, me fam kir ku, hinek hevalên me şehîd ketine, ew heval ji hêza Feraşînê bûn. Yek ji wan hevalan şehîd ketî, bijîşk Agir bû. Dema di rê de diçin, haya wan ji operasyonê nîne, dema tên dikevin çembera dijmin. Li wê derê heval şehîd dikeve, hevalê din jî derbê li dijmin dixin û rizgar jî dibin.

Me qala xwezaya Feraşînê heya Çiyayê reşkê kiribû, ji Deriyê Qaçê şûn de xwezayeke cûda hebû. Piştî wê em ji zozanan çûn nava daristanê. Xweşikbûna Kurdistanê cudahiya xwe nîşanê me da bi cudabûna xwe, xweza bi teşeyê xwe guhertinê, xwe nîşanî me da. Bi rastî jî xweşikbûna zozanan cûdaye, kêm be jî, me bi lêv kir. Me daristanên Bestayê cuda girte dest, hem di warê ewlehiyê de hem jî di warê xweşikbûnê de cuda ye. Em ketin Besta şûn de piştî du rojan têkilî bi hevalên Gabarê re bi rêka bêsîmê çêbû. Kûryê Gabarê dê em li milê Şehrîbanê bidîta, me jî xwe nêzî Şehrîbanê kiribû. Di wê navberê de jî dijmin kemîn avêtibû, her du kuryeyên me jî ji Rojava bûn. Dema em di nava dijmin de asê man ji bo hevalên kurye jî were gel me, axaftina bi şîfreyan zêdetir bi şêwazê bav û kala nêzikbûn pêş ket. Heval li ser bêtêlê bi erebî axifîn, wê demê ew kêmasî bû. Heke cihekî me derb xwariye bi kêmasiyên xwe xwariye. Li wê derê jî heman tişt hate jiyîn, heta wê derê me xwe bi rêzik û şêwazê gerîla

parast. Em bi kêmasiyên xwe ketin xefka dijmin, tevî ku şîfre hebû jî heval bi zimanê erebî axivîn, dijmin jî ji serê siharê ve operasyoneke bi vî rengî li ser Besta kir. Yê ku di pêş de hatin cerdevan bûn, dema cerdevanekî got: “komûtanim burada îzlerî gordûk” şûn de me fêm kir dê piçek dereng bibe êvar. Bejahiya ku em lê ne, qeraxê Besta bû, lewre xeteriya wê pir mezin bû. Koma me jî ne koma wê qadê bû, me jî fam kir ku em di nava çi xeteriyan de ne. Hevalê ku li gel me bû, xwedî ezmûn bû, demeke dirêj li Botanê ma bû, rastiya dijmin baş nas dikir. Ew heval jî hevalê Heqî bû, demeke dirêj li Gabarê jî ma bû, dizanî wê çawa ji nava operasyonê derkeve.

Me ava xwe nexistibû şaşalan (pet şîşe) me torbe biribû, me yekser ava xwe rijand erdê. Serê siharê heya 11: 00’ê nîvro me meşa qazan kir, bi vî rengî me manevra kir. Di seet 11: 00’an de temas çêbû.

Tişta balkêş ew bû ku bi rastî jî mirov bêhêziya dijmin didît. Ew leşkerê tirk ê ku bi salane me di çavên xwe de mezin kiribû. Dema leşkerek dihat gundê me, hemû gundî li hember jendermeyekî radibûn ji piya, me ew weke waliyê dewletê didît. Lê di pevçûnê de leşker evqas xurt nîne. Ew bejahiya rast û pahn de mesafeya kilêşê de sîh hevalî zêdetir em derbas bûn. Hevalê birîndar bû di temasa destpêkê de birîndar bû. Dema heval dihatin ber deştê taht dar tine bû, deviyeke biçûk hebû dihatin ber wê “ew jî psîkolojîk bû.” Hevalan çend fîşek avêtin esker û di deştê re derbas dibûn. Ew deşt bi rastî jî em naçarbûn qut bikin, wisa jî me qutkir û me wendahî neda.

Em hatin heta dema Kobra hat, bi hatina Kobra re em çûn ketin ber tahtekî. Hevalê Fikrî hebû BKC hilgirtibû.

Çanteya fîşekên BKC ser piştê bû. Me hemû xwe da ber kevir hevalê Fikrî li derve ma cî jê re nebû wî jî tenê serê xwe xist bin tahtê û guh û çavên xwe girtin. Pişt re me got: “heval Fikrî çima te guh û çavên xwe girt.” Hevalê Fikrî jî digot: “eger li min jî da, bila ez nebînim.”

Her çiqasî em ji çembera teng xelas jî bûn çembera fireh hebû. Cihê ku em lê bûn bal nedikişand, li gorî hişmendiya eskerî pêwîst bû em çûbana nav daristanê lê em neçûbûn. Dijmin jî wisa zanî ku em di nav daristanê de ne. Lewre jî helîkopterê roketên xwe diavêtin nava daristanê, cihê me jî ewqas xweş nebû, loma roket neavêtin aliyê me. Em li çepê cihê lêdana dijmin bûn. Ji bo pevçûnê jî cihê me guncaw nebû.

Paşê em çûn nava doleke teng li gel me jî tenê şorbeya hazir hebû, me nedikarî em agir jî pêxin. Dema em ser aveke biçûk re derbas bûn, hevalan ji her hevalekî re şorbeyek da ku heval bikarin ser lingan bimînin. Me hazir şorbe wilo avêt devê xwe hişke hişk bi ser de jî ava xwe vexwar. Hevalan dixwest derûniya heyî bişkînin. Ewqas bûyer, ewqas rê şûn de em jî hêdî hêdî fêr bûn. Derûniya hin tiştên cûda em jiyan dikin ji ser me rabû êdî me jî tahm ji bûyerê digirt. Piştî bû êvar şûn de em çûn milê geliyê Hêzil. Li wê derê em çend rojan man, me bêhna xwe veda paşê me dîsa berê xwe da Gabarê.

Me zanîbû ku gavekê şûn de Gabar e, ji Besta şûn de Gabar riya şevekê ye. Me hîn bi coş û moral gav diavêtin. Li Besta milê Şehrîban pişta Şirnexê re, me ava Rîsor qutkir û berê xwe da Gabarê. Li ava Rîsor hevalê Heqî sûprîzek ji me

re amade kiribû. Hîna li Kelareşê lezoyek xistibû çanteyê xwe ew lezo hiştibû dema em gava yekê bawêjin Gabarê lezo têxe bardaxekê û bide hevalan. Dema em hatin ser ava Rîsor lezo xist nava şaşalê her hevalekî hinek jê vexwar.

Hevalên ku cara yekemîn diçin Gabarê ji bo wan pir cûda ye. Me digot qey li Gabarê her tişt fêkî ye, me nedigot darên mazî û darên cuda hene. Me digot an darên behîv an jî darên tirî û hwd hene. Dema em ketin gelî û gotin ev der Gabar e. Hevalek li pêşiya min dimeşiya, tim destê xwe davêt daran her ku em dimeşiyan destê xwe davêt pelçîmê daran. Ew hejikên daran jî her li rûyê min diket, min got: “heval tu çi dikî” wî got: “ez li fêkiyan digerim.” Carekê giloxê dara mazî xistibû devê xwe dîtibû ku tahle ji devê xwe avêtibû. Ji wî be li Gabarê her tişt fêkî ye. Me digot bila bibe sihar emê fêkiyan zahf bixwin. Di pala gelî de darên Soredar hebûn, ew dar pir xweşik bûn. Min di jiyana xwe de yekemîn car li wê derê Soredar dîtin. Em jî li fêkiyan geriyan lê tinebû di heman demê de em birçî bûn. Cihê ku em lê mabûn gundek hebû, bi navê Bîrava. Hevalê Heqî çend heval şandin Bîrava ji bo nêçîrê bikin, li wê derê ajalek dabûn erdê. Rewş asayî bû şûn de ber nîvro em ketin hereketê û çûn gund. Dema em ketin gund tiştê ku ji me re hatiye gotin, kêm gotine. Her tahmê ser rûyê dinyayê me li Bîrava dît, tam wexta Gabarê bû. Li Gabarê demên xwe yê xweş hene, ew jî payiz e. Behîvê wê çêbûne, tirî çêbûne. Hejîr çêbûbûn, hirmî çêbûbûn. Me ji milekî ve behîv şikênand, ji milekî ve jî me hirmî dixwar. Me xwe pê kuşt, me ewqas fêkî dît êdî goşt nedihat bîra me.

Pişê ber êvarkî me berê xwe da deriyê spî û em êdî

hatibûn nava Gabarê. Piştî ewqas rê, zorî û zehmetî, em gihiştinn Gabarê. Ji bo ku em bigîjin cihê xwe em ewqas meşiyan, ewqasî ezmûnan re derbas bûn. Xwe gihandina Gabarê ji bo wê alanê, ji bo me heqîqetek bû, ji ber wê ne hêsan bû. Piştî zehmetiyan xweşikbûna ku hatî du qatê wê bû, xweşikbûn bê ked, bê ku tu xwêdanê birijînî bêtahm e. Piştî ewqasî tişt tahm kirina wê lezoyê ji me re pir bi wate bû.

Hevalên ku em bi hev re bi rê neketin jî hebûn piştî me hatin. Di destpêkê di hevalên ku em komê de bi hev re rê ketin, ji 3 yan 2 yê wan şehîd ketin. Di wê komê di hevalê Karker hebû, ji Ewropa tevlê bûbû. Hevalê Ozgur Findikê, hevalê Kendal Baz hebû, hevalê Kendal Koçer hebû, hevalê Kendal Mêrdîn hebû, hevalên bi vî rengî hebûn. Em di şexsê wan hevalên şehîd de hemû şehîdan bi bîr tînin. Tevî wê di wê komê de çend kes tenê ji me qut bûn, hinekan îxanet kirin. Ji wan yê ku herî zêde zora min çû îxaneta Tofanê Qersê bû. Piştî ku me amadekariya xwe ya zivistanê temam kir, reviya. Yên wisa jî hebûn, çendek ji wana di girtîgehê de ne, çendek ji jî wan tenê 4-5 heval li ser çiyê mane.

Tişta ku ji me tê xwestin şayanbûna wan hevalan e, em pir tiştan ji wan fêr bûn. Me gelek tişt bi hev re par vekir. Piştî ewqas sal tişta hişt ku em li ser lingan bimînin sekin û keda wan hevalan bû. Bi rastî dema em wan tînin bîra xwe careke din dibinin ku yê herî jîr û jêhatî bûn şehîd ketin. Yên di wê komê de herî xurt, herî zane, herî şayanê xeta Serokatî, bi rastî dixwestin di wê xetê de tiştên zêdetir bikin jî, ew heval bûn.

Derdora sê salan ez li Gabarê mam, diyardeya ku Gabarê dike Gabar, hem mirovên ku li wê derê jiyan kirine,

hîn zêdetir jî têkoşîna ku lê hatiye dayîn e. Li Gabarê gund û gundiyên jiyan dikirin ji dervayî pergalê bûn. Em dema civatê mêyze dikin heyanî dawî bi sîstemê ve hatiye girêdan. Lê Gabar cihekî wisaye ku ji ta bigire heta pêwîstiyên jiyanî bi xwe çêdike. Çandiniyê bigire heya rakirina wî, ard û nan bi xwe çêdike, cil û bergan bi xwe didirû. Di nava pêwîstiyên wan de tiştên ji kargehê derketî tine ne. Xwezaya mirov li wê derê de xera nebûye. Mirovên li wê derê jiyan kirine ked û wateyek dane xwezayê, wan mirovan ew çiya û xweza xweş kirine. Mirov encax wisa dibe mirov, mirov dema biafirîne û zêde bike, dibe mirov. Cihê ku axa lê kême û tahte, di navbera du tahtan de be jî hinek ax berdane wir û di nav de behîvek çandine. Li gorî min, tişta Gabar bi wate kiriye têkoşîna gelê Kurdistan, PKK û gerîla ye. Gabar bê gerîla bifikire, encax wateya ku min destpêkê gotî, jê derkeve. Dema gerîla dikeve Gabarê xweşikî û wate dibe du qat. Dema berxwedan bi wê xwezayê re dibe yek wata rastîn a Gabarê derdikeve holê. Bi taybet jî hevalê Egîd, Sekna hevalê Egîd Gabar kiriye weke efsaneyekê hem ji bo gelê me hem jî ji bo gerîla Gabar bûye efsane. Hevalê Egîd di nava gelê heremê de bûye efsaneyek. Di şoreşa me de jî çûyîn û mayîna li Gabarê pir cûdaye ji ber ku navenda şer e.

Dema ez ketim Gabarê pişt re ez çûm Mêrdîn, Mawa, dema vedigeriyam dihatim Gabarê hewa min cûda bû. Hîn zêdetir bawerî û hêz di min de çêdibû. Hem di milê dîrokî de hem jî di milê konjoktûrel de piştî şoreşa me pêş ket şûn de wateya Gabarê zêde bû. Lewre: *gerîla bê Gabar, Gabar bê gerîla nabe!*

## BÎST Û ŞEŞ ROJAN
## BI TENEKEYEKE ÇAY Û PIYALEYEKE AVÊ

## Qadir Sêrt

Gava em ketin hundirê şikeftê hemû hevalan li çavên hev mêze dikir. Tenê di navbera te û mirinê de tayekî zirav heye, tu diponijî ka ew ta kengî biqete, an jî neqete? Lê belê ji ber ku me ji zû ve tayê mirinê qetandiye di hemû kêliyên zor û zehmet de jî em bi mirinê re dikevin gire, ji ber ku em dibin çavkaniya jiyanê. Her demê neyar bi mendelkirina me ya fizîkî dihizire lê nizane ku me tuxubên mirinê derbas kirine. Ew bîranîn ji bo min pir biwate ye, ji ber ku di nava xwe de hestên biêş û kêfxweşiyê hildigire. Carna peyva mirin û jiyanê bi hêsanî tê ser ziman lê di rastiya xwe de ne wisa ye! Ji ber ku her zindîwerek dixwaze li vê cîhanê bijî. Eger wexta mirinê jî hat ew jî mîna zagoneke xwezayî ye bila were.

Mirineke xwezayî heye, hevsengiya jiyanê berdewam dike lê belê mirinek heye mirovên ku ji mirov bûyîna xwe dûr dixîne li ser te disepîne; ya herî zor jî ev e. Sedema herî girîng me ew feraseta mirina hêsan di ramanên xwe de kuştiye, loma em her evîndarê wê ne.

Ez demekê li herêma Herkî mame, dixwazim serpêhatiyeke xwe vebêjim. Herêma Herkî ji bo tevgera me pir cihekî xwe yê girîng heye. Hem di hêla erdnîgariya xwe de kêrhatî ye, hem jî ji bo şerê Gerîla jî wisa ye; hem rengê xwe û ava xwe, xwezaya xwe, daristanên xwe; hem jî giyayên xwe û zozanên xwe gelekî bedew in. Bi rastî jî bi her awayî dema mirov lê temaşe bike, ji mirovahiyê re warekî pir delal e, dikare mirovahiyê himbêz bike. Ji xwe bi hezarê salane himbêz kiriye. Li vê derê gelek mirov niştecih bûne, ji ber ku bi her awayî derfetên wê hene. Şerê me yê Gerîla jî piranî di sala 1997 an de li wan herêman pêş ket. Ji ber ku nêzîkî sînor e her wiha hema hema giraniya hêzên me li wan herêman bi cih bûbûn êrîşên neyaran jî li ser wan herêman pêk hatin. Herêm nêzîkî sînorê Tirkiyê de ye, di heman demê de ji bo Tirkiyê jî girîng e. Ji bo me jî girîngiya wê ew bû ku em dikarin gelek derfetan bidest bixin, dijmin jî her dixwest ku serweriyê li ser hemû cihên girîng bike.

Ez jî di bihara sala 1997 an de ji herêma Ertûşê hatim herêma Herkî, ew jî herêmeke Eyaleta Zagrosê ye. Hêviyên min gelek mezin bûn, em ji her tiştî re amede bûn, di ruh, mejî û fîzîkî de jî amedebûn. Ji ber ku şerê ku dihate kirin û heyecana ku hebû di wê herêmê de bi taybet jî germahiya hevalan bandor li min dikir. Hemû heval xwedî wê biryarê

bûn ku xakê biparêzin, ji ber wê yekê bi hêviyeke pir mezin û biryarekî pir bilind me bihara sala 1997 an pêşwazî kir. Her çiqasî ev hêviyên mezin di nava zor û zehmetiyan de derbas dibûn jî lê dîsa di dawiyê de bi serkeftineke mezin derbas bû.

Li wir operasyona yekemîn çêbû 14'ê meha Gulanê bû, hemleyeke mezin bû, jê re gotin: "14 Mayıs Operesyonu" (Operasyona 14'ê Gulanê) operasyona herî mezin ya ku Tirkan pêk anî. Hêzên pêşmerge yên Başûrê Kurdistanê jî alîkariya artêşa Tirk kirin. Her der kirin çemberê û êrîş kirin. Armanca wê êrîşkirinê ne tenê êrîşeke leşkerîbû lê belê di heman demê de êrîşeke tinekirina bîr û baweriya me ya şoreşgerî bû. Çiqasî şoreşa gelê Kurd raweste ewqasî serweriya neyaran û hişmendiya wan bilind dibe. Jixwe di wê operasyonê de hevalan çar helîkopter jî xistin. Ji aliyê rêxistinî ve jî encamên herî mezin hatin girtin. Li herêma Herkî jî amedekariyên me hebûn. Çawa ku hemû heval xwe amade dikirin ku pêşwaziya operasyonê bikin, me jî xwe amede dikir ji bo pêşwazîkirina operasyonê.

Wisa em li wir derketin herêma bi navê Govendê, li milê Xapûşkê ye. Em derketin wir me jî kemîn danî. Lê belê dijmin bi aliyê kemîna me ve nehat, paşê em jî daketin xwarê dema nîvro bû, wexta em hatibûn xwarê hîna dijmin nehatibû lê hevalên me yên jin baş keşif nekiribûn. Dijmin jî xwe veşartibûn. Ji bo wê, dema me xwe berda xwarê di cî de dijmin hate ser serê me sekini, hem bi hawanan li me xistin û hem jî helîkopter anîn ser me. Ez û Hevalê Jiyan li gel hev bûn, ew jî hevalekî xort bû, ji Başûr-Rojavayê kurdistanê bû. Dema mirov lê mêze dikir mirov jê ruh û moral digirt,

hevalekî xwedî taybetmendiyên wisa bû. Wî çeka B-7 radikir, dema rokêta xwe diavêt nîşanên wî pir xurt bûn weke teqandina guleya qilêşê diteqand. Dema te li kelecana wî, moral û fedekariya wî mêze dikir te bawerî û hêz jê digirt. Helîkopterê zanîbû, ku mûşek nînin, heya wê demê hevalan lê nexistibûn ji ber destpêka operasyonê bû. Li wê derê nizim firî û em hemû dîtin, rokêta destpêkê li me da, di navbera min û Hevalê Jiyan de ket, hema di cî de Hevalê Jiyan şehîd ket. Piştî ku ew heval şehîd ket û şûn de ez jî birîndar bûm, min ji şûn ve pişta wî girt da nekeve avê. Di navberê re kêliyek jî neborî hevalê Jiyan hilm neda û nestend. Gelekî li ber ketim, birîna min jî giran bû.

Dema min dixwest ez rabim, min dît ku her du damarên lingê min qut bûne. Hevalan lingên min bi sê cihan girêdan lê xwîn nedisekinî. Şensê min hebû ku Hevalê Ernesto nêzikî me bû, ew jî bijîşk bû. Heya em gihan gel wî gelek xwîna min çûbû. Min ji hevalan re got: min bihêlin û herin, ji bo ku hûn jî şehîd nekevin. Rehmetiyê Hevalê Berxwedan hebû, ew heval bi temen ciwan bû. Xwest min deyne ser pişta xwe lê nikarî bû. Hevalê Berxwedan ji herêma Colemêrgê bû. Min jê re got: Here min bihêle, bi sebeba min şehîd nekeve.

Ji ber ku dijmin pê bihese ku birîndarekî giran heye wê hîna bêhtir bi helîkopteran êrîş bike. Di kêliyên wisa de bi rastî tu li ser xwe nahizirî, tenê hevalên te têne bîra te eger tu biçî jî tu yekî lê hevalên li der û dora te gelek in. Vî hevalî dixwest min xelas bike lê nikarî bû. Nikarî bû min hilgire û nedixwest min li wir jî bihêle, min careke din xwe pê re hêrs

kir:

Heval here min bihêle û ji ber min şehîd nekeve, min di bin vê tehtê de bihêlin, eger ez şehîd jî ketim ji xwe hûnê werin û min rakin, eger ez şehîd jî nekevim ji xwe hûnê dîsa werin û min rakin. Lê ya girîng tu di rûyê min de şehîd nekeve!

Min kir û nekir neçû, heya min gelekî xwe pê de hêrs kir, hinek gotin jî gotin ji bo ku min bihêle û biçe. Lê, car din jî ez tenê nehêliştim, gazî Hevalê Aytekîn kir ew her du heval ketin bin çengê min û ez xirikandim, bi qasî dûsed metrî ez xirikandim. Ez gihandim cihekî ku helîkopter li me rast hat, em tengav kirin lê encam negire. Pişt re heval hatin gihîştin min û li ser darbestê ez birim bijîşk Ernesto jî li wir bû. Xwîna min sekinand, ez birim nexweşxanê ya ku li hêla Avaşîn bû. Ez li wê derê du mehan li ser pişta xwe mam. Piştî du mehan şûn de, hevalan dema rewşên zehmet derdiketin ez radikirim ser pişta xwe, neçar diman xwedî li min derkevin. Bi rastî hevaltiya ku hevalan da nîşandan ez qet ji bîr nakim. Gelek zehmetî bi min re kêşandin. Lê, di dawiyê de ez li ser gopalan dimeşiyam. Eger mirov rastiyê bêje; dikaribûn xwe xelas bikin lê belê, ew ruhê ku Rêber APO bi me re daye avakirin heya ku şehadet jî hebe em xwedî li hev derdikevin. Ev nêzikatiya hevaltiya ji dil min bi hevalên xwe re dît.

Li wê derê operasyoneke berfireh dest pê kiribû, jê re digotin ‘Sandviç Operasyonu’ (Operasyona Sendewîçê) dawiya payîzê bû. Hem hêzên pêşmergeyên PDK’ê hem jî leşkerên Tirk hatibûn operasyonê. Ji her hêlê ve hatin, lê belê, armanca operasyonê bêhtir li ser Avaşîn bû, li ser nexweşxanê bû, ji ber ku ji beriya wê jî keşfa wê kiribûn, dizanîbûn

nexweşxane li wir e. Li wê nexweşxanê jî gelek birîndarên me hene. Sê caran operasyon derket û her sê caran jî birîndarên me gelek çêbûn. Jixwe wan jî dizanî bûn gelek birîndarên me li wir hene, loma dixwestin wan bi dest bigirin û tine bikin. Di vê operasyonê de hevalan gotin em belav bibin, her komek here herêmekê. Ji bo ku dijmin nikaribe me tengav bike çiqasî xwe belav bikin ewqasî jî nikare li ser me serwer be. Wisa kom bi kom amede kirin, tevî min hemû heval veşartin, em jî deh heval bûn. Wê demê bijîşk Merwan jî li gel me bû. Em hatin sêkuçka ava Basya belav bûn, her komek birin derekê, hin heval hîna lingê wan çênekiribûn, ew li cihekî veşartin û hin hevalên din jî li nexweşxanê veşartin. Hevalê dikarin bimeşin jî heya cihekî em hatin û em belav bûn. Wiha em bûn pênc kom. Her komek pêwîst bû cihê yê din nizaniba lê hin koman cihê hev dizanîn.

Li wê derê em deh kes ji komê qutbûn, beriya ku em derkevin firokan lêdan, beriya lê bidin tesadûf em ji sêkuçka ava Basya derketin, me dît ku kunek di nava kortalekê de heye, hundirê wê jî fireh bû. Tesadufî me dît hema em ketin hundirê wê de. Ji xwe kesek ji me nikarî bû bimeşe jî, ji ber ku birîndar bûn. Em bîst û şeş rojan têde man.

Ew bîst û şeş rojên me di nava gelek zor û zehmetiyan de derbas bûn. Di hêla fîzîkî de zehmetî hebû lê, yê derûnî hîna dijwartir bû. Ez dikarim vê bêjim; mayîna me ya di wê qelîştokê de, ji bo mirovekî şoreşger ezmûnek e jiyanî ye. Pêwîst dike vîna te ya di asteke kûraniya bîrdoziyê de hebe. Eger lewaz be wê hemû helwestên te di xizmeta dijmin de bin. Ji ber ku bîst û şeş roj ne hindik in! Me di nava xwe de nîqaş jî

dikir. Wisa, hemû heval bi qasî wê zor û zehmetiyê jî, ne kesekî bi ser kesekî de xwe hêrs dikir; ne jî peyveke nexweş dana rûyê hev du hebû. Hevalek hebû nû bû, nû birîndar bibû, di wan bîst û şeş rojan de yek hevalî gotineke ku hevalê xwe bêmoral bike li pêşiya wî hevalî nekirin. Ji bo ew heval jî neêşe. Kesekî behsa xwarinê jî nedikir, kesî nedigot: “an ez birsî me, an jî ez ê ji nêza bimrim.” Ji ber ku her hevalek di wê zanebûnê de bû ku dijmin her der girtiye, em di çemberê de bûn. Ji ber ku ji komên me yên din komek ketibû pevçûnê û heya guleyên xwe yên dawiyê berxwe dabûn û şehîd ketibûn.

Hevalê Qasim ji Urfayê bû, Hevalê Wedat ji Semsûrê bû, hevalekî din jî hebû ew jî ji Serhedê bû. Ew her sê hevalan heya guleya xwe ya dawiyê şer kirin û şehîd ketin. Hevalê Xebat hebû, ew jî lingê wî şikestibû. Leşkerê Tirk hevalê Xebat dîl digirin, li lingê wî yê seqet dixin ji bo ku cihê hevalê din ji wan re bêje. Hevalê Riza jî li jora wî bû, hema hevalê Riza du metre li jor wî ye, ew heval nabêje. Heya ku li lingê wî didin, bêhiş jî dikin nabêje, heya şehîd jî dikeve nabêje. Wisa êşa lingê xwe tehemûl dike lê, napejirîne ku cihê hevalên xwe ji wan re bêje. Xwestin vîna wî ya şoreşgerî bi lêdana fîzîkî lewaz bikin, lê nizanî bûn ku vîn ji cewherê xwe yê fîzîkî derketiye. Êdî bûye hişmendiya ku di hemû şaneyên wî de hatibû çandin. Şehadeta hevalê Xebat bandora xwe li hemû hevalan kir. Ji ber wî fedekariya herî mezin kir, ji bo parastina hevalên xwe.

Piştî ku Hevalê Xebat şehîd dixin, leşker hildikişin ser zinarekî û dixwazin li hevalan bigerin û wan bibînin. Dema li ser wî zinarî disekinin xwe natewînin, loma betaniya hevalê

Riza nabînin. Kesekî nabînin û diçin. Eger xwe tewandibana wê heval bidîtana. Ew heval jî tesaduf wisa xelas dibin. Wê demê Hevalê Riza li wir e. Hevalekî din jî hebû ew jî ji Serhedê bû, lingê wî çûbû, hevalê Baran jê re dibêje, eger Hevalê Xebat xeber bida, wê ew jî şehîd xistibana, heya ku Hevalê Xebat şehîd jî dixin tiştekî nabêje. Hevalê Xebat bi xwe ji herêma Wanê bû, hevalekî asta xwe Fermandarê Desteyê bû. Lê belê xwediyê taybetmendiyên gelekî şoreşgerî bû. Ez pê re nemabûm lê, hevalan gelekî behsa wî dikirin û gelekî şerker bû, hem jî pir guh dida hevalên xwe û di hêla tevlîbûna jiyanê de jî pir dihate hez kirin, ji aliyê xwe yê rêxistinî ve jî xurt bû, xwedî zanebûn û ezmûn bû.

Komeke din ya hevalên birîndar hebû, hema yekser tine kirin. Komek ji nava wan neh kes dikevin dest, hinek jî xwe radest dikin. Ew ê ketibûn dest ji bo cihê hevalên din xeber dabûn, wisa cihê her kesî eşkere dibe. Yanî ew neh kesan digrin û îşkencê li wan dikin wisa jî agahiyan ji wan digirin. Jixwe hin hevalên jin hebûn navên wan nayê bîra min, bi egîdiyeke dîrokî şehîd ketin. Gelek îşkence li wan kiribûn lê, wan ti agahî li ser hevalên xwe nedabûn. Ev nêzîkatiya berxwedanê hêrsa leşkeran xurt dike, radibin wan hevalên jin ji tehtê diavêjin, hinek ji wan jî şewitandin. Bi wan leyîstibûn, dest avêtibûn canê wan. Her cure bêexlaqî kiribûn ji ber ku wan jinan teslîmiyet nepejirandibûn. Jin hêza berxwedanê ye; jiyan e, her dem jiyan berxwedaniyê dike ji bo ku nirxê xwe biparêze. Nirxa herî giranbuha ji bo wan hevaltî ye. Bi rastî kê bawer dikir ku rojek were û di nava civaka me de jinên wiha serî rakin, rêbertiya vê şoreşê bikin? Ew jina ku jê re digotin;

“por dirêj û hiş biçûk” lê belê, wê da nîşandan ku; “şêr şêr e, çi jin çi mêr e”

Em bi xwe eger koma me jî derketibana îhtîmalekî pir mezin bû ku em jî şehîd biketana. Eger me bigota: Em birsîne, em ê ji nêza bikevin, em ê derkevin, wisa nabe! Eger me jî di nêzîkatiyên xwe de wisa bikira; wê demê em ê jî biketana destê dijmin, em ê jî biketana pevçûnê û şehîd biketana. Jixwe çekên me yên giran jî tine bûn, her hevalek çekeke wî hebû, her çekek yek cercûr li ser hebû. Wekî din çekên me tune bûn. Tenê yek-du narincokên me hebûn, wekî din tiştek tunebû heta erzaq jî li gel me tunebû.

Bi rastî di wan bîst û şeş rojan de xew bi çavê kesekî neket. Ne ku ji tirsa! Em bi rewşa hevalan dihizirîn, gelo heval çi dikin? Gelo rewşa wan baş e? Gelo her komek tiştek bi serê wan de hatiye? Ji ber ku operasyoneke berfireh bû, her derê me dijmin dorpêç kiribû. Me nikarîbû avekê jî jixwe re bînin.

Rojekê ji rojan me got; hema li pêşiya me çi jî hebe, em ê herin hinek avê bînin, av nêzî sêkuçka ava Basya û Avaşîn bû, em ê hêdî hêdî herin dibe ku em bikaribin hinek av bînin! Em carekê çûn me hinek av anî lê, mahdeyê me ranedikir tê çawa vexwî? Her ew bû û me nikarî em derkevin. Hevalek hebû got: “em biçin cihekî nas dikim li wir çewalek fasulya heye, dibe ku em bînin û bikaribin bixwin!” Hevalan jî got: “hûn dikarin herin.” Dema em çûn li cihê wê em geriyan û negeriyan me nedît. Jixwe me nikarîbû zêde di wê erdnîgariyê de bigerin; hem jî fîzîka me bêtaqet bibû.

Wisa, bi vê rewşê em bîst û şeş rojan man di wê qelîştokê de. Di van bîst û şeş rojan de jî peywendiya me bi

hevalên derve re hate birîn. Me nizanîbû heval çi dikin! Li ku derê ne! Bêsîma me jî tine bû. Tenê dewlemendiya me ew bû ku dema te li moralê hevalan mêze dikir, li hêviyên wan, di çavên wan de û rûyê wan de hêvî hebû, ken hebû, xweşbînî hebû. Heyanî me nikarî bû dengê xwe jî derxistiba, dibe ku deng here der û dor ev jî ji bo me nebaş bû. Ji ber ku pir nêzikî me bûn heya dibe ku carna eger te cercura xwe vala kiribana wê guleya te vala neçûbana. Wisa sêsed-çarsed leşker di ber me re derbas dibûn, tesaduf gule direşandin, ji bo ku em ji bin keviran derkevin, me xweş ew didîtin. Wan digotin qey ew guleyan bireşînin em ê ji bin keviran derkevin û teslîm bibin. Lê belê me xwe di cihê xwe de ker dikir.

Lê dema ku em bi hev re jî diaxivîn wisa em di ber xwe de diaxivîn. A rastî jî hizirên me li ser xelasbûnê bû, ango em ê çawa xelas bibin! Em ê çawa rêkekê bibînin û ji vir derkevin? Me rewşa hevalan mereq dikir. Em hemû li ser hevalan dihizirîn me ji hev re digot: “pêwîst e em moralê xwe nexin, divê em xurt bin, divê em bi hêvî bin, divê rûyê me bi ken be.” Jixwe wisa jî bûn. Lê dema te li devê hevalan mêze dikir, lêvên wan hemû terikîbûn û zuha bibûn. Çavên wan çûbûn xwarê. Mînak; Hevalê Rêzan hebû ji Başûrê Rojava bû. Dema dixwest rabe ser xwe hema di cihê xwe de diket bêtaqet bibû.

Bi rastî di wan bîst û şeş rojan de her çendê zor û zehmetî jî hebû lê belê bi te re îradeyeke mezin ava dikir, baweriyek dida çêkirin. Kesayet di mercên zor de tê pijandin. Dema me bi şevê jî xew dikir teqez nobedarê me hebû, lê belê dema me dengek jî bibihîsta hema em hemû pev re hişyar

dibûn. Weke ku em ranezane ji ber ku em her dem amede bûn, me ev jî ji xwe re kiribû biryar: “Eger dijmin bi ser me de were, ji bo me teslîmiyet nîne. Çi dibe bila bibe, kesê ku teslîmiyetê qebûl jî bike em ê wî bikujin, yanî em ê yek guleyê lêbidin. Pêwîst e ev yek pêk neyê, eger dijmin hate ser me, em ê çi guleyê li gel me hebin bikar bînin. Pêwîst e ruhê me yek be û egîdiya me jî yek be. Eger em şehîd jî ketin; bila şehadet di asta pîrozmendiyê de be. Her hevalek bila guleyekê bi xwe de biteqîne lê teslîm nebe.”

Hevalê ku li gel min bûn, hevalê Sîlvan bû ji Başûrê Rojava bû. Hevalê Egîd jî ji Başûrê Rojava bû, her du jî ji herêma Efrînê bûn. Hevalê Rêzan jî ji wir bû ez bawerim ji Kobanê bû. Hevalê Bager ji Başûrê Kurdistanê bû. Hevalê Mezlûm ji Batmanê bû. Bijîşkê me Merwan bû û çend hevalên nû jî hebûn.

Di armancên me de ev hebûn. Dema bîst û şeş roj temam bû, hema me dît ku yekî ji gel me li çepikan da, em di cihê xwe de cemidîn, me wisa hizir kir ku dijmin bi ser me de hat! Me da xwe em rabûn, me dît vaye hevalê me yê rehmetî Hevalê Çiya yê Qorsan yê ji Qilebanê, hat. Ew, sê hevalên jin û Hevalê Maruf jê re digotin D.R Maruf. Tenê min tiştek ji bîr kir, tenê pakêtek çaya me ya hişk li gel me hebû cigare jî tinebû. Tesaduf ew jî çûne milê Mîrosê û dijmin ketiye pey wan, çûne wî milî û hatine vî milî tesadufî di gel me re derketine. Hatine di ser me re sekinîne û em dîtine. Me hemiyan li çepikan da. Dema me Hevalê Çiya dît mîna ku em nû hatin dinyayê. Sê hevalên jin jî hebûn wisa hestiyar nêzîk bûn, giriyan hinek hevalên xort jî giriyan. Ji ber ku hestekî

wisa pêş diket. Ew hestên hevaltiyê ne û kêfxweşiya ku tu hevalê xwe sax dibînî, ew girî biwate ye. Di rastiyê de yek xulekê jî tu dûrî hevalên xwe bikevî weke ku tu bi salan dûrî. Pişt re me dît ku li pişta hevalekî kêmtirî nîv turikî şekir heye.

Piştî bîst û şeş rojan êdî em kêfxweşbûn, bû roj, me hevalek erkdar kir ji bo here avê bîne. Ji ber bi şev mirov nizane ka çi heye çi nîne! Hevalekî jî tenekeyek dîtibû, dîsa me hevalek şand û tenekeyek av anî. Me agirê Gerîla vêxist, em li dora hevdû kom bûn û bi dilxweşî pev re axivîn. Me çaya xwe jî di tenekê de çêkir. Li ber dilê me ew teneke hêjayî hemû çeydanên dinyayê bû. Erê, piştî bîst û şeş rojan hevalan di tenekeyekê de çay çêkirin. Mixabin tenê îskaneke me hebû, hemû hevalan bi wê îskanê çay vexwarin. Ew îskan jî ne ya me bû, ya wan hevalan bû, çay gelekî şêrîn jî dikirin hinekî li ber dilê me da. Me dît ku bêsîm jî li gel hevalan heye, nûka peywendî bi hevalan re çêkirin. Jixwe dema hevalan bihîstin ku em sax in, ew dem Hevalê Amed hebû, got: “Serkeftin ya me ye.”

Wisa em hemû hestiyar bûn, hemû hevalan bi rûxweşî li hev mêze dikirin. Ew bîst û şeş roj bû em ji dil nekeniyabûn lê, em keniyan. Wiha wê şevê hevalan li leşkeran dan û şanzdeh çek rakirin. Li cihekî din du leşker kuştin. Li hêla Herêma Metîna û Zapê jî hevalan dest bi çalakiyên dijwar kiri bûn. Li nava Metîna di nîvê şevê de di demjimêr duwanzdeh de, di xefletê de hevalan êrîşî girekî bilind kirin. Li ser wî girî nêzî şêst leşkerên Tirk hebûn, hin pêşmerge û hin jinên Eyşecik jî di sengerên wan de hebûn. Baranekî hûrik jî dibariya. Tu carî wan bawer nedikirin ku heval êrîşî wan bikin,

ji ber ku her ji xwe bawer bûn û wisa didan nîşandan ku biserketine. Hevalan bi narincok û çeka B-7'ê ve êrîş kirin, di cih de êrîş kirin û gir xistin destê xwe. Hevalan nihêrîn ku çekên giran gelek in û nikarin hilgirin, radibin wan li wir îmha dikin. Weke çeka doçka, hawan û BKC yan, çekên sivik û kel û pelên leşkerî jî bi xwe re anîn. Çend pêlavên wan jinan jî bi xwe re anîbûn. Ji bo ku pêşmergan bidin şerkirin û moralê leşgeran her bilind be, wan jinan di sengeran de bikar tînin. Ev jî tabloyeke herî qirêj ya şerê wan bû. Di wê çalakiyê de tenê tiliya hevalekî me birîndar bibû, ji ber ku şev gelekî tarî bû heval ketibûn nava wan, di navbera sengeran de, ew jî bi şaşî hevalek fîşekekê li wî hevalî dixe û birîndar dike. Dema vegeriyan cihê xwe bi hev re dikeniyan. Ji ber ku ewqasî ruhê êrîşê li gel hevalan bilind bû, hevalan nema hev nas kiribûn. Ji bo vê çalakiya serkeftî wê wextê Rêbertî pîroz kir û kêfxweşiya xwe da diyar kirin. Bi vî awayî êdî hêzên Tirk û PDK'ê şkestin û paşveçûn.

Yê me jî, di wê şevê de em gihîştin hevalan ji wê derê em derxistin, em çûn cihê bi navê Tabûra Ereban. Li wir me dît ku leşkeran hemû erzaqê xwe hêliştine û reviyane. Hevalan jî hilgirtin û anîn. Wê demê leşker vekişya bûn. Tabûra Ereban jî li milê Mêzê ye girêdayî herêma Zagrosê hêla Avaşîn e. Em nêzî heftiyekê li wir man, hemû hêzên wê derê heftiyekê ew erzaq bikaranîn. Ji wan komên 'Nexweşxana Avaşîn' koma me tenê xelas bû. Hevalên nexweşxanê hevdeh heval şehîd ketin, neh ketin dest, deh jî li cihekî din xelas bûn.

Di vê kêliya ku ez niha rûniştîme, wan şehîdan bibîr tînim bejna xwe li ber pîrozmendiya wan ditewînim. Her

hevalek ji wan kesayetên bûne mîna ronahiyê li pêşiya me. Em jî dê her li ser riya wan a ronî û li ser mîrateya wan bimeşin.

# SÊ PERPERÎK
# DI NAVA XWEŞIKBÛN Û XEMLA BIHARÊ DE BÛNE YEK

## Bermal Hakkarî

Sal 1998 destpêka biharê ye.

Di her demsalekê de Heftanîn xwe bi rengîniyeke cuda dixemilîne, dualîteya xwezayê di xwe de dide jiyankirin. Pratîka min ya destpêkê û gava min a gerîlatî ya yekemîn di nav rengîniyeke bi vî şêweyî de bû. Xweza çiqas bi rengên xwe dewlemend bû, jiyana gerîla jî ew qas dewlemend û dagirtî bû. Weke ku ez di nava cîhaneke cûda de bûm, ez bawerim ku fîrdewsa ku dihat behs kirin ev bû. Jiyana gerîlatiyê bi ahengiya xwezayê re bibû yek û ahenga melodiya azadiyê, hezkirina hevaltiyê di nava dilê hemû hevalan de weke enerjiyeke herikbar pêl bi pêl diherikî. Bi rengîniya biharê re havalan jî di nava vê dewlemendiyê de dil û mejiyê xwe kiribû yek.

Demsala biharê ji bo her gerîlayekî/ê wateyeke xwe ya pir cuda heye. Bi taybet dema ku mirov ji qadekê derbasî qadeke din dibe, tevger destpê dike kelecan û coş xwe dide pêş. Weke ku bazek baskên xwe vedike û li esîmanê axên piroz digere. Ber bi çiyayên Kurdistanê ve difire, yekîneyekê xwe amede kir baskên xwe vekirin û ber bi Botanê ve firiyan.

Yekîneya ku ji hevalên jin û xort pêk dihat ferza wan ji bo qada Botanê hatibû çêkirin. Ji bo derbasbûna qadeke nû me hemû hevalan xwe amede kiribû. Hemû hevalan xwe bi Rext, çek, cil û bergên xwe, xwe xemilandin. Hemû hevalan kelecaneke pir mezin jiyan dikirin. Piştî demekê û şûn de agahî ji me re hat û gotin: "hemû heval bila xwe amede bikin em ê bikevin ser rê."

Heval hemû kombûn ketin rêzê û ji hevalên ku li wir diman xatirê xwe xwestin. Ez jî di navê de, me yek bi yek hemû heval hembêz kirin û ji hevdû re serkeftin xwest. Pir zindî û bi kelecaneke pir mezin em ketin ser rê. Rêwîtiya me destpêkiri bû. Di meşê de pir hizir û xeyal di mejiyê min de derbas dibûn. Her gaveke ku em ji Heftanînê dûr diketin, min derdora xwe dinihêrî û xatirê xwe ji kevir, ax, çem û çiyayên Heftanîn'ê dixwest. Di milekî de xemgînî, di milekî de kêfxweşî hebû. Sedema xemgîniyê ji ber qutbûna me ji hevalên ku me bi hev re demên xweş derbas kiribûn bû, her wiha ji ber qutbûna me ji xweşikbûna xwezaya Heftanînê bû. Sedema kelacan, coş û kêfxweşiyê jî çûyîna me ya qadeke nû bû, bi taybet cihekî ku her gerîlayekî/ê dixwest bibîne û li wir gerîlatiyê bike bû. Pir hest di nava hev de dihat jiyan kirin. Botan qadeke dîrokî û di heman demê de bi xweşikbûna

xwezaya xwe jî bi nav û denge.

Gavên me, dilê me û ruhê me, ber bi axa Botanê ve dimeşiyan. Yek taybetmendiya ku jiyana gerîlatiyê bi wate dike û dihêle ku mirov ji jiyanê hez bike û bi jiyanê ve were girêdan, hevaltiya rast e. Ev taybetmendî herî zêde di demên zehmet de xwe dida diyar kirin. Hinek hevalan di tariyê de zehmetî dikişandin, hêj baş fêrî meşa gerîlatiyê nebûbûn. Hevalên ku kêmek jî zehmetî bikşandana, bi dil û ruhekî hevbeş hemû hevalan alikarî bi wan re dikirin. Dema ku wan hevalan ev nêzikatî didîtin pir kêfxweş dibûn xwe bi hêztir dikirin. Em bi seatan, bi rojan bê navber meşiyan. Hêdî hêdî em nêzî sînor dibûn. Em gihîştibûn cihekî nêzî qerekolên dijmin, ji bo dijmin bi me nehese heval yek bi yek derbasî milê axa Bakur bûn. Piştî ku hemû heval bi saxlemî derbasî milê Bakur bûn bi gavên pir bi lez em ji wir dûrketin.

Hemû heval pir westiya bûn, di her navbereke biçûk de xewek pir giran dadiket ser çavên me, ew xewa du, sê deqan pir cûda ye, weke ku em bi saetan razabin, westandina me di wan çend deqeyan de derbas dibû. Rêwîtiya ber bi axa Botanê hêdî hêdî bi encam dibû.

Piştî hilkşandineke pir zor û zehmet bi berbanga sibê re, çav û dilên me ji Kêla Memê re gotibûn roj baş. Belê ber bi sibê em gihiştin Kêla Memê. Heya ku em bigihêjin cihê hevdîtinê, em qederekê meşiyan. Hevalên ku wê hatibana em pêşwazî kiribana direng mabûn. Di derbarê qadê de tu agahiyên me jî tune bû. Dijmin di erazî de heye nîne kesî nedizanî. Kêla Memê kirasê rengîniya biharê li xwe kiribû, bangawazî dikir û em ber bi xwe ve dikişandin. Em ketibûn

nava agir, derdora me hatibû dorpêç kirin, lê di derdora me de çi dizîvirî me nedizanî. Dema yekîne gihîşt ser axa Kêla Memê qederê nîv saetê em rûniştin û me derdor keşif kir, lê tiştek xuya nedikir. Piştî demekê û şûn de yekîne ket tevgerê û em meşiyan.

Deh deqe derbas nebû, ji nişka ve skorskî li ser serê me çend caran geriya. Hemû heval di cihê xwe de rûniştin, zêde nema û derbas bû. Me wate neda hatina wê helîkopterê, pirsek di serê me de çêbû, gelo em dîtibûn yan na? Di pêşiya me de hinek latên mezin û çeperên ku berê hevalan çekiribûn, xuya dikirin. Berpirsên yekîneyê em ber bi wir ve birin, hevalên rêvebiriyê gotin: "eger em xwe bigihînin wir, tiştek derkeve jî herî kêm em dikarin parastina xwe bikin." Ji ber ku cihê em lêbûn pir vekirî bû, tiştek çêbûba dibe ku hevalên di yekîneyê de hemû tune bûbana, lewre me hemûyan, bi gavên lêz û bez xwe gihand nava wan latan. Bê agahî em li wê derê sekinîn, hemû hevalan hinekî bêhna xwe vedan û xwarina xwe xwarin.

Demjimêr 15: 00 germahiya dijwar hêdî hêdî kêm dibe, roj ber bi rojava ve diçe.  Bi carekê de û ji nişka ve me dît ku sê skroskî li ser serê me difirin. Çeperên ku hevalan berê di bin latan de çêkiribûn, her sê-çar hevalan xwe dibin wan latan de bi cih kirin. Skroskiyên ku li ser serê me, em dorpêç kiribûn. Derdora me tev de bi roketan bombebaran kirin. Çend deqe derbas nebû ku bi dengê roketan, qîrîniya hevalên jin hat. Ji ber ku em hinekî ji hev dûrbûn, kesekî nedizanî ka çi bû kî bû û çawa bû. Dorpêç kirina ku hatibû çêkirin û li ser hev bombe barankirina skroskiyan, firsend nedida ku yek tevger

çêbibe. Ji ber ku pişt re me fêm kir ku li ser çiyayên ku li derdora me ne, cerdevan bi cih bibûn û em dorpêç kiribûn. Eger skroskî tenê bana, dibe ku firsetek biçûk bi destê me ketiba û me xwe ji wir xilas kiriba. Lê belê me dît ku çiyayên jorî me, hemû ji aliyê cerdevanan ve hatiye dorpêç kirin, yek bi yek sûîqast dikirin. Bi carekê de dengek axînî ji rex min hat, ez li rex xwe zivirîm min dît ku Hevalê Sefqan di sînga xwe de birîndar bibû. cerdevanên ku ji beroşa xiyanetê têr nabin, hevalê Sefqan sûîqast kiribûn. Em çar heval li cem hev bûn û cih jî pir teng bû, bi çi şêwayê me nikarîbû li birîna heval binêrin û girê bidin. Tinê me dikarî ji heval re bejin hêdî hêdî nefes bigire. Ji bo xwîn bisekine, me cihê bîrînê bi çend tîliyan tampon dikir. Çend deqe şûn de, me dît ku hevala Sakîne, BKC girtiye û berê xwe daye girê ku qorîcî ji wir sûîqastê dikin. Ber bi wir ve diçe, 15-20 gav neavetibû ku ew jî bi guleya sûîqasta cerdevanan, di lingê xwe de birîndar bû. Kesek ji me nikarî bû ji bin wan latan derkeve. Ji ber ku ji milekî rokêtên skroskî, ji aliyê din ve jî sûîqasta cerdevanan hebû. Em di nava dorpêçkirineke pir xayînane de mane. Xayintiya ku di kesayeta Enkîdo de destpê kiribû li vir xwe dubare kiribû. Dîrok di her kêliyên jiyanê de rûyê xwe nîşanî me dikir. Li milekî xiyanet, li milekî din jî, berxwedanî bi hemû hêza xwe didomiya.

Ez bawerim ku me hemûyan dixwest reşayî bikeve ango dinya zû tarî bibe. Ji bo em bikaribin ji wir derkevin. Demjimêr 17: 30-18: 00 ye hêdî hêdî tarî dadiket. Me xwe amede kir ku em ji bin wan latan derkevin. Tu kesî/ê nedizanîbû ka bê kî jiyan dike, kî şehîd ketiye, kî birîndar

bûye.

Dinya tarî bûbû. Bi paçên birînê, me birînên hevalan pêçan, ji ber reşayiyê, ev kar me bi hîsên xwe dikir, da zêde xwîn ji wan hevalan neherike. Me paç xistin birîna hevalê ku ji singa xwe birîndar bûbû, paşê jî pêça.

Hevala ku ji lingê xwe de birîndar bibû jî ji bo pir xwîn winda neke, li jorî birînê şutik hat girêdan û hat şidandin. Em çend kes bi hevalên birîndar ve mijûl dibûn, lê li aliyê din çi diqewime, me baş nedizanî.

Pişt re bi dengekî pir bi êş û dijwar, qîrîniyek dijwar bilind bû.

Dema ku siqoskî roketên destpêkê avêtibûn û qîrîniya hevala jin hatibû, wê demê du hevalên jin pir bi giranî birîndar bibûn û şehîd ketibûn. Hevala Gulnaz ji Rojavayê Kurdistanê û Hevala Sozdar jî ji Bakurê Kurdistanê bû, ji saha Rêbertiyê hatibûn.

Hemû heval bi dilekî pir bi êş û xemgîn kombûn û em ketin rêzê me berê xwe da çiyayên bilind. Beriya ku bibe sibe pêwîst bû em xwe bigihînin cihên herî bilind û xwe ji dorpêça dijmin rizgar bikin. Bi her du hevalên birîndar re em ketin rê. Di yekîneyê de hevala ku bi şehîd Sozdar re tevlê bibû û bi hev re di qada Rêbertiyê de di perwerdeyê de mabûn, hevala Axîn, nedixwest bi me re were, ji ber ku bawer nedikir ku hevala Sozdar şehîd ketiye. Qîr dikir û digot: “na, na ew şehîd neketiye, ew jiyan dike, ez ê li cem wê bimînim.” Hevalan pê re gotûbêj dikirin ji bo qanih bibe, lê hevala Axîn nedixwest bawer bike.

Em bi rê ketin. Çawa ku em ketin meşê ji nişka ve ewrên reş û tarî li ser serê me kom bûn û baranê destpêkir. Weke lehiyê û bê navber baran bi ser me de barî. Erd tev de şil bibû, gavekê ber bi pêş, gavekê jî ber bi paş em bi zorê dimeşiyan, dinya pir tarî û ax jî şemîtok bû. Me bi destên hev digirt, alîkarî dida hev û wisa dimeşiyan. Em bê navber 11-12 demjimêran meşiyan lê belê weke ku bi rojane em dimeşin, ne rê xilas dibû ne şev bi dawî dibû. Cilên me tev de şil bibûn her careke ku me dixwest çend deqan bêhna xwe vekin em tev de ji sermayê dilerizîn.

Ber bi şefqa sibê baran sekinî dinya hêdî hêdî ronî dibû û şewqên rojê berê xwe dabû ser rûyê me.

Me dorpêç derbas kiribû û em derbasî aliyê din bibûn, em li cihekî sekinîn û me der û dora xwe keşif kir. Hevalên birîndar nema dikarîbûn bimeşin. Me xwe gihandibû lûtkeya çiyan, evder cihê herî bilind bû. Li vir me ji hevalên birîndar re di nava latan de cihek çêkir, birînên wan hatin derman kirin û çadirên ku avê derbas nake bi ser wan de hate raxistin. Ew hatin nuximandin. Her du hevalan her yekî ji wan narîncokek girt cem xwe. Ev narîncok ji bo bi saxî nekevin destê dijmin, girtin cem xwe. Me jî xatirê xwe ji wan xwest û xwe berda Geliyê Tirşikê.

Biharê baran li van qadan pir dibare, berfa ku zivistanê dibare bi barîna baranê re dihele. Ev jî dibû sedema lehiyan û zêdebûna ava çeman. Çend demjimêr şûn de, em gihiştin ber çemê Geliyê Tirşikê. Çemê Geliyê Tirşikê, pir gur û pir bi lez diherikî. Dema ku mirov ji dur ve lê dinêrî, mirov hêza herikandina wê nas nake, heta ku em hatin û li rex sekinîn.

Me nikarîbû derbas bibin, ji bo em derbas bibin pêwîst bû em alîkariyê bidin hev û wisa derbas bibin. Ji bo vê jî hevalekî xurt derbasî milê avê yê din bû, ji bo heval yek bi yek derbas bibin destê hevalan digirt û kaş dikirin aliyê din. Beşek ji hevalan derbas bibûn. Piştî ku ez derbas bûm û çend gav ber bi hevalan ve çûm, ji nişka ve qîrînî bi hemû hevalan ket û bi qîrîniya hevalan ez li pişt xwe zivirîm.

Dîmenên ku min bi çavên xwe dît, weke ku birûskek li mejî û dilê min bikeve, di cihê xwe de ez sekinî mam. Min dît ku li ser ava ku şêlo bû, çantayek leşkerî tenê dixuyê û destê heval tenê çend saniyan xuya kir, paşê jî winda bû.

Çiqas hewildan hat dayîn jî lê kesekî ji me nikarîbû heval xilas bike.

Nîvê yekîneyê derbas bibû nîvê wê yê din jî li aliyê din mabû, hemû heval bi rondikên çavan bê henase sekinîbûn. Kesekî nikarîbû xwe bilivîne, kesekî nikarî bû yek peyvê bi lêv bike. Di çavên hemû hevalan de îsyan hebû, weke ku her kes bêje ma qay ev xweza jî li me bûye neyar, em hemû di cihê xwe de hişk bibûn.

Hevala Axîn dema ku gava xwe davêje, lingê wê dişemite û ew hevalên ku destê hevalan digirtin û derbas dikirin jî nikaribûn tiştekî bikin. Du hevalên me şehîd ketin, du hevalên me birîndar bûn.  Piştî ew qas bûyer û şûn de, şehadeta hevala Axîn bi me hemûyan pir girantir hat.

Weke ku ew çem li bendê bû ku hevala Axîn gava xwe bavêje, da ku bigire û daqurtîne. Weke ku bêje hevala Sozdar li benda te ye.

Heval Axîn û hevala Sozdar: beriya ku tevlî refên gerilla bibin li qada Rêbertiyê bi hev re perwerdê dibînin. Demekê li wir hev nas dikin, bi heskirineke mezin û hevaltiyeke bi wate bi hev re dimînin. Ev hezkirin, ev girêdana her du hevalan, hişt ku gavekî din pêşdetir biçin û tevlî refên gerila bibin. Her du heval di sala 1997-98'an de derbasî Heftanînê dibin li vir jî, hevaltiya wan xurtir dibe û bi hev re berê xwe didin qada Botanê. Hevala Axîn ji şehadeta hevala Sozdar pir bandor bibû. Ji bo wê yekê jî dema hevala Sozdar şehîd ket hevala Axîn bawer nedikir.

Di navbera şehadeta her du hevalan  de ne roj çend demjimêr derbas bibûn.

Tevî hemû zehmetiyan me dev ji xwe bernedida, ji ber ku em di wê zanebûnê de bûn, eger em ji hemû aliyan ve xwe bi hêz nekin, wê dijmin û hevkarên wan bi ser bikevin. Nêzikatiyeke wiha jî me kesekî ji bo hev qabûl nedikir, pêwîstbû ev êşa ku me jiyan kirî, em ji xwe re bikin hêz.

Piştî derbasbûna hemû hevalan hemû der hatin keşif kirin. Dijmin di bejayî de nema bû, operasyon bi dawî kiribû. Baran jî geh disekînî geh dibariya, hevalên ku wê hatibana em pêşwazî kiribana ew jî hatin. Me ji wan hevalan pirsin, çima hûn nehatin, wan jî dan diyarkirin ku nikarîbûn xwe bigihînin me. Dîtine opresayon heye û pirsgirêkên cihazê derketiye, lewre nikarî bûn xwe bigihandana yekîneyê û agahî dabana.

Heval hemû ketin şikeftê û têde bi cih bûn, dar hatin kom kirin, agir hate vêxistin. Heval li derdora agir rûniştin, cilên xwe zuha kirin, wê şevê em li wir man.

Ez jî bi hevalên birîndar dihizirîm, ber bi sibê re min xwe amede kir û bi her du hevalên kurye re, em ketin nav tevgerê. Hinek paç û dermanê birînan, hinek şekir, xwê û şorba hazir, me girtin gel xwe. Pişt re, em ber bi hevalên birîndar ve meşiyan. Her du hevalên xort jî komek dar û av bi xwe re anîn.

Em ketin rê di mejî û xeyalên min de pir tişt derbas dibûn. Min digot: “gelo niha ew heval jiyan dikin ya ne? Gelo dijmin ew dîtine, ya ne? Gelo birînên wan çawa bûne?” Di dawiyê de min hêza xwe kom kir û digot: “tiştek ji hevalan nebûye her du jî jiyan dikin.” Bi demjimêran ev hizrandin di mejî û xeyalên min de dihat û diçûn. Hêdî, hedî em nêzî her du hevalan dibûn, dilê min wek dilê kîvroşkekê lêdixe û bi tirs, gavên xwe ber bi hevalan ve diavêjim. Cihê ku weke çadir ji wan re hatibû çekirin, bi gavên hêdî û bê deng me xwe nêzî wan kir.

Her du heval, dirêjkirî bûn. Destpêkê min dixwest fêm bikim, ka henase digirin û distînin, yan na? Piştre bi dengekî aram min banî wan kir, herdu hevalan jî çavên xwe vekirin û li min nihêrîn. Her du heval jî saxbûn û baş xuya dikirin. Ez pir kêfxweş bibûm. Weke ku ez ji nû ve nefes distînim, weke ku ez ji nû ve dest bi jiyanê dikim.  Hest û ramanên ku di wan çend saniyan, çend deqan de min jiyan kirin, bi çi şêweyî be, zehmete bilêv bikim. Ji ber ku hinek tişt hene mirov çiqas bi lêv bike mirov nikare bibe bersiv. Hinek rastî hene gotin û nivîs têrê nakin tenê têne jiyankirin. Ew hest û hizir bi mirov re dimînin, weke henaseya ku dihêle tu jiyan bikî, weke lêdana dil ku xwînê dide tevahî laşê mirov. Çawa ku kesek

nikare pênaseya vê rastiya mûcîzane bike, hinek hest û ramanên ku mirov jiyan dike wateya wan cuda ye, îfade kirin jî zehmete.

Her du hevalên xort ên ku em bi hev re hatibûn çûn cihê ku em ketibûn kemînê, ji bo wan her du hevalên şehîd, hevala Sozdar û hevala Gulnaz veşêrin. Ez jî bi hevalên birîndar re mam. Destpêkê me agirek pêxist û ji wan re şorbeyek çêkir. Hinek germ bûn û şorba xwe jî vexwarin, hêdî hedî bi ser xwe ve hatin. Min birînên wan vekirin paqij û derman kir, birînên her du hevalan jî, cihê ku gule lêketibûn, hestî û rihên esab bandor nekiribû. Hêdî hêdî me xwe amade kir û em ketin ser rê, di rûyê her du hevalan de diyar bû ku hêj bawer nedikirin jiyan dikin.

Hevala Sakîne ji lingê xwe ve birîndar bibû, di meşê de, zehmetî dikşand ji bo wê jî em hêdî hêdî dimeşiyan. Heta demekê, bêdengiyeke pir kûr, di me her sê hevalan de dihate jiyankirin. Bi çavên xemgîn me temaşeyî xwezayê dikir û li hev dinihêrî, di nerînên çavên her du hevalan de îsyan û keyfxweşî bi hev re dihat jiyankirin. Piştî bêdengiya kûr û bi wate, me dest bi nîqaşê kir. Dema ku em ji wan qutbûn çi çêbû çi hat jiyan kirin û di heman demê de hizir û hestê ku min ji bo wan jiyan kiribû, bi wan re parve kir. Her du hevalan jî, hest û hizrên ku jiyan kiribûn bi me re parve kirin.

Em nêzî yekîneya xwe dibûn. Em hatin ber devê şikeftê sekinîn û hêdî hêdî em derketin pêşberî hevalan, bi dengekî coş me silav da hevalan. Hemû hevalan berê xwe zîvirand û temaşeyî me kirin, çawa ku dîtin her du heval saxin, hemû heval bi hev re rabûn û bi dilekî germ û keyfxweşiyek

mezin her du heval hembêz kirin. Di vegotinên hemû hevalan de, weke bawer nedikirin, yan weke ku bêjin: “ev xeyale em dibînin.” Bi wî şêweyî matmayî mabûn, piştî çend deqan bêdengiyê cihê xwe ji keyfxweşî, dengên bilind û nîqaşên bi coş re hîşt.

Sê dil bûbûn yek ketibûn rêya heqîqetê, li heqîqêta jiyana azad digeriyan, heqîqeta ku bi hezarê salane hatibû winda kirin. Li heqîqeta jiyana mirovane digeriyan, li welatê dayîka xwedawend, li heqîqeta ku di xakên Mezopotamiya de hatibû fetisandin digeriyan. Ji ber ku dizanibûn, heqîqeta mirovahiyê di van xakan de derketibû holê û di van xakan de dîsa winda bibû. cihê ku mirovahî car din wê ji nû ve lê şîn bihata û zîvirîba cewherê xwe, têkoşînek dijwar pêwîst dikir. Her sê perperîk di vê ferqê de bûn, ji bo wê berê xwe dabûn van xakên ku bi hezarê salane di bin dorpêçkirineke pir qirêj de mabû. Heta ku Kurdistan were paqijkirin, ked dayîn û berxwedaniyeke bê hempa pêwîst dikir. Lewre Hevala Gulnaz, Sozdar û Axîn, bi rihekî APO’yî, bê du dilî, ketibûn ser vê riyê. Bi berxwdaniyeke mezin, ji bo heqîqetê têkoşiyan û canê xwe ji bo wê fedakirin.

# CARÊ HEKE MİN FERMAN DA WE Bİ YA MİN BİKİN

## Îbrahîm Zîndan

Di nava civakê de min alozî jiyan dikirin, Lewre lêgerîn di min de çêbûn. Bi taybet di pirsgirêka netewî de nakokiyên min çêbûn. Ew jî bû sedem ku ez têkevim nava rêyên çareserîyê. Di sala 89-90 de bilindbûna şoreşê heye, di van salan de min ciwanên welatparêz naskirin. Li ser vî esasî beriya şerê başûr biryara min a ji bo tevlêbûnê misoger bû. Di wê pêvajoyê de propaganda dijmin pir zêde hebû, digotin me PKK xiste tengasiyê, me tine kir, ha îro emê tine bikin ha sibe. Ew propaganda dijmin a reşkirinê di min de hestên cuda pêş xistin. Min digot hereketeke ku ji bo me, ji bo azadiya me têkoşîn dide, niha di tengaviyê de ye, divê ez jî bibim alîkar,

bi van hestan min biryara tevlêbûnê da. Li ser vî bingehî me komeke hevalan biryar da û em tevlê bûn. Di rê de heta em gihîştin Botanê şerê başûr xelasbû. Em pê re negihîştin ku biçin nava şer û tevlî şer bibin, em rasterast hatin Gabarê. Demsal jî derengiya payîzê bû. Ji xwe Gabar jî ji aliyê erdnîgariyê û aliyê gel ve cihekî pir li pêşbû. Li gel hevalên Gabarê 15 hevalên ku weke me nû hatibûn me bi hev re perwerde dît. Piştî perwerdê em hatin vesazkirin û em ketin nava pratîkê. Di sala 1993 an de dijmin bi ser me de hat, ji ber wê şerekî dijwar derket. Rêbertî li gorî rewşa siyasî agirbes îlan kir, me jî nedikarî wateyekê bidin ji ber ku em ji aliyê siyasî ve lewaz bû. Me digot em şer derketine, em westiyane, ew agirbes jî ji bo me weke girtina henaseyeke ku em karibin xwe nû bikin û ji nû ve dest bi pêngavekê bikin. Nêrîna giştî ya qada pratîkî piranî di vî warî de bû. Pişt re rewşa agirbes bi dawî hat ango xera bû, şer hîn bêhtir bilind bû. Ew rewş li qada ku em lê ango Botanê û seranserê Kurdistanê derket holê. Ez bi xwe heta bihara 1994 an jî li Gabarê mam. Ez li Gabarê Çiyayê bizina, navsera Gabarê û li Findikê mam û min xebat da meşandin.

Sala 1994 an dijmin pêngaveke mezin da destpêkirin. Operasyonên giştî yên wê salê li Gabarê destpê kir. Armanca van operasyonan jî şikandina vîna gerîla bû. Ji aliyekî ve pir teknîk hate xebitandin, ji aliyê din ve jî xwestin qadan bigirin. Bi vî rengî liv û tevgerê destpêkir. Loma em yekser çûn ser çeka doçkayê, çeka me jî li pişta Xursê bû. Ew der jî Nêzîkî noqteya şehîd Savaş bû, li ser qadê jî xwedî serwerî bû. Piştî ku em çûn ser gir, 3 roj şûn de Azadê Xirbika Besta hate gel

me. Rojekê ber êvarê bû saet 3,5-4 e operasyon jî pir zêde dihat kirin, ji 4-5 milan ve dijmin derketibû bejahiyê her ku diçû pêş de dihat. Her wiha bi tank, obûs û hawanan jî bombarduman dikir. Bi helîkopter û balefirên şer jî dixwest qadê bigire bin desthilatiya xwe. Ji nişka ve balefir hatin û 2-3 caran çû û hat paşê çend roket avêtin gundê Gûyina. Dema roket li jora gundê Gûyina da û bi ser me de hat, hevalê Azad bezî ser doçkayê. Çend caran gule lê reşand, bi gule berdanê re balefirê derb xwar. Du re jî pêşberê me tahtên TRT Blûcîna ket û teqiya. Di wê kêliyê de hevalan jî gotin pîlot xwe saxî berdaye û xwe xelas kiriye, divê em herin wî bigirin. Bi vî rengî em çûn ku pîlot bigirin lê çûyîna me û hatina helîkopterê bi hev re çêbû. Helîkopterê berê me xwe gîhand pîlot û rakir bir.

Paşê biryara paşve kişandinê derket, bi biryara paşve kişandinê re em rasterast derbasî Besta bûn. Ji bo wê jî em çûn Çiravê, ji bo hatina Çiravê di gelî de girê sor hebû ku girîng bû, loma dijmin zaf giranî da ser ku wê derê bigire. Heke ew der hatiba girtin me nekarî em derbasê Çiravê bibin. Ji ber vê girîngiya girê sor, hevalan zaf berxwedanî kirin. Li wê derê 4 heval şehîd ketin, hevalê ku serpereştî ji wê berxwedanê re dikir, şehît Felat bû. “Ew heval jî di salên 90’î de tevlî şoreşê bûbû, ji Çinarê bû ji eyaleta GAP’ê tevlê bûbû.” Di encama berxwedaneke pir mezin de dijmin li wir hate şikandin. Ji bo ku heval bi hêsanî bikaribin paşve vekişin û derbasî qada ku biçinê bibin em derbasî Besta bûn. Nêzîkî deh rojan em sekinîn. Li wê derê nêzîkî 300 heval li qadê kom bûbûn. Ji Aliyê din ve jî şer dewam dikir, li Gabarê şer berdewam bû, li

Cûdî û Garisa operasyon derketibû. Hema bêje Botan hatibû dorpêçkirin, pêwîstî bi hêzên xwedî ezmûn jî hebû ku şer derbasî qadên din bike. Di rastiyê de piştî operasyona dijmin partê dixwest gavan biavêje. Bi dijmin bide xuyakirin ku ewqas operasyon û lêçûnên ku tu dikî, aliyên xwe yên netewî û navnetewî hene, ji bo em van operasyonan vala derxin pêngav pêwîst bû. Di vê derbarê de yekîneyek ji nava hêzên me hat hilbijartin. Ji bo çûyina Behdînan û herêma Elbakê, ez jî ketim ber vesaziyê, hevalê ku ji vê yekîneyê re serpereştî dikir hevalê Xalid Balveren bû. Di havîna sala 1994'an de em ji Navyan a Besta derbasî girê Riştê bûn, ji wir jî em derbasî geliyê Tirşkê bûn. Hevalê Cemal jî hate wir ji me re civîn çêkir, armanca vê civînê jî li ser çûyîna me bû. Çima em ê di vê pêvajoyê de biçin? Sedema çûyîna me girîngiya wê û rist û erkê ku dikeve ser milên me çi ne? Nêzîkî du saetan civînê ajot. Bi serpereştiya hevalê Xalid em ketin rê û derbasî Kêla Memê bûn. Li Kêla Memê komek hevalên birîndar û nexweş hebûn. "Hevalê Cemal jî gotibû hûnê wana bigirin û derbasî Heftanînê bibin" Em çûn gel wan hevalan li gundên Şîrîş û Mijînê bûn. Em şevekê li gundê Mijîn man. Ji bo ewlekarî û saxlemiyê gav bi gav em çûn derbasî Tanînê bibin 2-3 roj bi keşif kirinê derbas bûn. Ji bo em hêzên xwe saxlem derbas bikin, dewriye û keşîfçî hatin darxistin. Piştî sê rojan kom gihîşte me û em derbasî Tanînê bûn. Ji ber ku bejahiya Tanînê zahmet bû me nekarî em di şevekê de derbas bikin, ji neçarî me di du şevan de derbas kir. Bejahiya Tanînê zozanî û bilind e, aliyekî wê geliyê Guyiya ye, aliyekî wê jî Elkê ye, wê deme li her du mil jî Cerdevan bûn. Ew Cerdevan jî diketin pêşiya

dijmin û kun bi kun li hevalan digeriyan û pêşengî ji dijmin re dikirin, da ku dijmin jî spasiya wan bike. Ew cerdevan bi vî rengî bûn. Ji ber wê jî em bi şiyarî tevdigeriyan da ku ji wan re derfet çênebe û em nekevin pevçûnê. Me nedixwest em aşkere bigerin û dijmin jî me bibîne û bi teknîkê bi ser me de were. Eger dijmin tevgereke piçûk jî bidîta ew dikarîbû bibe sedema ji navçûna me, hevalê Xalid di vê xalê de pir şiyarbûn. Ya yekê hevalê Xalid bejahî baş nas dikir ku ew jî dibû destkeftek ya din jî wateya berpirsiyariya girtibû ser xwe dizanî, Ji ber wê yekê baş dizanî çawa hevalan bi cih bike. Ji xwe gerîlatî wiha ye ji bo di cihekî de bi cih bibî divê keşfeke baş bê kirin. Dijmin ji ku derê ve nêzike, heke dijmin hat destpêkê dê leşkeran deyîne ku derê, dema hatî dorpêçkirin di ku derê re dikarî derkevî û wendahiyan nedî. Pêwîste van hemû tiştan di ber çavan re derbas bikî. Fermandarekî/e di şer de nepijiyabe pir zêde van ji hev dernaxe. Hevalê Xalid di wan taybetmendiyan de pir şiyar bû. Di wî warî de ji fermandaran re jî civîn çêkir, hişyarî da. Wê rojê em bê pirsgirêk li Tanînê man û ber bi êvarê em derbasî Heftanînê ango Sinahtê bûn. Li Sinahtê jî em li nokteya Erebêsor bi cih bûn. Çima em derbasî Sinahtê bûn? Ji ber çûn û hatin di wê derê re dihatin kirin.

Di civîna ku hevalê Cemal kirî de şiyariyeke din jî kiribû, di şerê başûr de KDP û YNK hevkariya dijmin kiribûn û li hemberî me şer kiribûn. Bi taybetî di wî warî de hişyarî hate kirin. Got pîlangeriyên hevkarên dewleta tirk bizanin û bi hişyarî tev bigerin. Ew di her kêliyê de dikarin li hemberî we bextreşiyê bikin ango we bifiroşin tirkan. Ji ber wê yekê di rê

de û piştî ku em çûn Heftanînê, xala ku herî zêde hevalê Xalid li ser disekinî ew xal bû. Pêwîst bû em bi erzanî neçin. Di şoreşa me de û feraseta şoreşa me de pirsa jiyankirina çawa heye, divê em bersiva vê pirsê bidin. Şehîdên me bi şehadeta xwe jiyaneke pir mezin ava kirine. Ev jî di dîroka partê de xuya ye ji Mazlûman, Xeyriyan, Ferhadan bigire heta; Bêrîtanan, Zîlanan, Semayan her şehadeteke wan hevalan jiyaneke mezin daye afirandin. Ev heval erzan şehîd neketine, deqa xwe li dîrokê dane û ji bo em jî di riya wan a ronî de bimeşin ji me re rê vekirine. Hevalê Xalid jî di van mijaran de hestyar bû, digot pêwîste em bi erzanî necin, heke şehîd bikevin jî wisa bi asan, ji rêzê nebe. Li ser erkê xwe û di cih de em şehîd bikevin. Civînên ku di rê de dihatin kirin de herî zêde li ser vê mijarê hate sekinandin. Heval digot: “divê em bi ewlehî û tendirûst bigihêjin cihê xwe, em rêxistinê vala dernexin. Heke tiştek jî qewimî em bi erzanî şehîd nekevin, heke em şehîd jî ketin bila ev bibe sedema jiyan û pêşketinên nû.”

Rêbertiya me jî di dahurandinên xwe de bi taybet vê mijarê zahf rexne dike. Li ser fermandarî û nêzikatiyên wê “di wan salan de wendahiyên ne di cih de jî hatin dayin” ji bo pêşiya wendahiyên ne di cih de bê girtin hewildanên rêxistinê jî hebûn. Her fermandarekî PKK li ser van diponije, her wiha hevalê Xalid jî wisa bû.

Demekê ez li Heftanînê mam, pişt re çûm Qaşûra ku bi ser Metînan ve ye. Li Qaşûra di kela Qumrî yê de em man, nêzikî du rojan li gel hevalên wê derê em sekinîn. Me li wê derê pêwîstiyên xorak pêk anîn, me bêhna xwe veda û şûn de

em derbasî Metînan bûn.

Derbasbûna me ya Metînan bi şev bû, di rê de hevalê Xalid got em bêhna xwe vedin, da ku em bi lezgînî derbasî cihê xwe bibin. Di rê de bûyerek jî qewimî, du kes ji taxima me wê şevê reviyan. Her du jî ji Rojavayê Kurdistanê bûn, vê bûyerê bandor li ser moralê me kir. Li gel ewqas şiyarbûna heval Xalid, dema ev rev hat kirin, bandorek neyînî li ser kir. Weke bêje me derbek xwar. Digot me xwest em bi saxlemî bigîjin cihê xwe lê me hesaba vî tiştî nekir. Bi niyeteke saf li her kesî dimeyzand, ji ber ew bi xwe pir dil pak û girêdayî nirxên şoreşê bû. Li hember ti hevalekî bi guman nêzikatî nedikir. Ji ber ew însanên ku revîn, di encama ked û xwîna şehîdan hatibûn. Ji ber vê yekê digot çawa dibe ku ew însan li gel me direvin û diçin. Di civîneke yekeya me de jî bi heman rengî bûyer şîrove kir. Gelek caran ji xwe pirsî û got gelo ji ber nêzikatiyên me ên şaş ew reviyan çûn, çi kêmasiyên me hebûn ku ew ketin rewşeke wisa. Çawa dibe ku me nekarî em wan însanan di nava xwe de bigirin. Bi hişmendiya wê demê me pir wate nedida vî tiştî. Niha ez diponijim ku wê demê wî hevalî çiqas girîngî dida vê bûyerê. Piştre em bi şêweyekî bê moral û bê taqet çûn derbasî Metînan bûn. Ji ber hîn zêdetir bandora neyînî çênebe, hevalê Xalid ew rev nexist rojava yekîneyê. Erkek li pêşiya me bû, diviyabû em bi ser de herin, rastiya me jî wisa ye ku heke bi coş bi ser karekî de herî, encam jî digirî.

Di vê rewîtiyê de taybetmendiyeke din a hevalê Xalid fedekariya wî û hurgilî meyzandina wî ya li jiyanê bû. Êvarê heta sibê em dimeşiyan lingên me diwerimîn, av kom dikir,

carna xwîn jê dihat. Dema sibê mirov digêje cihê xwe zehmete mirov ji hevalekî re bêje; çeka xwe bigire û here nobetê. Ji çay kelandin an jî xwarin pijandinê jî mirov aciz dibe. Ji ber westandin heye, her kes dixwaze bêhna xwe berde û xwe dîsa ji meşê re amade bike. Wî hevalî ev tişt baş dizanî, lewre nobeta destpêkê wî hevalî digirt. Dema di dawiya meşê de em digihîştin cihê xwe hevalê Xalid bang li lîstecî dikir û digot: “du saetên destpêkê min binivîse, ezê nobetê bigirim.” Bi vî awayî nobet digirt paşê diçû bêhna xwe vede û razê. Dema xorak tine bûya wî digot: “heke hevalek ji dil li gel min tê bila bê, nexwe ezê tena xwe herim ji hevalan re xorak bînim.” Diçû ar û tiştên din dianî, hevîr çê dikir, agir pêdixist, sêl datanî ser agir û ji hevalan re nan dipaht. Heval radizan û radibûn ku nanê wan hatiye pahtin û amadeye. Ev jî dide diyar kirin ku hevaltî û fermandartiya wî di çi astê de ye. Bi çi hestan nêzikatî ji heval û jiyanê re dikir. Mirovek heke piçek jî mirovtî pê re hebe ne pêkane ku erênî bandor nebe. Vî hevalî ji bo ku der û dora xwe bandor bike, ev tişt nedikirin. Xwe qanih kiribû, ji dil û bi baweriyeke mezin ew tişt dikirin. Heke xwe qanih nekiriba, dê rojek du rojan wisa kiriba lê roja siseyan dê bigota ez êdî nikarim. Dê bigota çima hûn jî wek min nakin. Hevalê Xalid xwendevan nebû. Dîrok nexwendibû, şaxsiyetên mezin ên dîrokê nexwendibûn, hunera şer nexwendibû, lê belê wî di kûraniya dil û mejiyê xwe de ew tişt jiyan dikirin, lewre kesayeteke xwerû û pêşketî bû. Hîsên wî pir xurt bûn, hîs dikir û bi hîs kirinê re jiyan dikir. Bi sekin û têgihîştina xwe re hêz dida hevalan. Heval jî li dora wî kom dibûn. Em bêjin em bi saetan meşiyane hatine, ew heval

nedifiriya û nedihat her tim li pêşiya me bû. Ew jî diwestiya, lingên wî jî diteqiyan. Lê belê wî digot bila heval bêhna xwe berdin, nedigot ez bêhna xwe vedim. Ji ber fermandarê me bû, dikarî bû bigota bila du heval herin nobetê. Bila heval herin xorak bînin. Dikarî bû bi vî rengî ferman bida, tu kesî jî dijîtiya wî nedikir. Lê belê wî digot: “bila heval baş bêhna xwe vedin, bi ser xwe ve werin, da ku êvarê karibin bimeşin û em jî karibin bigihîjin cihê xwe.” Hevalê Xalid dixwest di dîwarekî de em bibin kevirekî baş. Feraseta wî hevalî bi vî rengî ye. Em du şevan li Metînan man. Li Metînan ji ber rêzanê me ne amade bûn em du şevan lê zêde man, ji ber vê rewşê bi hevalê Xalid re tengasî çêbû. Dijmin li Amed, Xerzan û Botanê operasyon kiribû. Şîmale hebû ku li Metînan jî operasyon bike. Heke em dereng jî ketibana me yê nekarîba tevlî pêngavê bûbana. Nirxandinên hevalê Xalid ên bi vî rengî hebûn. Ji bo pirsgirêk çareser bibe, hevalê Xalid bi berpirsiyarê heremê re peywendî danî û gotûbêj kir. Bi vî awayî pirsgirêk çareser bû.

Em tenê di rê de nediçûn. Dem bi dem dahurandinên Rêbertiyê ji me re dixwend. Fermanên rêxistinê bi nivîskî dihatin û me ew dixwendin. Hevalê Xalid di vê mijarê de jî mînak bû. Yekîneya xwe vala nedihîşt û di milê fikrî de jî pêş dixist. Desteya ku li dora wî bû ew temam dikir. Di heman demê de dikarî bû temamkerê xwe çêbike. Ji ber tê zanîn di van mijaran de lewazî tên jiyankirin. Weke deste tevger baş çênabin heval di warê ewlekariyê de pergalek çêkiribû. Koma perwerdê hatibû damezirandin. Di kîjan warî de lewazî hebûya jê re rêxistinek çêdikir bi van rêbazan pêşengî dikir.

Carna digot: “hinek lewaziyên min hene, heke di min de lewazî hebe, di we de jî heye. Lewre em ji hev re bibin alîkar.” Çavkaniya bîrdoziya me kî ye? Rêber Apo ye. Li ser vî esasî di rê de me perwerdeya xwe didît. Di wan salan de, pirsgirêkên wiha jî hebûn pêkhateya rêxistinê li gel perwerdê zêde nedigunca. Lê belê di kesayeta wî hevalî de ew feraset nedihat jiyan kirin. Heval wisa lê dikir ku valatiya bîrdozî û ramyarî di me de bê dagirtin. Di heman demê de li hemberî perwerdê hezkirinek di me de diçand. Bi vî rengî di me de hezkirina perwerdê pêş ket. Ev tiştên ku ez niha vedibêjim, paşê em têgihîştin. Wê demê me pir zêde wate nedida, pênase nedikir. Heke em heta niha li ser lingan mane, tevkariya wî hevalî jî têde heye. Em di gelek mijaran de xwe deyndarê şehîdên bi vî rengî dibînin.

Ji Metînan, em derbasî Zap’ê bûn, çend rojan jî em li wir man. Wê demê bêhna operasyonê hîna jî dihat. Li Zapê carek du caran hewil dabûn ku operasyon bikin. Ji ber amadekariyên hevalan hebûn, nehîştibûn dijmin pêş de were. Dema em ji Zapê hatin li Çiyayêreş, hevalan qala hatina dijmin dikirin. Çawa lê dane û dijmin paş de çûye, dihat vegotin. Hewildanên hevalê Xalid hebûn ku beriya derketina dijmin em bigihêjin cihê xwe. Di vê derê de amadekarî ji bo bi rêketinê hate kirin. Ji ber ku em neçar bûn xorak ji bo deh rojan bi xwe re rakin. Her çiqasî ji aliyê xorak ve tengasiyên hevalên Zapê hebûn jî bi me re bûn alîkar. Du torbe ar, çay, şekir û hwd dan me ku em xwe bigihînin Avaşîn. Ji ber heta Avaşîn, li ser riya me hêzên me tinebûn, hebûna jî em nedisekinîn. Bi vî rengî xorak taxim bi taxim hat dabeşkirin û

em ketin ser rê, çûn Avaşîn.

Yekîneya me ji Botanê hatibû, Botan jî di nava xwe de girtî ye, piranî hevalên me jî ji Botanê tevlê bûbûn û li wir mabûn. Dema em hatin heta Behdînanê, di navbera hevalan de nelihevî hebûn. Em ên Botanê bûn, ew jî yên Behdînanê bûn. Bêguman di feraseta rêxistinê de tiştekî wiha tine ye. Her der cihê şoreşê ye. Li her derê erkên şoreşê hene ku em pêk bînin. Ji ber nebesî û kêmasiyên me hebûn, me ew cudatî dixist nava xwe. Paşê me zanî ku ew feraset şaşe û xusarê dide me. Di vê diyardeyê de mijar ne Botan an jî Behdînan e, di encam de kesayet in. Ji ber kêmasiyên me bi xwe hebûn, me ew cudabûn dixist nava xwe. Kesayetên weke hevalê Xalid jî hebûn, wan şoreş di kesayeta xwe de didan jiyan kirin. Fermandarên me yên wê demê û hevalê Xalid di van mijaran de bi şiyarî tevdigeriyan. Di çavên xwe de mezin nedikirin, dixwestin çareser bikin.

Em ji Avaşîn derbasî Dolaçinara bûn, wê demê Botan çûbû wir. Me Botan dît. Pirsgirêkên ku dihatin jiyankirin bi me re parve kir. Hêzên ku ji berê de li wir in çawa jê re dibin asteng, çawa wî qebûl nakin, çawa li gor pêwîstiyan nikare tev bigere vedigot. Di rêxistinê de wiha ye; heke bûyî berpirsiyar bihane nayên qebulkirin, pêwîste berpirsiyar lewaziyan derbas bike. Heke bihaneyan li pey hev rêz bike nabe. Di Felsefeya PKK ê de bêjeya nabe nîne, ev jî Rêbertî û şehîdan bi jiyan û pratîka xwe îspat kiriye. Nirxandina PKK wiha ye ku kêmasî ji ber lewaziyên kesayetê tên jiyankirin. Wî ew tişt bi pêkhateya rêxistinê û fermandariyê ve girê dida, xwe di wan kêmasiyan de nedidît. Di asta herî jor ya navenda Partiyê de

cih digirt û kêmasiyên hurgilî jî bi hevalan re parve dikir. Nikarîbû hêza çareseriyê pêş bixe, di encamê de jî bêbawerî pêş dixist. Heke zanebûna min nebe, ezê bêjim ev di navenda Partiyê de cih digire û bi ser min de digirî, gazincan dike. Ez weke şervanekî nikarim du tiştan ji hev derxim, ezê çi bikim. Pişt re hinek însanên wiha derketin holê. Hinek ji wan nû tevlê bûbûn, lewaz bûn piçek zehmetî dîtin, lêdan çûn bêhna xwe li gel dijmin vedan.

Em demekê li wir man, ketin nava bendewariyê, em li navendê aliqî man. Emê çawa biçin kengî biçin? Kî dê bi me re bibe alîkar, em dê bi kê re biçin, ne diyar bû. Di nava hevalan de minaqeşe pêş ket. Hevalê Xalid jî ew tişt dîtin. Xwest coşa hevalan bilind bike, yek bi yek bi hevalan re dida û distand. Taybetmendiyeke din a vî hevalî jî ev bû. Taxim bi taxim civîn çêkir û dixwest di civînan de encam bigire, da ku em bikevin rê û biçin cihê xwe. Hêzek heke di rê de be rewşa wê cuda ye. Weke hêzeke xwecihî nîne. Di nava nediyariyeke wiha de heke mirov pêşiya xwe nebîne, xumamî hebe, derûniya mirov jî dikeve. Hevalê Xalid dixwest wê rewşê biguhere. Hewildanên wî yên berbiçav hebûn. Paşê biryar derket ku em bi tabura hereketlî re hereket bikin rêvereberî jî Botan bû lê fermandarê taburê Eşrefê Marufî bû. Ew beriya me bi hefteyekê çûne Çarçela, em jî dê biçin Çarçela û li wir jî bimînin. Li wir Botan dixwest lasayî (taqlît) eyaleta Botanê bike. Eyaleta Botanê wê demê hereketa alay dikir. Em li Gabarê rê diketin heta Geliyê Tirşkê, me dijmin nedidît. Me 100-200 hevalî bi hev re hereket dikir, vê yekê bi xwe re hem rihetî hem jî bi xwe bawerbûnê dianî. Pêwîst bû afirênerî

hebûya lê tine bû, lê ji ber ku teqlîd bû ji afrîneriyê dûr bû.

Di demsala havînê de em dê derbasî Çarçela bibûna, di rê de me pirsgirêk jiyan dikirin. Ez niha têgihîştim ku Botan wisa dikir ku rê li ber cudatiyê di navbera eyaleta Botan û Zaxrosê de vedikir. Ez di vê mijarê de qanih bûme. Ji ber di şêwaz û usluba xwe de di çûna ser hevalan de wisa li hevalan kiriye ku nefretê ji eyaleta Botanê bikin. Ji ber wê yekê ji bo em biçin Çarçela me rêzan peyda nedikirin. Paşê ji me re rêzan hat û em derbasî herema Herkî, gundê Bêdewa bûn. Li wir me komek heval di pêşiya xwe de şand Deriyê Keran, jixwe nav li ser e deriyê Keran. Ji ber hinde asê, zehmet û bêkeys e, gundiyan gotiye: "kî di wir re biçe Ker e." Di encama wate dayineke wisa de, navê vê derê bûye deriyê Keran. Girê Qereqola Bêzelê jî nêzikî deriyê Keran e, heke dijmin wê derê bigire derbasbûna me zehmet dibe. Li gel me du hevalên rêzan hebûn yek ji wan li gel mangeyeke hevalan çû deriyê Keran, yê din jî li gel me ma. Dema em diçin deriyê Keran berf dibare, demsal jî havine, kesî pêşbîniya barîna berfê nedikir. Hevalan bi bêsîmê peyvendî bi me re danîn û gotin: "li vir berf û bahoze, heta bixwazî serma heye. Kêm maye heval ji sarma re şehîd bikevin." Hat dîtin ku rewş nebaş e, ji hevalan re hate gotin ku xwe berdin jêr û di heman kêliyê de hevalan jî xwe berda jêr. Di nîvê rê de yekîne û hevalên ku di pêş de çûbûn gihiştinn hev, em bi hev re paşve vegeriyan. Em hatin gundekî Herkiyan, ew gund jî tijî bû, wê şevê em li wir man. Gundiyan ji me re xorak anîn, mayina me ya wê derê ji bo me baş bû. Ji ber ku xorakê me kêm bû. Ji derveyî wî xorakê 2-3 roja jî me li gel gundiyan peyda kir. Bi bûyina sibê

re em rabûn û ketin rê. Ji ber berf hatibû, erd şil û sist bûbû, pişt nîvroj em gihiştin bin derî. Ji xwe di pêşiya me de mangeyeke din a hevalan çû bû. Derî pir asê, bilind û dîk e. Heke mirov serê xwe 90 derece bilind bike, dikare serê derî bibîne. Em hatin dolekê li ser kevirekî mezin sekinin, wê demê li ser herêmekê Sadûnê Zer disekinî. (jê re tê gotin Sarı Osman, li gel tasfiyekaran reviya çû) Sadûn got: "bila hevalek bi min re were ezê pêşî biçim derî." Hevalê Xalid jî hevalê Şêxmûs pê re şand. (Ew jî paşê di encama qezayekê de şehîd ket.) Ez wî jî bi bîr tînim. Ji Çinar a Amedê bû. Ji gundê Segelya bû. Hevalekî ciwan bû. Em jî li ser kevir in. Di navberê re 15-20 xulek derbas bû, me dengê gurminiyekê bihîst, bi hatina deng re me dora xwe meyzand ku tahteke mezin di bin lingê wan de leqiyaye û bi ser me de tê. Berf hetiye erd şil û nerm bûye, dema heval jî diçin kevir dilive û bi ser me de tê. Em jî lê dinêrin û di cihê xwe de tevizîn. Me nedizanî ka em çi bikin. Di wê kêliyê de nişka ve zêrevan qîr kir. weke ku em ji xew şiyar bibin, ser xwe de hatin her hevalek di hêla xwe de belav bû. Ez, zêrevan û hevaleke din, mecal nema em birevin. Ew kevirê ku em li ser bûn, jêra wî jî nêzikî deh metre kendalekî bilind hebû. Em çûn jêra kevir ser kendalê re sekinîn. Di wê kêliyê de me mirina xwe bi çavên xwe dît. Jiyana me weke şerîda filîmekê di ber çavên me re derbas bû. Me her sê hevalan hevdû hemêz kir. Me got êdî temam bû, em mirin. Kevirê ku ji jor ve dihat, hat li kevirê ku em li ser rûniştî bûn ket û parçe bû. Kevir dema ji jor de gêr bû hat, her ku çû leza wî zêde bû. Her ku leza wî jî zêde bû, rabûn û ketina wî cihekê heta cihekê din firehtir dibe. Her

parçeyekî wî kevirî di milekî me re derbas bû. Wê çaxê zêrevan got: “temam êdî nema em dimirin.” Heval jî li me dinêrin lê tiştek ji destê wan nayê. Hevalan nedizanî bigirîn, qîr bikin, xwe bavêjin pêşiya kevir. Paşê heval hemû hatin dora me û me hevdû hemêz kir. Ji ber mecal nebû em çekên xwe bi xwe re bibin, kevir li çekekê ket, parçeyê çekê yê herî ber bi çav qontaxa wî bû lê ew jî bûbû sê parçe. Hevalekî henek kir û got: “lingê Sadûn ne yê xêrê ye di pêşiya me de çû û ji me re ev kevir şand.” Hevalekî jî got: “hê em neçûne ser derî wiha kir, heke em çûn wî rexî derî, gelo dê çi bîne serê me?” Ji ber nêzikbûnên şaş bi me re hin guman çêbûbûn. Lewre dema em ketin rê hevalan digot: “gelo çiqas bi tendûrist emê bigîjin cihê xwe.” Dema ew bûyer bi ser me de hat, guman û hîsê hevalan di wî warî de hîn bêhtir zêde bûn. Hevalan digot: “hema em bi saxî ji vir bifilitin başe.”

Li Çarçela, li gel zehmetiyên bejahiyê gelek tiştên xwe yên xweş jî hene. Xwezaya Çarçela cûdaye di nava erdnîgariya wê de sekneke xwe ya taybet heye. Çarçela zahf bi heybet e. Ji heybete Çarçela re hem di mirov de tirs çêdibe hem jî wêrekî. Mirov ji xwe re dibêje, bila dijmin bi sed hazaran were, bê minete. Ji xwe bawerbûneke wiha di mirov de çêdike. Dema mirov digihêje derî, li ser destê rastê goleka avê tê ber çavê mirov ku tarîfkirina wê pir zahmete. Mirov qet bawer nake k udi bilindayiyeke wiha mezin de golek heye ku şîn dike. Der û dora wê tev giya û gulîlk in, bi qasî ku bixwezî xweşik e. Zahmetiyên ku li wê derê tên kişandin, zû dide ji bîr kirin. Li Çarçela çar çêl hene, navê Çarçela jî ji wê tê. Çar çêl wek tiliyên desta ji dûr ve xwe nîşanî gerîla dide. Bejahiya wê

derê jî zozan e, sarma wê jî heye û em hîna neelimî bûn zozanan. Hevalên ku li wê qadê mane elimî ne. Hemûyan tedbîrên xwe girtine. Em weke yekîne di demsala havînê de çûne, tiştekî me tune ye. Hebe nebe kefiyeke me heye. Ber êvaran her ku diçe sarma zêde dibe. Hevalê Xalid ji rêzanan re got: “heke li pêşiya me cihê sekinandinê hebe, em bisekinin.” Rêzanan jî got: “cihek heye.” Ew cî jî li ser gundekî re ye, bi navê noqta bayê tê nasîn, carna heval li wir disekinin. Li noqta bayê me şîva xwe hazir kir xwarina xwe xwar. Me dixwest şev jî li wir bimînin, ji ber em westiya ne û me bi roj jî hereket kiri ye. Dema mirov bi roj dimeşe, şev jî bêhna xwe berdide ku karibe dîsa bimeşe. Ji me re ferman hat û gotin: “çi dibe bila bibe divê hûn îşev xwe bigihînin me.” Yê ku ferman jî da, Botan bû. Hevalan gotin heke wisa ye, rêzanê me hene û rê nas dikin, ka em rabin biçin. Bi çav meyzandinê re rê nêzik dixuyê lê bi meş pir dûr e. Wê şevê me rê xelas nekir, li pêşiya me heval hebûn, di saet dehê de em gihiştin wan hevalan. Ji wê derê agahî hat şandin û hat gotin ku em nema dikarin werin, heval westiyan e. Heval du rojan li ser hev meşiyane, lingên wan teqiyane. Heke operasyonek derkeve, heval dê nikaribin bersiv bidin. Guncaw hat dîtin û em li gel hevalan man. Xorakê hevalan hebû, ji me re xwarin hazir kirin. Di wî warî de wan hevalan fedakarî kirin. Hevalan torbek ar dan me ku em ji xwe re bikin nan. Pezek jî ser jêkirin û xistin nava berfê ku dema em çûn bi xwe re bibin. Li wê derê me heta êvarê bêhna xwe veda. Êvarê jî em ketin rê û em hatin. Em bi vî awayî gihiştin tabûrê. Li wê derê jî operasyon derketiye, hevalan pêşî girtine û lê dane. Operasyon hinekî paş ve

kişiyaye. Operasyon dîsa dê derkeve. Hevalê Sekvan jî di operasyonê de birîndar bûye. Haya me ji wan tiştan tune ye, paşê em pê dihesiyan. Em li cihekî ser geliyê Doska bûn, li wê derê jî cerdevan hene. Bi sepandina dijmin re neçar mane çek hildane lê welatparêz in. Em jî nizanin, ji ber ku em di derbarê qadê de ti agahiyan nizanin. Dema hêzeke nû diçe qadekê, agahiyên ku dest de hene bi wan re têne parve kirin. Ev jî usuleke gerîlaye lê belê tiştekî wisa nehat kirin. Tenê du hevalên rêzan li gel me hene. Botan hat pêşwaziya me kir, civîneke piçûk jî li darxist. Qala zahmetiyên qadê û operasyonê kir. Xwest em şiyar bin. Goştê ku me bi xwe re anî bû hevalan hûr kirin û danîn ser agir. Ji xwe em li zozanan bûn, dar nebûn, me bi qirşikan goşt pijand. Em ketin bêhn vedanê û razan. Bi carekê de zêrevan em şiyar kirin û got rabin, operasyon derketiye. Li aliyekî me pevçûn derketiye, aliyê din jî pêwîste em zû xwe bigihînin ser giran da ku nekevin dorpêça dijmin. Cihê ku bihata girtin, deriyê dêrsatê û Keran e. Dîsa em ê vegerin deriyê ku em tê re hatine. Di saetên nîvroj de me xwe da ser hev û em çûn. Hevalê Hesen Didêrî (Beriya çend rojan min şahadeta wî bihîst, li cihekî di encama qrîza dil de jiyana xwe ji dest dide, bi rêzdarî wî jî bibîr tînim, hevalekî hêja bû.) bi me re bû. Da pêşiya me û em çûn deriyê Dêrsatê. Em deriyê Dêrsatê nas nakin, du gund hebûn û cerdevanin, derî jî li cihekî stratejîk e. Heke ew der bikeve destê dijmin ji bo me baş nabe. Deriyê Keran jî her wisa ye. Em çûn nêzikî derî, Botan got: Em ê bêtêlê vekin, vekirina Bêtêlê û dengê çekan bû yek. Dijmin berî me ket derî, di wê rewşê de hate gotin ku divê em derî bigirin. Ez, Dijwar û hevalê Xalid wilo

em bûn komek. Em dê biçin derî me çiqasî ji hevalê Xalid re got tu li paş bimîne, bo karibî hevalan rêk bixî lê wî her xwe dida pêş. Cihê me nexweşbû me dixwest em bikevin pêşiya koma din lê dijmin nedihişt em pêş de biçin. Botan jî li jêra me bû lewma hemû giraniya şer kete ser me. Car caran me hevalê Xalid dida paş, lê ew dîsa dihate pêşiya me. Aliyê wêrekî, coş û berpirsiyariyê di hevalê Xalid de pir li pêş bû, ew taybetmendî li wê derê dihatin dîtin. Dema me ew tişt dîtin ruhekî bilind di me de jî pêşket. Lewre em tiştekî nefikirîn, me digot heke tiştek jî bibe bila beriya wî hevalî bi serê me de bê. Bi haleteke ruhî ya wisa em diçûn ser dijmin. Pişt re hat hînbûn ku bi dîtina me re, dijmin bala xwe dabû ser me û ji lewre hevalên din karîn ji milê din re li dijmin bizîvirin. Ew rewşa ku em têdebûn ji hevalan re bûbû awantaj, em neçûn me derî negirt lê hevalên din çûn derî girtin. Piştî ku derî hate girtin em rihet bûn. Lê belê ji ber dijmin giraniya xwe zaf da ser derî, hevalan nekarîn xwe li wir bi cih bikin. Ew taximek hevalên ku derî ji destê dijmin derxistin, bi neçarî derî berdan û bi milê din ve çûn û ji me qut bûn.

Li wir hevalê Çekdar hebû, gazî bû, milekî wî tune bû. Bi me re di nava rêwîtiyê de bû, hevalan zaf hewil dan ku wî vegerînin lê di encam de nekarîn qanih bikin. Digot: “ev hevalan biçin kuderê ez jî bi wan re me, misoger biryara xwe bi vî rengî dabû. Ji navçeya Amed Pasûrê bû. Hevalekî ciwan bû. Di encama teqîna mayinê de birîndar bûbû. Neçûbû bijîşkên bajaran, bi derfetên çiyê hevalan ew derman kiribû. Bijîşk Sadik hebû ji bajarê Qamişlo, li Besta jê re derfetek piçûk çêkiribûn, wî destê hevalê Çekdar derman kiribû. Me

çiqas jê re digot jî wî hevalî hertim dixwest di nava şer de bimîne. Hevalekî xwedî huner e û cixare jî dikişand me bi du destan nedikarî cixarê bipêçin lê wî hevalî bi destekî cixare dipêça. Bi vî halê xwe çek jî xweş bi kar dianî.

Ew heval di wê taximê de bû, diçin gir û gir digirin. Dema dijmin wan zêde tengav dike, xwe ji gir berdidin jêr. Dema xwe bera jêr jî didin, berf heye, ji ber Çarçela jî berfa wê tu car xelas nabe. Aliyekî berfe, aliyekî jî şînatî ye. Ew heval dema xwe bera jêr dide, nikare tam hevsengiyê çêbike, li ser berfê digindire diçe jêr, dema heval dibînin ku ew çû hevalên din jî li pey wî xwe berdidin ku xwe bigînin wî. Tiştek pir zêde jê nehatibû jixwe ew bûyer jî bûbû sedem ku heval zû ji qada pevçûnê dûr bikevin. Heke wisa nebûba renge yek du heval di pevçûnê de şehîd jî biketana.

Taxima me ya din jî em bi hevalê Xalid re man, Botan jî ferman da û got: “vegerin.” Em jî vegeriyan. Dijmin jî tam bi cih bûbû, em ketin bin bandora dijmin û dijmin jî suîkast dikir, ji aliyekî ve jî helîkopterên şer dihatin. Li eyaleta Botanê ew du sal bûn helîkopterên şer dihatin xebitandin. Lê li eyaleta Zaxrosê helîkopter nû dihatin xebitandin. Lewre pîlotên helîkopteran xwedî ezmûn nebûn. Ew jî me çawa dizanî? Ji hedef girtin û lêdana wan ve me tê derdixist ku nezanin em didîtin serê xwe dixistin nava serê me jî lê dîsa nedikarîn bi îsabet li me bidin. Di şer de wiha ye heke tiştekî pir jiyan bikî, têde dibî pispor. Wexta roket ji hêlîna xwe derdiket, me dizanî dê li kuderê bikeve, me dizanî dê li me bikeve an kêleka me. Lewre di wê kêliyê de me dikarî em tedbîrên xwe bigirin. Ji aliyekî ve hawan dihatin avêtin, ji

aliyekî ve helîkopteran li me dida û ji aliyekî ve jî suîkast li me dihat kirin. Lê belê bi wî awayî me xwe gihand koma me ya jêrê. Di wê wextê de tu nabêjî Botan komek heval şandiye deriyê Keran, ji me re jî got: "hûn jî li pey wan biçin." Em jî li pey wan çûn û ketin nava mêrgê, dolek heye di bin dolê de bejahî dibe weke deştê, deşt rûte û hemû jî sîrik e. Em jî ji aliyekî ve westiyane aliyekî ve birçî bûne, di heman demê de jî em direviyan. Di revê de jî me dest davêt sîrikê, jê dikir û dixwar piçek be jî me bi xwarina wê sîrikê birçîbûna xwe derbas kir. Em çûn bin neqebekê, hinek hevalên ku çûbûn derî vegeriyan. Hevalan gotin: "derî ji aliyê dijmin ve hatiye girtin." Piştî ku gotin derî girtine, ew hestên şikandinê bi me re çêbûn. Me got: "heke derî hatibe girtin, xelas, em bejahiyê jî nas nakin. Em ketin dorpêçê, êdî em ê tine bibin." Botan ket pêşiya me û got: "bikevin pey min û cot-cot bi mesafe werin." Em dîsa ketin wê deştê helîkopter çûbûn lê dijmin li ser serê me bû û suîkast dikir. Dem jî êvar bû, tarîtî ketibû erdê hema di wê navberê de, em hem dibeziyan hem jî me xwe ji hawan û suîkastê diparast. Avêtina hawanan ji ber xwe bû, pir bi îsabet nebû em hatin cihekî hawanek li nêzikî hevalê Xalid dikeve, hevalê Xalid li wir birîndar bû. Em 15 heval di pêş de bûn, 10 heval jî bi hevalê Xalid re man. Ji me re hate gotin hinek bi lez biçin ji hevalên ku li pêşdetirin re bêjin hevalê Xalid birîndar bûye. Ez û du hevalên din em di pêş de çûn, em gihiştin wan hevalan û êdî bû êvar. Em man benda hevalan lê kes nehat, saet bûbû 10'ê şev hîna jî kes nehatibû. Bi me re dudilî û reşbînî çêbû me got gelo çi bi hevalan hat, gelo heval şehîd ket, tiştek bi hevalên din hat? Saet bû yekê şev deng

hatin guhê me paşê me dît ku yek ji wan zêrevan e, yek jî fermandarê taxima me bû. Hevalan gotin: “me pir hewil daye da ku hevalê Xalid bînin.” Hevalê Xalid jî gotiye: “an hûnê min li vir binixumînin an jî ez ê fîşekekê li serê xwe bidim û xwe bikujim.” Gotiye: “hûnê bi min re mijûl nebin.” Heval di vê astê de nêzik bûbû dizanibû operasyoneke berfireh heye. Ew jî ji lingê xwe ve birîndar e, dizanibû ku bejahî jî sexte û zehmetiyên wê hene. Heke heval pê re bimînin ew dê şehîd bikeve û hevalên ku pê re bin jî dê şehîd bikevin. Heval difikire û ji xwe re debêje, heke rewşa şehîdbûnê hebe bila ez tenê şehîd bikevim, dîsa dibêje, heke ez tenê bim dibe xwe xelaskirina min rihetir be. Heval nanekî du nanan û du bombeyan didin gel wî û wî di bin bin tahtekê de bi cih dikin. Paşê jî heval hatin û ji xwe ew tiştana ji me re vegotin. Em hevalên li wê derê bûn me nerazîbûna xwe da nişandan, me got nedibû we heval li wir bihîşta. We çawa biryarekî wisa daye. Ew hevalên ku birîndar hiştibûn ketin tengasiyê. Ji ber bandora hevalê Xalid li ser hevalan cuda bû, wisa li me hat weke ku em sêwî mabûn. Weke ku di malekê de dê an jî bav miribe, di ji xwe bawerbûna me de şikestinek çêbû. Hemû heval bi wan hestan xemgîn bûn. Saet bûye 3 yê şevê nû em gihîştin tabûrê.

Me nizanîbû em dê biçin kuderê, li pêşiya me çi heye çi nîne nedihat zanîn, weke ku mirov çavên xwe bigire û bimeşe li me hatibû. Em gihîştin cihekî û sekinin, saet der û dora çar-çar û nîva ye. Hîn ronahî hilnehatibû, tarîbûn li erdê bû. Hevalê Sekvan ku birîndar bûbû, li tabûrê fermandarê taximê bû, bi eslê xwe ji gundê Gundikremo bû.

Hevalê Hesen fermandarê tabûrê ji Eşref re dibêjê: “heval ji destê xwe ve birîndar bûye û xwîn jê zaf çûye, di meşê de zehmetiyê dikişîne. Ez vir kun bi kun nas dikim cihê veşartinê hene ‘hevalê Hesen jî te digo qey hemû temenê xwe li Çarçela derbas kiriye, arazî kun bi kun nas dikir’ ez dikarim vî hevalî li vir veşêrim bêyî ku tiştek bi ser de were.” Eşref jî wek qabadayiyekî dibêje: “em tabûrek heval in çawa nikarin hevalekî birîndar xelas bikin. Heke em nikarin hevalekî xelas bikin bila nizanim çi ji me bê.” Ew bi vê hişmendiyê nêzik dibe. Hevalê Hesen dibêje: “temam vaye min ji te re got niha derfet heye û ez dikarim heval saxlem bikim ango veşêrim.” Paşê em hatin gund hevalê Hesen Pêşengê me bû. Li weregozê hevalê Hesen li ser pirê derbasî aliyê din dibe, diçe wir lê dinêre kemîn heye. Êvarê 8 maşîn tên her yek ji wan 15 leşkeran hildigre, zêdetirî sed leşkeran di gund de xefik tê danîn. Xefika mezin jî heye, xefik qonax bi qonax hatibû danîn. Hevalê Hesen vedigere gel Botan û dibêje: “misogere li pêşiya me xefik heye.” Em hevalên ku di dawiya yekîneyê de dimeşiyan haya me ji vê yekê nebû. Hema di wê kêliyê de Eşref ji hevalê Hesen re dibêje: “zû here hevalê Sekvan veşêre û were em ê paşê biçin.” Hevalê Hesen ji ber vê helwesta neyînî şaş dimîne. Wê şevê li wê derê dikevin şer, hevalê Hesen dibêje: “di dema pêwîst û li cihê ku derfet hebû de min veşartiba ne baştir bû? A niha di nava vî gundî de di nava vê qiyametê de ez ê çawa heval veşêrim?” Di wir de dikevin nava gengeşiyê ji hevalê Hesen re ferman tê dayîn û tê gotin tu yê heval bibî û veşêrî. Di wir de derfeta ku heval bê veşartin jî tine ye, bejahiyeke rût e. Li cihekî çend kevir û gunî

hene, heval dibe datîne wir û tê.

Paşê Botan dibêje em ê li xefikê bixin û biçin, ji me re jî ferman hat ku em bikevin rê û biçin. Xefik heye tine ye em nizanin, em qasekê çûn. Leşker di cihê xwe de razayî ne, lê dema em derbas bûn yek ji wan şiyar dibe û di mesafeya hemêzkirinê de rasta hevalekî tê. Hevalê me hema çek dixe zikê wî û gule ber dide. Dema gule jî ber dide leşker destê xwe diavêje lûleya çeka wî, ew heval dike nake nikare çeka xwe di destê wî xelas bike. Leşker jî ji ber birîndare û li ber mirinê ye hemû hêza xwe dide xebitandin. Heval çeka xwe di destê leşker de berdide û paş ve diçe. Dengê teqîna çekan hat ber guhê me jî lê me nedizanî ka çi bûye. Ferman ji pêş ve ji me re hat û gotin: "paşve vekişin leşker heye." Botan û komekê bêyî ku bikevin pevçûnê, derbas bûn û çûn. Deh hevalên tabûrê û nêzikî çil hevalên yekîneya me, em man. Heval di nava xwe de axivîn û gotin em çi bikin û çi nekin. Hinek hevalan gotin em xwe li avê bidin. Lê av jî baş diherike, li gel baş herikîna avê em neçar bûn xwe lê bidin. Ji ber dijmin bi me hesiyabû me nedikarî em li xefika dijmin bidin. Em rabûn me xwe li avê da. Em bûn sê rêz, ketin milê hevdu û me got em bi vî rengî derbas bibin. Me av derbas kir lê hevalekî me portatîf (bejin kin) di avê de çû. Lê Zêrevan xwe avêt û ew girt, xist nava me de û ew derbas kir. Tu nabêjî Eşref ji du hevalan re (Mustafa Kobanê û Aras Efrîn) dibêje: "çi dibe bila bibe divê hûn herin wan hevalan bînin." Hevalê Mustafa dibêje: "weke ku we jî dît xefik heye me xwe jê xelas kiriye, ew jî li wî milî mane. Heke em niha biçin em nikarin xwe bigînin wan û em ê di nava xefikê de jî bimînin." Eşref jî

dibêje: “divê hûn biçin.” Wê demê jî şer e, pêwîste ferman bi cih were çi şaş be çi jî rast be divê xwe lê bidî biçî. Ew heval jî namerdiyê nakin, herdu didin rê û tên. Me jî av derbas kiriye û ketine palê, em wan dibînin wan bang dikir digotin, Fedakar! Fedakar jî fermandarê mangê bû, ew heval jî wisa dizanin ku tenê Fedakar ma ye. Di wê kêliyê de pevçûnê destpêkir dinya jî bûbû roj, hemû giranî kete ser wan hevalan. Heke bixwestana hîn zêdetir dê em kiribana hedef, lê belê bi hedefbûna hevalan re em xelas bûn. Em çawa xelas bûn? Du-du sê-sê em ji hev belav bûn û em ketin bejahiyê, jixwe em bejahiyê jî nas nakin. Ez û hevalê Huseyin (ji Efrînê bû) hevalek jî ji Dêrsimê hebû bi temen bû (ji Ewropa tevlê dibe di Îranê re tê derbasî herema Şehîdan dibe, paşê tê eyaleta Zaxrosê) em her sê bi hev re man. Em li wan hevalên ku pevçûnê dikin dinerin lê em jî nizanin çi bikin. Em biçin hawara wan gelo rast dibe? An em biçin xwe bigînin tabûrê baştire. Em di wir de ketin dudiliyê, hevalan got em biçin xwe bigînin tabûrê. Me wisa nirxand ku hevalan xwe kirin hedef ku em xelas bibin. Me bi vî rengî şîrove kir. Em ji wî cihî derketin û çûn ser palekê, ti cihî jî nas nakin. Pevçûn sekinî û li gorî me paşê bihîst, hevalê Aras di gund de şehîd dikeve. Hevalê Mustafa jî xelas dibe û derbasî vî milî dibe. Li gel me ne bêtêl heye, ne bi hevalan re peyvendî heye, ne jî em bejahiyê nas dikin. Em nizanin kesên ku li hevalan didin leşkerin an cerdevan in. Em ji xwe re dibêjin yên ku kemîn danîne cerdevan in, wan pevçûn kiriye û li hevalan daye. Em îhtîmala hatina leşkeran danaynin, lewre em xwe ji cerdevanan diparêzin. Em li jora gund in, plansaziyan çêdikin

ku xwe bigihînin hevalan. Ji ber ku ew cara yekeme em ji hevalan qut dibin. Çiyayek ji me ve xuyaye hevalekî jî got ez carekê di wir re hatime. Me jî got em xwe bigihînin wir em ê paşê biçin Şehîdan. Carekê me dît leşker ji gund bi cemse û qamyonan derketin û çûne jor. Paşê hat jêra me sekini, qaydeya hawanan danîn, çiyayên jor dane ber hawanan. Ji ber operasyon dê jor ber bi jêr ve were, ew der dane ber roketan zêdetirî sed hawanî avêtin. Ji wan ve ye koma ku qut bûye xwe daye jor û çûye. Lê belê em di bejahiyê de belav bûbûn, me xwe di palan de veşartiye. Heke em qîr bikin renge dengê me biçe hevdu, ber êvarê êdî me dît operasyon hat û hemû derbas bû. Di operasyonê de der û dora sê hezar leşkerî hebûn. Sê saetan leşker bi meş kişiyan lê hîna jî xelas nedibûn, meşa leşkeran jî pir giran e. Leşkeran dawî li operasyonê anîn û kişiyan çûn. Me jî riya xwe diyar kir û me dê şev lê daba em ê çûbana. Di Kêliya ku em ê rabana û çûbana helîkopteran li pêşiya me leşker danîn. Dema leşker danîn me jî plansaziya xwe guhert, me got em çi bikin û çi nekin, di dawiyê de me biryar da ku em di bejahiyê de bimînin. Dema roj bû me şivanek keşif kiribû, me gotibû divê em bi rengekî xwe bigihînin wî şivanî, herî kêm em hinek agahiyan jê werbigirin ka ew qewimîn çi ne. Yan jî em bizanin ka gundî dikarin alîkariya me bikin an na. Du rojan em di bejahiyê de man. Di roja 3. de Şivan hate jêra me ser kanîyê. Em bi dizîka çûn heta gel şivan û ji nişka ve me xwe avêtê, şivan tirsiya nedizanî çi bi ser de hat. Şivan mirovekî welatparêz bû. Ji Silopya hatiye wir şivantiyê dike. Dema me yekî ji Botanê li wir dît, deriyê hêviyê li me fireh bû, yekî ji Botanê ji Silopya ye li vê derê

rastî me hat, wî hêviyên me hîn xurttir kirin. Şivanî li wir de agahî dane me. Got komeke din ên hevalên we jî li vir e, ez ji wan re xwarinê dibim. Me got: “li ku ne?” wî got: “aha li vir in.” Şivan rabû em birin gel sê hevalên din ku ji yekîneya me ne. Paşê şivan hevalê Mustafa jî dîtibû û ew jî anî gel me. Tişta baş ew e ku bêtêl pê re hebû, wexta ku avê derbas dike, bêtêl bi bateriyan ve dikeve avê lê heval bi lez ji nava avê derdixîne. Bêtêl bi vî awayî xera dibe û em jî jê fam nakin ku çêkin. Famkirina me ji bêtêlê ew bû ku tenê em dikarin frekans qeyd bikin û reş bikin. Me dikarî em guhdarî bikin lê me nekarî em pê biaxivin, dema me pêçiya xwe dida ser bişkoka bêtêlê jimar dihatin guhertin.

Wî hevalî agahiyên ku li ser hevalê Sekvan hene dan me, dijmin tê ser destpêkê birîna wî derman dike. Agahî ji Osman Pamukoglu re tê dandin û tê gotin me ew pansuman kiriye lê agahiyê ku em dixwazin, nikarin jê bigirin. Osman Pamukoglu jî ferman daye û gotiye: “îcabina bakin.” Dema wisa dibêje wî hevalî li wir şehîd dixin. Di van salên dawiyê de Orhan Pamukoglu di bernameyeke televîzyonê de derketibû û digot em baş nêzikî birîndaran dibin. Hevalan jî wê wextê pirsa çarenûsa hevalê Sekvan ji wan kir, şêwazê şehîd xistina wî hevalî bi bîr xistin. Ji xwe em dizanin artêş, dewlet û deshelata tirk çi tîne serê birîndar, şehîd û girtiyan. Li gel ku ewqas hovin di televîzyonan de jî xwe bi rengekî din didin nîşandan.

Koma me em bûn nêzikî deh hevalan, li wir duserîtî bi me re derket em çend heval ên tabûrê bûn, çend heval jî ên yekîneyê bûn. Hinek hevalan digotin em li vir bin, hinek

hevalan jî digotin em derbasî Başûr bibin û xwe bigînin hevalan, hinek hevalan jî digotin em tabûrê bişopînin. Lê tabûr wendaye û em nikarin bişopînin.

Botan çi kiriye? Di heman rojê de çûye nêzikî Cîlo li wir di gundekî de bi cih bûye û 3-4 rojan derneketiye xwe wenda kiri ye. Dijmin çawa difikire? Ji jor ve operasyon kir û tiştek nedît, dibêjin misoger ew çûne Cîlo, ew operasyon bi vî awayî hemû çû ser Cîlo. Piştî wan sê rojan Çarçela paqij bû tiştek lê nema, me jî biryar da ku em biçin cihekî ku hem li ser Başûr hem jî li ser gund çavdêriyê bikin. Wê demê de hevalek ji yekîneya me (Ji Çiravê ji gundekî cerdevanan tevlê bûbû, kete du diliyê, ew zehmetiyên ku hatin kişandin ranekirin.) radibe diçe xwe radestî cerdevanên gund dike. Cerdevan hatin agahî dane me, gotin: “ew dibêje min radestî dewletê bikin niha jî li cem me ye, em çi jê bikin?” Me got: “heke hûn bi saxlemî bikaribin bigînin destê me bînin. Eger hûn nikarin, wî radestî leşkeran nekin li cihekî veşêrin, bihêlin paşê heke ew bûyer hinek safî bû em ê werin wî bigirin.” Me wisa bi cerdevanan re li hev kir. Welatparêziya cerdevanan jî piştî dîtina şivanî me fam kir. Cerdevan çûn weke ku hat axaftin kirin, du rojan li cem xwe vedişêrin. Paşê ew derfetekê dibîne lê dide direve diçe xwe radestî dijmin dike. Em jî derketin çûn jorê, me biryar daye ku em pêşiya xwe keşif bikin, gav bi gav biçin. Şivanî hema li wir du pez ser jê kir, goşt xiste kîsan û me bar li ser hevalan parve kir, her wiha şivanî ji me re ar jî anî bû, rûnê nivişk anî bû, Şekir û hwd anîbû. Xorak têra me ya hefteyekê hebû û zêdetir jî jixwe me nedikarî hilgirin. Em di vê navberê de bêtêlê jî guhdarî dikin, heval bi hev re

diaxivin û dibêjin werin noqteya roviyan lê em nizanin noqteya roviyan li ku derê ye.

Êvarekê hevalek zêrevan e, hevalê Hemze bi eslê xwe ji Agirî ye, me dît ku bang li me dike û dibêje werin em çûn me got: “xêre” wî got: “ji jor ve yekî bi çargavî xwe berda jêr, aha di bin wî kevirî de ye.” Me got: “ma çawa bû!” Wî got: “dibe ku heval be.” Me got: “renge dînê van gundan be.” Me ji xwe re nekir xem. Paşê me dît berêvarkî gundiyek hat heta ku cihê berê zêrevan mirovek lê dîtibû, ew jî li heman cihî bû. Em şaş man me got: “hebe nebe tiştek heye.” Ji ber hewa tarî bû me pir zelal nekir, bû sibe dîsa camêrekî tiştek di dest de hat û li heman noqteyê wenda bû. Êdî me xwe qanih kir ku ew heval e. Hatiye xwe li wir veşartiye, me îhtîmal jî danî û got: “renge hevalê Xalid be.” Ew hîs kete dilê me. Bi taybet jî Zêrevan, wî îsrar kir got ew e. Êvarê yek bi yek me xwe berda wexta hevalê Xalid me ji dûr ve dibîne pir şa dibe, me jî xwe li avê da em çûne gel wî. Hevalê Xalid hema xwe avête me û me hevdu hemêz kir. Paşê hemû serpêhatiyên xwe ji me re vegot, dîsa got: “başe we bi ya min kir, nexwe ne ez sax dimam ne jî hevalên ku bi min re mabana.” Bi wî halê xwe henek jî dikirin û digot: “carê heke min ferman da we bi ya min bikin.”

Di wir de dîsa plansazî hat çêkirin ku em bi saxlemî bigihêjin hevalan. Gundiyê gundê Warêgozê jî hatin gel me ku êdî baweriya xwe bi me dianîn. Gund xeta hevalan bû û diçûn û dihatin, me jî wisa biryar da ku zêrevan li gel gundî bimîne wî hildin saxlemiyê. Em jî biçin Başûr û hevalan agahdar bikin da ku heval jî karibin hevalên birîndar rabikin. Gundiyê

ku hevalê Xalid pê re peyvendî daniye, xeta hevalan a Şehîdan jî nas dike. Gundî soz dabû ku heke heval neyên ew ê hevalê Xalid bi saxlemî bigihîne hevalên Şehîdan. Me ew li wê derê hişt kêliyên hestyar hatin jiyankirin, em çûn û her du heval jî li wê derê man.

Di heman şevê de hevalên din xwe digihînin hevalê Xalid ji wir radikin û derbasî herêma Şehîdan dikin. Ji wir jî dibin Îranê li wir tedawî dibine, paşê diçe akademiyê gel Rêbertiyê û Rêber Apo jî dibîne. Herî dawiyê jî li Metînan şehîd dikeve.

Em ê ti caran îxanetê li riya şehîdan nekin, emê şayenî wan bin. Ji bo xwe bigihînin armanca wan em ê her dem têbikoşin.

## NA SEROKÊ MIN,
## EM JI TE WELAT DIXWAZIN

## Raperîn Nurhaq

Piştî tevlêbûna min a nava şoreşê demeke dirêj derbas bû şûn de, ji aliyê rêxistinê ve ez ji bo Rojava hatim vesazkirin. Amadekarî hebûn ku li Rojava şoreş were destpêkirin. Ji ber ku êdî dema wê hatibû. Pêwîst bû ku em gelê Rojava bi şoreşê xelat bikin. Gelê Rojava weke tê zanîn gelê Rêber Apo ye.

Ji bo şoreşê pêwîstî hebûn ku gel bi giştî, civaka Rojava bê amadekirin. Ji bo vê jî hêzên parastinê rêxistin kirin, hokarê girîng ê şoreşê bû. Ez di sala 2009'an de derbasî Rojava bûm, wê demê li Rojava zexta dewletê pir hebû dewletê pir êrîşî gel dikir. Dewletê heta bixwazî rêbazên faşîzane dida şixulandin.

Dema me lingê xwe avête ser axa Rojava me dît ku di gel de melûlbûnek heye. Zarok li kolanan li ber dar û deriyan li benda pêşengiyê bûn. Ew ciwanên ku di xwepêşandan û serhildanan de qîr dikirin li bendê bûn ku Rêbertî vegere nava wan. Dayîk û bavên ku bi Rêbertiyê re mabûn gelek gazin û giliyên xwe dikirin. Ji ber ku bûyera tasfiyeyê jî hatibû jiyankirin, êşeke giran dikişandin. Dema Rêbertî diçû nava zarokan digot:

-Ka ji zarokan re şekiran bînin.

Zarokan jî digot:

-Na, Serokê min, em ji te welat dixwazin.

Zarokan ji Serok pêlîstok nexwestin, ji Serok welatekî azad xwestin da ku bikaribin bi azadiya xwe bijîn. Zarokên wê demê mezin bûne bûne ciwanên niha û cihê xwe di nav têkoşînê de digirin. Di rewşeke bi vî rengî de ez jî çûm û tevlî xebatan bûm. Xebata min a destpêkê li Efrînê bû, paşê jî ez çûm Reqqayê û min di nava Ereban de kar kir. Di Newroza wê salê de êrîşî Kurdan kirin di encama wan êrîşan de gelek kes birîndar û şehîd bûn. Di rewşekî wiha de min demekê di nava Ereban de kar kir. Bajar, bajarê Ereban bû lê gelê wir qet ji bîra min naçe. Ji ber ku gelek bi Serokatiyê ve girêdayî bûn. Gelê wê derê jî Serokatî dîtibûn. Wî gelî li hemberî dewletê jî gelek li berxwe da, ti carî xiyanet li keda Serokatî û şerwanên Serokatiyê nedikirin.

Paşê pêwîstiya parastinê derket holê, bi vê pêwîstiyê re dest bi damezrandina YPG-YPJ hat kirin.

Ez bi xwe di sala 1991'ê de tevlî nava şoreşê bûm. Bi giştî min xebatên rêxistinî, di nava gel de kir, hîna wê demê

pergala Konfederalîzmê hebû. Avakirina komîn, meclîs, îradekirina gel, derxistina komîte û rêveberiya wê. Wê demê Serokatî nav lê nekiri bû, lê belê xebatên wî meşandibû. Zarok, genc, pîr û kal, jin herkes perwerde dikir.

Dema rejîm ket, cihê wan jî kete destê gel dema me cihê ku êşkence li gel hatiye kirin dît çi tişt nema bû ku li hemberî gel nedabû şixulandin. Ji gel, ji hevalan kesên ku dewletê girtibû, heta niha jî wenda ne. Dewletê hevala Nazmiye di serhildanê de girti bû heta niha jî wenda ye. Çima dewletê jin dikirin hedef? Ji ber ku Serokatî zaf hêz dida jinê, jin weke teyrek bask şikestî bû. Serokatî ew jin rakir, hêz da, wêrekî da, rêxistin kir, bîrdozî da, fêrî siyasetê kir. Sincê nûjen di kesayeta jin de derxist holê. Îro heke bi hezaran jin cihê xwe di nava hêzên parastinê de digirin, diçin serê çiyayan, fermandarî û rêveberiyê dikin, şehît dikevin, bi saya keda Serokatiyê ye. Rêbertiya me hertim di nava kêfxweşî û moral de kar kir têkoşîn da meşandin milîtan û gel perwerde kir. Ji bo vê jî keda Serok Apo nayê înkarkirin, niha jî heke ez weke jinekê diaxivim wêrekiya min heye, ji ber keda Serokatiyê ye.

Li Rojava ez dikarim gelek jinan mînak bidim. Niha jinek heye li Hesekê ciwaneke temenê wê 26-27 salî ye. Ji roja ku Serok hatiye girtin heta niha cilên reş li ber kiriye ji hundir dernakeve xwarinê jî bi rêk û pêk naxwe hertim di şînê de ye. Dibêje ku heta Serok Apo ji girtîgehê dernekevê ez ê azadiyê jiyan nekim. Jineke din jî heye li Dêrîk ê yadê Esma, ji roja ku Rêbertî hatiye girtin heta niha cilên reş li ber dike. Ji ber vê helwesta wê dewletê ew pir êşkence kir. Dayê Esma dayika çend zarokan e, niha jî bi temen pir mezine û dibêje:

-Heta Serok neyê berdan, ez cilên reş ji xwe nakim.

Li Kobanê, dema Serok dîl ket destê neyaran 7-8 jinan xwe şewitandin, ev tişt jî bibelge û îspatin. Loma bi taybet jin ti carî keda Serok ji bîr nakin, îro li Rojava bi berxwedaniyeke mezin jin li Serok û keda wî xwedî derdikevin. Heke îro YPG-YPJ berxwe dide, şer dike bi saya keda Rêbertî û PKK'ê ye.

Di destpêka şoreşê de, dema hêzên leşkerî hatin damezirandin her tişt ewqas hêsanî nebû. Di serî de çekên me pir kêm bûn, cebilxane tine bû, xorak tune bû. Hemû derfet ji nû ve hate afirandin, tu alikarî ji derve de nehat. Gel xwe bi xwe alîkariya hevdu kirin, ji hêzên leşkerî re bûn alîkar, keç û xortên xwe dane şoreşê da ku bikaribin bi rûmet jiyan bikin. Alikarî û piştgiriya derve bi taybet jî a dewletan, bê beramber nîne. Heke dewlet yek tiştî bidin di berdela wî de deh tiştan dixwazin. Lewre bi hêza xwe li ser lingan sekinandin, azadî û xweseriya xwe parastin hîn zêdetir bi nirxetir e. Li gel dorpêçkirina rejîmê û hin dewlet û partiyên Kurdî ewqas pêşketin derketin holê. Dîsa li Rojavayê Kurdistanê kargeh tune bû, dewletê zanebûn pîşesazî Rojava pêşnexistibûn. Lê belê şoreş jî ew e ku li gel hemû bêderfetiyan bi ser dikeve. Beriya şoreşê li herêma Cizîrê gelek mirov ji bo ku bikaribin debara xwe bikin diçûn di Şamê re derketin. Wê demê gelek Kurd bênasname bûn.

Bi giştî û bi taybetî jî herêma Efrînê beriya ku bi tevgera azadiyê bihese me bi çavekî dijmin li dewleta Sûrî nedinihêrî. Di dema şoreşê de dewletê cihên xwe berda û çû me dît ku dewlet çiqas qirêje. Di milê sinc de di nava civakê de me dît ku gencên me çawa têk birine. Di milê dermanên

hişbir şixûlandinê de, di milê meşrûb bikaranînê de, di milê cil û berg li xwe kirinê de, gencên me bi giştî civaka me helandi bûn. Ev tişt jî dihat kirin ku civak ji welatparêziyê dûr bikeve, bi tiştê pûç û vala ve mijûl bibe. Dewletê li ser gel derûniyek dabû avakirin. Ew jî tirsa ji dewletê bû. Dema em çûn me li girtîgehên dewletê nêrî, me dît ku dermanê hişbirinê bikar anîne ku mirovan pê bidin axaftin. Di hundir de pêçke (teker) hebûn mirovên ku hatine girtin dixistin têde û êşkence lê dikirin. Darê feleqe hebûn ji bo êşkence kirinê. Amûrên elektrîk (kareba) hebûn ku elektrîk didan canê mirovan. Cihê ku dewlet mirov xistî têde û dayî jiyankirin dema me dît me ji xwe pirsî, gelo van mirovan çawa li vê derê jiyan kirine. Ji ber ku cihê ku mirov xistibûnê ne ji bo jiyankirinê, ji bo kuştina mirovan bû. Li ser dîwaran hîna jî şopên xwîna mirovan hebûn.

Li Dirbesiyê “ku bajarê herî biçûk e” hevalekî me berê hatibû girtin welatparêzek bû. Dema em bi hev re çûn cihê dewletê, cihekî giştî û binerd bû di heman demê de, cihê saloxgeriyê bû, hevalê me çawa li cihê ku berê weke girtî têde mabû dît, bi dîtinê re ji ser hişê xwe çû. Navê wî hevalî jî Cemîl e, ji Dirbesiyê ye. Di hundir de beşê siyasiyan hebû cihê partiyan bû, me li wir jî temaşe kir. Li wê derê ser dîwaran zaf wêneyê welatparêzan hebûn me pir belge û materyal dîtin. Ji wêneyê hevalan albûm çêkiribûn, wêneyên hevalên ku ji Bakur in, cuda xistibûn albûmê. Wêneyên hevalên ku ji Rojava ne cuda xistibûn albûmê. Ji ber ku rayedarên dewleta Sûrî hevalê ku ji Bakur in radestî dewleta Tirkye dikirin. Li hember hevalan jî ji dewleta tirk dirav

digirtin. Bi vê sedemê gelek rayedarên dewletê têkiliya wan li gel rayedarên dewleta tirk pêş dixist pişt re jî bi hev re tîcaret dikirin. Hev du dewlemend dikirin. Ev tiştên ku em dibêjin tenê li ser Kurdan nedihat kirin, li ser Asûrî-Suryanî, li ser gelê Ereb û yên din jî dihatin kirin. Dewlet bi xwe qirêj bû û her kes jî bi xwe re qirêj dikir. Meşrûbên cur bi cur, CD yên porno, û hwd. me ev tişt hemû di cihên wan de dîtin. Tişta din ya ku me dît birina dewlemendiyên gel bû, di mala berpirsên dewletê de çi bihata xwestin hebû. Çi teknîk nebû ku di mala wan de nebe. Bi muçeyeke dewletê ew mirovan çawa ew qasî dewlemend bûn. Wan davêtin ser malan, çi tiştê wan ê xweşik hebûya ji xwe re dibirin. Di pergala dewletê de bertîlxurî ji xwe heye lê tişta din jî heye ku gel ji dewletê ditirse. Dema dewletê avête ser malan kesî nikarîbû dengê xwe derxe. Her kesî digot, çi dibin bila bibin tenê xusarê nedin canê me, me negirin û êşkenceyê bi me nekin. Li gel şêlandina kesên ku bazirganiyê dikin cûdatir dukandar û hwd jî dihatin şêlandin. Vê jî têra wan nedikir ji hundirê malan jî kel û pel ji xwe re dibirin. Li Rojava weke her parçeyê Kurdistanê, li ser sînor tîcaret tê kirin. Kesên ku vê tîcaretê dikin neçarin li gel berpirsên dewletê têkilî deynin. Dema ev têkilî jî hat danîn rayedarên dewletê ji bazirganan bertîlan dixwin. Heke ji van bazirganan hinek dewlemend bûn mal û milkê wan çêbû. Vê carê jî dewlet bi hin hincetan dest datîne ser milkê wan bazirganan. Lê belê sermaye ango milkê ku heye rayedar dest datînin ser û ji xwe re digirin. Di encama vê kirêtiyê de bazirgan dibe darazxwar, dikeve girtîgehê mal û milkê wî jî ji rayedarên dewletê re dimîne.

Hinek belênder (mutahît) bînayetan datînin, avahiyan lê dikin. Pişt re erkdarên dewletê diçûn bi hincetên bêbingeh, dest datanîn ser û belênder jî diavêtin girtîgehê. Di destpêkê de destwerdan nedihat kirin, piştî ku kar xelas bû şûn de, destwerdan dikirin. Dîsa di bin navê dewletê de, hêzên cuda hene, van jî li hemberî hev û dû bi dizîka bêrêtî dikirin. Dewleta ku li ser axa Rojavayê Kurdistanê hat qewitandin bi vî rengî bû.

Piştî ku li Rojava hinek hêza me çêbû giyaneke nû derkete holê, li Efrînê cara yekê 30 hezar mirov meşiyan, li Cizîrê jî weke lehiyeke ji mirovan gel herikî û meşiya. Li Kobanê her wisa jixwe Kobanê, pêştir di 12 Adara 2004'an de bersiveke baş dabû dewletê. Kîn û êrîşên ku li ser Kobanê çêdibin, ji ber rabûna Kobanê ya 12'ê Adar'ê ye. Wê demê gelê Kobanê dîwarê Polîsxane bi ser wan de rûxandin. Hîna wê demê dewletê li hemberî berxwedana Kobaniyan, cihê xwe berdabû û çûbû. Gelê Kobanê, zaf wêreke û fedakar e. Min bi xwe raste rast di nava wî gelî de xebat kiriye û ez wan ji nêzik ve nas dikim. Dema Serokatiyê jî hat girtin yê ku bersiva wê dan Kobanî bûn. Ji ber ku di sala 1979'an de dema Rêber Apo derbasî Rojava bû, yekem car çû Kobanê. Lewre jî Kobanê warê Rêber Apo ye, himbêza xwe jê re vekiriye. Kobanê di heman demê de ji aliyê erdnîgarî ve jî cihekî stratejîk e. Kobanê cihê ku destpêkê li Rojava Serok têde kar kiribû, lewre xwedî cewhera Apoyî ye. Kobanê dema Rêbertî dîl kete destê sermayedaran lê xwedî derket. Di 12 Adara 2004'an de jî serî ji dewletê re netewand, yekem car şorêşa nûjen li heman cihî destpêkir. Ji ber van taybetmendiyên xwe, Kobanê hate

hedef kirin û êrîşên dewleta Sûrî, Tirkya û çeteyan destpê kir. Xwestin şoreşa Rojava gav bi gav vala derxînin. Kobanê jî ji bo vê destpêk bû.

Hêza YPG-YPJ ew gel parast hem bi hêza cewherî, hem jî wek hêza leşkerî, li Efrîn, Kobanê, Qamişlo û Dêrikê gel parast. Ciwanên Rojava jî ev rastî dîtin hîn bêhtir hatin nava YPG-YPJ, li ser ramana xwe parastinê ciwanan xwe perwerde kirin.

Piştî azadkirina Dirbesiyê ez derbasî Serêkaniyê bûm. Serokê meclîsê ji bo hevdîtinê çûbûn gel çeteyên bêesil, piştî ku Serokê meclîsê Abik Xelîl û sê hevalên din hatin şehîtkirin, rewşa şer derket holê. Çete û dewletê li hemberî hev du şer kirin, pişt re dewlet şikest. Çete jî di nava bajarok de dest bi talankirina malê gel kirin. Dest avêtin namûsa gel wê demê YPG hebû lê li dervayî bajarok bû. Ji bo gotûbêj û çareserkirina pirsgirêkan Serokê meclîsê çû hevdîtinê. Cihê hevdiyinê jî li dervayî bajar bû hîna di rê de bûn çeteyan ji dûr ve bi sekvanî ew şehît xistin.

Wê demê hêza parastinê lê da dema lê da jî, kolan bi kolan lê dida, cihên stratejîk diketin destê me û peyder pey pêşde çûn dom kir. Çeteyan çekên giran didan şixulandin, tank, hawan û hwd. Doçkayeke 24 jî di destê wan de hebû ew jî didan şixulandin, qêrîna gel, jin û zarokan, hîna jî di guhê min de ye. Lê belê dîsa jî wî gelî Serêkaniyê bernedan û neçûn, li gel YPG-YPJ mil bi mil têkoşîn kirin, keç û xortên gel, hatin tevlî hêzên parastinê bûn.

Heval Bêrîvan hebû, eslê xwe Êzidî bû, zanîngeh xwendibû, ji Serêkaniyê çûbû Stenbolê. Dema li wê derê şerê

Serêkaniyê dibihîse, ango dibînê, ji Stenbol berê xwe dabû Serêkaniyê û hatibû. Dema heval Bêrîvan hat hîna roja destpêkê min ev dît, rûyê wê makyajkirîbû, porê wê çêkirîbû. Weke keçikek Stenbolî lê hatibû. Dema dît ku hêza jin bi navê YPJ ava bûye, rasterast got ezê tevlî YPJ bibim. Dema li Stenbolê ye ji xwe re gotibû heke li welatê min şer heye ez li vir çi digerim, hat û ket nava YPJ. Dema me nû hev dît, çavên wê bi çeka min ket û tirsiya, li hemberî çekê tirsa wê hebû. Çend cara çeka min girt û rakir. Me jê re got: destpêkê tu dikarî ragihandina YPJ de kar bikî. Piştre weke evîndarekî, xwesteka parastinê pêre çêbû. Çû perwerde dît hat, li Tilkoçer kete êrîşê piştî demekê li Tilkoçer ma, heval Bêrîvan hat nava Serêkaniyê. Dema ew hat, bi hatina wê re, tank jî pir ketin nava Serêkaniyê. Tank di destê çeteyan de bû, ji rejîma Sûrî girtibûn. Bi hatina wan re diyar bû ku li pişt wan dewleta tirk heye û dewlet bi xurtî piştgiriya wan dike. Ew tank di xeta sînor re hatin ketin deriyê mabeyna tirkya û Serêkaniyê. Bi vê ketinê re hevala Bêrîvan û hevalên wê ketin êrîşê di vê êrîşê de heval birîndar bû. Dema birîndar jî bû di navbera me û cahşan de ma, ji bo xelaskirina hevala Bêrîvan 2 heval çûn, lê ew her du heval jî şehîd ketin. Hevala Şîlan û hevalekî xort li wir şehîd ketin. Hevala Bêrîvan di dema şer devam dikir de li cihê xwe ma. Piştî sê roj derbas bûn encax hevalan karî biçin û cenazeyê wê bînin. Ez heta niha jî heyrana wê hevalê me ku di demekî kurt de bi evîneke mezin xwe çêkir û kete nava şer û bi xurtî şer kir, êrîş bire ser dijmin.

Hevala Şîlan jî ji Kobanê bû, hevaleke kevin û xwedî ezmûn bû. Ji bo ku bikaribe Bêrîvan xelas bike çû û şehîd ket.

Şehadeta hevala Şîlan jî pir bi wate bû, hevalekî xort jî ji bo xelaskirina hevaleke jin çû şehîd ket. Şehadeta wan her du hevalan jî pir bi wate bû.

Ez carekê çûm cihê me yê birîndaran, ew cih me li meydana bajêr çêkiribû. Wî cihî min dît ku ji maşîneyekê xwîn diherike. Dema min li nava wî meyizand pênc birîndar têde dirêjkirî bûn. Mêrek jî bi destê xwe li serê xwe dixist, cenaze hemû zarok bûn. Min hema di cih de got maşînê bizivrîne bibe nexweşxana me. Zarok ji ber elimîbûn rewşa şer, ne ditirsiyan di mal de ji xwe re av danîbûn û dilîstin. Dema hawan tê avêtin û li hewşa mala wan îsabetkiri bû bi wî rengî zarok birîndar bûbûn. Ji wan Bêrîvan û xuşkeke wê hebû. Her du heval jî li ber deriyê xwe şehîd ketin yê din jî kêmendam man. Keçikeke Ereb jî di nava wan de şehîd ket. Birayê wan keçikan nû zewicî bû, zavayê du mehan bû, ew jî di wê bûyerê de şehîd bû. Dayika zarokan her li wê malê ma, mal berneda dayik niha xebatên rêxistinî jî dike. Cihê xwe di saziya malbatên şehîdan de digire. Dema wê dayikê li tilîliyan dida, ew ciwan pir hestyar dibûn. Manewiyat jê digirtin, hovitiya ku çeteyan li serê gel dikirin bi vî rengî bû, ew hovitî qet nayê ji bîr kirin.

Hevalê Leheng hebû wî zanîngeh xwendibû di meclîsa ciwanên şoreşger de cihê xwe digirt. Carna hevalan henek pê dikirin û digotin: “hevalekî 89 ye.” Çima wiha digotin? Ji ber sekna wî weke şoreşgerekî kevin û xwedî ezmûn û zanebûn bû. Dema şer destpê kir hevalên rêxistina ciwanên şoreşger dibêjin; em parastina hundirîn bigirin ser xwe. Ew heval dibêje na çeka xwe radike û diçe derve û li hemberî çeteyan

şer dike. Di şer de cihê xwe di çepera pêş de girt. Di pevçûnê de hevala Berçem birîndar dibe, Leheng li hemberî dijmin hêrs dibe û dikeve nava êrîşê. Pir germ û bi hêrs weke tolegirekî li hemberî dijmin şer dike û paşê jî şehîd dikeve.

Hevalekî bi regez Ereb hebû, navê wî Goran bû. Ji gundên Dirbesiyê bû. Ew heval jî di şeva cejnê de şehîd ket. Bi vî rengî gelek hevalên bi regez cuda hatibûn nava YPG, hevalek regez Tirk hebû. Ji Tirkiyê ji Stenbol rabûbû hatibû nava şer, ew jî li wê derê şehîd ket. Paşê me termê wî derbasî Bakur kir. Navê wî hevalî ê nava şoreşê Ferhat bû. Malbata wî hat me bi destê xwe termê hevalê şehîd radestî malbata wî kir.

Di şerê Serêkaniyê de rengê pir netewan derkete holê, tenê Kurdan li hember çeteyan şer nekir. Gelek mirovên netewên din jî hatin ketin nava berxwedanê, şer kirin, şehît û birîndar bûn. Bi vî awayî hevîrê netewa demokratîk li wir hat strandin. Biratiya gelan a rasteqîne derket holê. Ev tişt bi saya xwîna şehîdan çêbû. Li hemberî netew dewletan, nijadperestiya wan, li Serêkaniyê li bajarokekî piçûk jiyana gelan a hevbeş û demokratîk derkete holê.

Dema şer destpê kir rixistingeriyek hebû lê her kes bi wijdana xwe tevlî şer û berxwedanê dibû. Hinek kesên ku endamên partiyên din bûn jî di nava şer de cihê xwe digirtin. Yek ji wan jî şehîd Elae bû ji Şiwarû bû. Ew jî bi şerê YPG bandor dibe û tevlî berxwedanê bûbû. Weke endamê partiya xwe na, weke xwe tevlê bû. Axaftinên wî jî di wê derbarê de hene, axaftinên wî hevalî li ser TV jî derketine. Wî hevalî wasiyet kiribû ku dema şehîd ket gora wî di nava gora YPG'yiyan de be. Lê mixabin ji ber feraseta partîgeriyê

partiya wî ya ewil nehîşt ku gora wî di nava hevrêyên wî yên YPG yî de be. Partiya ku berê emdamê wê bû, termê şehîd Elae girt û bir li gund spartin axê. Partiya pêşverû, Hemîdê Hecî Derwêş, nehîştin termê hevalê şehîd weke ku wesiyet kiribû bê veşartin. Ji ber çi wisa kirin? Ji ber ku li ser şehîdbûna wî siyaset bikin. Şehîdgeh li Berkevirê bû, hevalê şehîd nebirin wê derê.

Li ser dayikekê ez dikarim hinek tiştan bibêjim. Dayika hevalê Ehmed. Hevalê Ehmed şehîd ket. Dema şehîd jî ket dayika wî li wê derê ne amade bû, piştî şehadetê dayika şehîd Ehmet vegeriya hat. Dema hat jî got:

-Ez dixwazim herim ser gora kurê xwe."

Min jî jê re got:

-Yadê neçe rewş niha ne başe ji milê ewlekarî ve xeterî heye, niha şer tê jiyankirin.

Wê demê dayikê gotineke giran ji min re kir û wisa got:

-Wijdan pêwîst e.

Dema wisa got êdî min nekarî li pêşiya wê bibim asteng. Pişt re min 3 maşîne amade kir û dayikên şehîdan jî me pê ra şandin ser gora kurê wê yê şehîd. Dema çû li ser gora kurê xwe, li wê derê jiyana xwe ji dest da. Êşa dayikê pir zêde bû li hemberî şehadeta kurê xwe nedikarî xwe rabigire. Dema termê dayikê anîn, kareba tine bû, av tine bû, di nava zehmetiyan de me karî dayika şehîd ku li ser gora kurê xwe yê şehîd jiyana xwe ji dest dabû bispêrin axê. Heta niha jî kula wê dayikê di dilê me de ma ye. Êşa dayikan li Serêkaniyê pir zêde bû. Li gel vê jî ji şervanan re xwarin çêdikirin, nan çêdikirin, xwarina devê zarokên xwe dişandin eniya pêş.

Dayikan dema li bajarok tilîlî didan heybeteke mezin ava dibû. Me ji wan moral digirt, me digot:

-Qet nebe em bibin keç û xortên wan dayikan ku bi me şanaz dibin.

Em ne carek deh cara jî şehîd ketibana, ji bo wan dayikan kêm bû. Lewre şehadet ne dihate bîra me, tenê fikirandina serkeftinê di mejiyê me de bû.

Hîna di nava şer de dema çete ji bajarok hatin durxistin me dest bi rêxistingeriyê kir. Ji ber ku me dest neavêtiba rêxistingeriyê ev gela belav dibû. Gelê ku di destpêka şer de ji bajarok çûbû jî vegeriya hat. Di her taxê de komînên piçûk hatin avakirin her wiha di hemû taxan de me saziyên mala gel avakirin.

Di vê navberê de ez dixwazim bijîşkan jî bi bîr bînim, bi rastî jî keda wan bijîşkên ku li bajêr mabûn zaf hebû. Mala gel ji bo çandiniyê bûbû cihekî stratejîk. Ji bo pêwîstiya çandiniyê weke mazot û av mala gel bû navend. Me li ser Hesekê av qut kir, ji ber ku ava wan ji Serêkaniyê diçû, kareba Serêkaniyê jî ji Hesekê dihat. Wan kareba qut kiribûn, ji bo em karibin kareba bi wan bidin berdan, me jî av li ser wan qut kir. Pişt re dewletê kareba berda me jî ava wan berda. Li hemberî pergala dewletê me şerekî wisa jî kir.

Wê demê mirovekî bi tena xwe 300 roj bê navber nan ji Serêkaniyê re anî. Ew kes ji Amudê bû. Navê wî jî Evdela bû. Her roj 500 kîs nan dianî me jî 2-3 nan dida her malekê, da ku karibin debara xwe bikin. Me tenê mazot dixist maşîna wî lê belê wê demê peyda kirina mazot jî zahmet bû. Evdela di bin fîşekên dijmin de yek rojê jî em bê nan nehîştin. Ew

fîdakariyeke pir bi nirx û ast berz bû. Di dema şer de nanpêjgeha dewletê sekinî bû. Me bi derfetên xwe nanpêjgeh çêkir.

Cihê gaz û mazotê hebû me ew der ji nû ve ava kir, ji me re ji Rimêlan xaz û mazot dihat me li cihekî kom dikir û pişt re jî li ser gel belav dikir. Carna ji derve xorak dihat bi rêka desteya bilind me ew xorak li gel belav dikir.

Di şertên ku hîna şer tê jiyankirin de me mala jinê jî ava kir. Di dema rejîma Sûrî de li vî cihî saziya jinê hebû 2-3 odeyên wê avahiyê ji jinê re veqetandibûn. Avahî çar qat bû. Beriya dewletê ew der cihê xirstyananan bû dewletê dest danîbû ser. Em çûn me êrîşî ser wan kir, me dizanî ku dewlet nikarin bi kesên medenî û jinan tiştekî bike. Destpêkê bi çek ser me de hatin, lê cesaret nekirin ku gule bera me bidin. Wê demê gelek komên çeteyan hebû, Ji wan cephet el nusra, xuraba el Şam, selahedîn eyûbî weke kom hebûn. Ji wan Kurd jî hebûn bi Kurdî diaxifîn, li hemberî Kurdan jî şer dikirin. Pêkhateya wan têkel bû. Ji Heleb heta Amedê çete anîbûn nava wan koman û li hember gelan didan şerkirin. Komên ku zêdetir, zalbûn el Nusra û xuraba el Şam bû, dema em çûne ser wan me ji wan re got:

-Ji vir biçin heke hûn neçin sibe em ê dîsa werin.

Ji ber ku di navbera me û wan de agirbest hebû nîvê bajêr di destên de bû, nîvê din jî ew hebûn, nekarîn bi çek êrîşî me bikin. Roja din me dît ku çete ji avahiyê derneketine, dîsa 60-70’ê jin me da rê û em bi ser wan de çûn. Dema çeteyan biryarbûn û israra me dîtin avahî berdan û çûn. Me jî dest danî ser avahiyê û ji bo xebata jinan vekir, pişt re jî me dest bi

rêxistin kirina jinê kir. Me qatê jor ji bo xebata pîşeyên destkî cuda kir, ji bo jin bikaribin têde bişixulin û debara xwe bikin. Li wir cil hatin dirûtin, kiras, cilê leşkerî dihatin dirûtin. Qatê navîn jî me kir cihê fêrbûna zimanê Kurdî, Erebî, Îngîlîzî. Cihê ferbûna kompîterê jî me di heman cihî de vekir. Ji bo fêrbûna tenduristî û dadgeriyê jî xebata perwerdê dewre bi dewre hatin vekirin.

Ji bo pêş ve birina rêxistingeriyê, tax bi tax hilbijartin hat kirin, nûnerên tax û komînan derketin. Bi kombûna wan re jî meslîsa giştî a bajarok hat sazkirin, di nava bajêr de ev pêşketin hatin jiyankirin. Li derdorê jî gund hebûn heman pergal li wir jî hate pêşxistin, êdî Serokê meclîsê hate hilbijartin, xwesteka gel pêş de çû, her kes ketibû nava karê rêxistinî. Dadgeh hatibû damezrandin û karê xwe dikir, parêzerên ku çûbûn derveyî bajêr ew jî hatin.

Bi taybetî ez dixwazim li ser bijîşkan biaxifim, bijîşkek hebû bi navê Muhamed Xalid bi regez Ereb bû. Mudurê giştî yê nexweşxaneyên Serêkaniyê bû. Nexweşxaneya giştî pir mezin bû, ji bo wê nexweşxaneyê Şer zaf çêbû. Ji ber ku nexweşxaneyeke mezin û girîng bû, amûrên tendûristiyê têde zaf hebûn. Ji xwe ew amûr ji aliyê çeteyan ve hatin revandin, bijîşk Muhamed Xalid jî çeteyan dîl girt, ji bo ku ji xwe re bidin bikaranîn. Muhamed dema li gel çeteyan dîl bû, riya xwe dîtibû û revî bû, hate cem me. Dema hat mala xwe dît ku mal û maşîna wî hevalan parastiye, pir pê bandor bû. Jixwe ji berê ve bi hevalan bandor bûbû. Di dawiyê de li gel hevalan û gelê Serêkaniyê ma, çi derfetên wî hebûn xistin xizmeta gel û hevalan. Wî digot ez ji gel qut

nabim, ne tenê ji bo YPG-YPJ ez ji bo her kesî dixwazim xizmet bikim. Yekî din jî hebû, navê wî Ciwan bû, bijîşk Ciwan bi eslê xwe ji Qamişlo bû, lê belê ji mêj ve hatibû Serêkaniyê. Nexweşxaneya wî jî li Serêkaniyê bû. Ew bi xwe bijîşkê dirana bû, her wiha bi siyasetê ve jî mijûl dibû, peywendiya wî li gel PYD hebû. Ew bijîşk jî dema şer li Serêkaniyê ma, neçû tu deverên din. Yekî din jî hebû, hîna pewrwerdeya bijîşkiyê didît navê wî Xebat bû, endamê partiya çep bû. Wî ji bijîşkan re got:

-Çima em jî koma xwe çênakin, em jî weke bijîşk bikevin nava şer, bila bijîşk jî şehîd bikevin.

Di heman cihî de paç li serê xwe girêdida, çek dida milê xwe û mîna ku di şano de bilîze digot:

-Ax û wax ez birîndar bûme.

Xwe davête erdê rista birîndariyê dilîst, ew sekin û hewildanên wî pir bala min dikişand. Carna min ji wan re xwarin dipijand, min digot:

-Bijîşkno xwarin amadeye, werin xwarina xwe bixwin.

Ji ber hatina birîndaran û dermankirina wan, dema bijîşkan a vala tine bû. Bijîşkekî din hebû bi navê Muhamed Xelef bi regez Kurd bû, dema birîndar dihatin, birîndar dê çûbana Dirbesiyê wî digot ezê li gel birîndaran biçim. Wê demê hevala Têkoşîn a çand û hûner jî li wir bû. Kesekî bi navê Silêman jî hebû, ajokarê maşînê bû. Wî jî got hîna ji mala me kes şehîd nebûye, lewre ez ê jî bi birîndaran re biçim. Ev heval bi xwestekeke mezin, bi evîna karkirinê li maşînê siwarbûn da kû birîndaran bibin. Wê demê heval Têkoşîn jî li maşînê siwar bû ku bi wan re biçe, min milê Têkoşîn girt û

kişand min got tu neçe. Riya çûna birîndaran pir metirsîdarbû lê ji bo em birîndaran ji şehadetê xelas bikin, em neçar bûn ku birîndaran di wê riya xeter re bibin. Li şûna ku hevalê şervan di destên me de şehîd bikevin, birina wan baştir bû. Wê rojê jî li gundê Elo, rê ji aliyê çeteyan ve hatibû qutkirin haya me jî ji vê çendê tine bû. Hevalê şervan, bijîşk û ajokar bi hev re ketin rê û çûn, di rê de çeteyan ambulans gulebaran kirin û ew heft hevalên me li wir şehîd ketin. Doktor ji berê ve vesiyet kiribû û gotibû:

-Heke ez şehîd ketim hûnê wêneya min a rû bi ken belav bikin.

Di heman demê de wêne jî nîşanî derdora xwe kiribû, wêneya wî ya bi rûyê ken, li ser kompîtera wî bû. Dema agahiya şehadeta wî û hevalên din hat, kesê negirî be tine bû. Ji ber pir zindî bû pir xizmet dikir û dixwest zêdetir jî bike. Şehadeta wî bijîşkî bandor li ser hemû bijîşkên din jî kir. Dema birîndarên me cara destpêkê çêbûn, ne bijîşk hebû ne jî derman, kesek hebû bijîşkê ajalan bû despêkê wî di nava bêderfetiyê de birîndarên şervanan derman kirin.

Qonaxa şoreşê bi vî rengî, di bîr û boçûnên rengîn re derbas dibe. Hîn zêdetir jî dê derbas bibe. Azadiya misoger bûyî jî dê bi vî rengî bi dest bikeve.

## GEL BE BÎNÎNÎ ÊME XOŞHALÎ XOY DERBIRÎ

## Sîrwan Soma

Min le şarî Merîwanim. 2006 le şarî Merîwanewe beşdarî rîzekanî gerîlam kird. Ew kat pêwîst bû giyanî nîştîmanperwerî le nav Kurdistana dirust bibê. Her le ber ewey, katî dîlgîrawî Raber Apo hate arawe, bandorî zorî le ser min kird. Hestî Kurdayetî le mina culawe, zor astî berz le minewe pêş kewt. Ew kate şehîd Zîlan Pepule hebû. Le şarî Merîwan karyan dekird. Aşnayîm le gel hevalan, salî 2005 le duwawe, kemêk dirust bû. Ew kate şehîd Zîlan, salvegerî şahadetî Zîlanî gewre, hatewe ke le awahiyek kobûnewe dirust bikat. Ew kate le kemînî pastaranî Êran da ew heval şehît debê. Her le ber ew hevaley şehîd bû, min sondim xward ke çekî helgirim. Le ber ewe min hatim beşdarîm kird, beşdarîbûnî min lew şêweye bû.

Hatmewe nizîkey 3-4 sal, mintiqey Behdînan û le Zapê mamewe. Duway ewe pêşniyazî xom kird, le ser ew esase royştim, bo mintiqey Botan, bo Colemêrg, le wê nêzîkey 5-6 sal mamewe. Katêk mirov le şiwênêk neteweyekî tir, gewre ebet, diway katêkî tir erwa bo şûnêkî tir, mintiqeyekîtir. Çand û ferhengêkîtir nas ekat, şitêkî zor zor xoşe. Kultur û ferhengî Kurd be rastî zor zor dewlemende.

Ew mintiqeye ke min royştim taybetmendî xoy ciya hebû, taybetmendiyekey be du milewe bû. Hem mintiqey Botan, hem mintiqey Serhed, çandî ciyawaz jiyan eken.

Emewê bas le, cografyay ewe bikem. Mintiqey Colemêrg derwa heta berew Serhed, hemuy kiwêstane darî niye. Şiwênêkî awa ye ke her kes werzî Bihar, hawîn birwat bo ewey bo seyr û geşt. Le kiwêstanan aw û hewayekî heye, ew sewzayî û gul û guzare ke heye, morelêkî zor zor xoş deda be însan. Hestî şorişgêrî ke le însana da heye, debê behoy ewe ke însan le wî zortir bo gelekey, bo rohî netewayetî têbikoşê. Be taybetî katî însan wek şorişgêrek derwat bo ewey, lew şwênane kar ekat. Le ser ew esase delêm, hestî şorişgerayetî însan berz dekatewe. Min lewê nizîkey 4- 5 sal mawim. Colemêrg 2-3 salî diwayî nawî bû be eyaletî Wan. Eyaletî Wan katî nawî ewe hatî gorîn le hêlî kar û xebat de le hêlî rêxistingerayî pêwîstî hebû ke nawçe ciyawazekanî Wan ême kar û xebatî xoman berew pêşewe berîn. Be hoy ewe rêkxistin partî ferman pê kira rênmayî niwê pêşkeş be ême kird. Le ser niwê gerîla birwat lew qadana kar bikat. Êmeş le ser ew esase, le ser ew rênmayî ke rêxistin dawe be ême, royştîn bo nawçe ciyawazekanî Wan.

Wîstman le wê kar bikeyn. Gerîla le salekanî 90, lewê hebûn. Le wê û be duwawe gerîla neroştibû bo lewê. Lew nawçane dewlet be her awayî, le ser gelî Kurd zilm û zordariyekî zorî dekird. Kesêk be parastinî ew gele le wê bika, le heman cêga ke bitwanêt gel rêkxistin bikat, zanyarî bidat, kem bû. Nalêm nebû belam zor kem bû. Le ber eweş wek erkêkî şorişgêrî xoman be pêwîstîman zanî ke ême biroyn le naw ew kar û xebate da, cêgay xoman bigrîn.

Diwatir royştîn şitêke ke min xom bo xom esas girt ewe bû ke min ber le hemû şitêk bitwanim ferheng û kulturî ew gele le wê nas bikem. Boy naskirdinî însan etwanî be asanî le naw kar û xebat da cîgay xoy bigrê. Asantir etwanî kar û xebat bikey, hênde zehmetî wiha dernakewê pêş însan.

Ew gelî ke ême le wê jiyan ekat berastî her Kurdêk ke le şiwênêkî jiyan ekat, be mîwanperwerî enasê, be dirustbûnê xoy enasê. Ew nawçaneş ke min lê mawim navçey Saray, Ozalp, Elbak, Payizawa û nawendî Wan. Bo lew şûnane royştum. Berastî ew hezkirdin ew hestî Kurdayetî, ew kulturî Kurdayetî kon êstaş lew nawçane jiyan ekat. Xelkî le wê jiyan ekat xoy le bîr nekirdûwe. Le gel ewende asîmîlasyonî dewlet le sere, berêwe deçêt belam hêşta girêdrawî rastiyekanî xoyetî. Ewey kême be bername nîn û xoyan rêknexistuwe. Lew ruwangewe kêmûkurî hen.

Diway roştinekeman le hêlî gelewe, şêwey xoşhaliyewe pêşwazîman kirdî. Hezkirdinî gel beramber be gerîla hebû. Beramber be Rayber Apoman hezkirdinî gel her hebû. Leber tirsî dijmin, neyantiwanî dengî xoyan berz bikenewe. Kar û xebatî Kurdewarî kar û xebatî rêkxistingerayî,

neyantiwanî rolî xoyan bigêrînin. Emin naskirdinî ew gele zor zor xoşhalim. Kêfxoşim ke roştim bo şiwênêkî awa. Qet peşîman nebûme, zor şit le wê fêr bûm, le nêw gelekeman.

Katî sereta ke ême royştin bo lewê, zehmetîman zor bînî. Le barî kêş û hewa, şitî le serman hatû hebû. Sereta ême çuwar heval bûyn, royştin lewê. Sereta royştin nawçey Elbak ke girêdrawî eyaletî Wan bû. Katî ême gîhayştin lewê, şax û dax neman nasî. Hevalêk le gelman bû, ew hevaleş xelkî Wan bû. Cografya kêmek enasî. Ew heval le pêşman eroy, raberî rêgay ême bû, rêga pîşanî ême deda. Êmeş le diway ew hevale royştîn. Cografya boman tarîf ekird. Le ew mintiqe şax hebû be nawî qerehîsar. Le pişt ew şaxeş awahî hebû, ew awahiyeş payga tiyaye, qarakolî eskerî le sere. Katî ême royştin hestim kird ke şaşiyêk heye, ew şite bo hevalanîş witim. Şitî xelet hîsim dekird. Hevalanîş wityan, nexêr heleman nekirduwe, le rêgay xoman rast deçîn. Le hewa mij hebû, baranîş debarî. Le ber ew hevale ke rêga be ême pîşan deda, le rûy cografyawe şareza nebû. Katî royştinda bûyn, hewa vekir, ew kat bînîman ke 300-400 metir mawe bo payga dijmin. Ew cêgaş sertanserî deşt bû. Ew cîgayane zorbey zor deşt bû, şaxî berz û asê nebû. Le ber ew sedeme eger peywanî gerîlayetî sed der sed pêk nehînî, bimanewê nemanewê zehmetî dête arawe. Her xulek her çirke beramber be lenawçûn debûyn. Diway be bînînî qaraqol rawestayn, be diwawe hatîn. Ême witman naroynewe. Le qaraqolîş segî dijmin hebû. Ewana hatîne be ême. Ew katîş tozek mij dirûst bû, mij nebaya dijmin be asanî tuwanîwyetî be ême bîbînî. Dijmin le ber ewey tênegîşt ke ême gerîlayn, zor be ser ême we nehat. Belam le naw xoyan û dewrûberî

xoyan de cule kirdîn. Le lay ewan tozek gûman dirûst botewe. Ême le paşewe roştin heta le ser şax. Dewrûberî 3 ta 4 saat xiwarewe hatibûyn, dubara geraynewe. Dubara hatîn diwawa, barînî baran berdewam bû, hewa sard û mij bû. Bo dubara rêgay xoman xelet nekeyn, be hevalan witim nawbirek bideynewe. Heke bû beyanî be çawî roj rêgay xoman ebînîn keşîf dekeyn û deçîn. Sebaret be qaraqolîş dûr kewtûbuyn. Katî ême westawîn, cêgeman befir bû. Le ber ewey cîgeman zor beriz bû. Le ber ewey seretay werzî behar bû befir yekcarî neheliya bû.

Ême çûyn leber berdêk westawîn. Be lingî xoman befir laman da bo xoman cêga xoşman kirdîn. Le wê nûstîn heta bere beyanî. Nûstinî ême leber ewe zor sard bû, le gelîş hîç kesêk nehate lewê. Ême ewşew bê heres nûstîn. Katî ême beyanî helstawîn, leber ewe westawîn, hewaş serd bû, le naw tulum nustibûyn. Bînîman ke nîw metir befir leserman hatûwe. Hemû şitî ême ter bûwe, makîne wênekêş lelam bû. Helstam û wêney hevalan gîram. Haletêkî ême lenawbûyn kêşamewe, gutim ba bîbe be bîrewerî boman. Ew şitane şitî wa bû ke qet le bîrim naçêt.

Legel ew şitane moralî hevalan zor baş bû, kêfî ême lecî bû. Leber ewe lenawçe niwê kar kirdin ciyatî xoy hebû. Tesîrî naxoş leser ême nekirdî. Diwatir lew şûne da têperîn çûyn. Dest be karkirdinman kird. Royştîn le naw ladekan, lenawyanda karman kirdîn. Gel be bînînî ême xoşhalî xoy derbirî, xawendarî be ême kirdî. Her şiwênek ême royştîn kes leber ême rayan nekirdî, tirsyan be beramber ême nebû. Ewana wa têgeyştibûn ke ême roley ewanîn. Wek roley xoyan

temaşay be ême kirdî. Ew helwêstî ewan moralî ême ziyatir berz kirdî, ziyatir hezkirdinî êmeş beramberî ewan dirust bû.

Diwa be karkirdinman pêwîst bû ke le ser xiyanetkaran rawestîn. Way lê biken ke ewan dest le îxanet rabikêşin, helsukewt le gel dujmin neken. Deman wîst pêyan bilên wek Kurdêk xawen keramet bijîn. Ême çûyn bo şiwênekî piyawek hebû layengirî dewlet bû, serdanîman kird û duwatir, gileyîman le gel dujmin kirdî. Dujminîş le ême hesiya ke ême le nawçekedayn. Katêk le ladê ême le malêkda bûyn, dujmin destî le ser malewe gîra. Le derewe heresman hebû, hate jûrewe niyazbûyn ke le ladê derbiçîn. Biroyn şiwênî xoman. Le heman katîş da dengî maşîneman bîst, heval Şahanîş pêman witî, dujmin hatewe. Êmeş yekser çekî xoman wergirt ke biçîn derewe. Pêman baş nebû le naw mal pêkdadan dirust bibê. Le derewe çî beserman werê kêşe nebû belam le naw mal teqe kiridin wîstî ême nebû. Jin kur û kiç le mal hebû, witman hergîz nahêlîn lêre rudawî naxoş rûy bidat. Katî ême le malewe derçûyn, ew mecalman nebu ke pêlawî xoman bigirîn. Katî emin dergî le derewe kird, bînîm ke du serbaz le ber dergan. Bom witin “iyî akşamlar” ke wate şew baş, minîş welamekey damewe, witim iyî akşamlar. Heman katîş derga bediwawe daxistim. Ewaniş tewawî tênegeyştin ke ême kîn. Le ber ewe her aram bûn. Be geranewe ême hatîn ber pencereke û le lêrewe derçûyn. Hatîn piştmal be durbîn dewruber kontrolim kird. Bînîm ke hemû cêga gîrawe. Dewruberî ladê pire le esker bûwe. Tenya yek şiwên hebû ke zor dîk û berz bû. Tenanet ew cêga çol kirabû. Le heman katîş da le gel dujmin pêkdadan hate arawe. 2-3 xulek şerman kird.

Hîç şahadet û birîndarman nebû. Ewîş boman cêgay xoşhalî bû. Ew cêgay bahsim kird ke çole, le ew cêga da royştin û xoman rizgar kirdîn. Le ladê derçûn be diwawe, le pêş ême deşt hebû. Pêwîst bû deşteke têper bibîn ke beyanî le gel dujmin pêkdadan dirust nebê. Êmeş le naw neçîn, bûnî xoman le navçeke berdewam bîkeynewe. Rêgay pêwîste qeteh bîkeyn, rêgay şewêk bû. Le ber ew şitaneş naçar buyn pir be lez biroyn. Wek pêştirîş basim kird, neman tuwanî pêlawî xoman bigirîn. Rêgay be roştinî asayî ke heta beyaniye, ême be bê pêlaw 3-4 katjimêr royştin. Katî royştin ême hemû gorewî xoman be lingî xoman kirdîn. Şûtikî xomanîş le lingî xoman pêçayn ke lingî ême birîn nebêtewe.

Diwatir royştîn bo ladeyekîtir, lewêş le durewe bînîman ke ew cêgaş esker gîrawe. Neman tiwanî biçîn ladeke. Sê roj bê pêlaw le ser şax û daxe de mayn. Ew kate hevalanîş îradeyek zor be qahîm pîşandan. Zehmetîş zor kêşan. Le ber ewey pêlaw nebû lingî hevalan estûr bû, hevalan bêtaqet bunewe.

Dujmin le wê xoy rêkxistibû, sebaret be netêperbûnî gerîla bo nawçeke. Sebaret be gerîla, dujmin propagandey naşîrîn dekirdî. Le layek le ser gel zext dekirdî, le layektirewe zext le ser ême dekird ke ême le nawçeke derbiçînewe. Dujmin zor narahat bû ke ême le wê demînînewe. Deywîst çawî ême bitirsînê, êmeş witman hergîz lêre demînînewe. Rênmayî rêkxistinman le ser nawçeke hebû, amadekariyekanî rêkxistin bo nawçeke hebû. Êmeş erkî xoman zanî ke le nawçeke demînînewe. Kar û xebatî xomanîş dekeynewe.

Le şerî ême de rastiyêk heye, eger le haletî parastin da

bî her kat dujmin hêrîş dekat. Le ber ewe witman pêwîste bertek pîşanî dujmin bideyn. Haletî parastin bikeynewe haletî hêrişkirdin. Eger waman kird etwanîn zextî dujmin bişkînîn, îtir ême kewtîn be dway dujmin ke lêyan bideynewe. Ciyatî hêriş kirdinî dujmin witman ême hêrîş dekeynewe. Le ber eweş cimucolî xoman firawantir kirdîn. Gorankarî be şêwazî xoman kirdin. Wîstman kêmukurîman dirust nebê, yariyekanî dujmin puçel bikeynewe.

Ew kat plansazî xoman dirust kird, ême witman deçîn le şaroçke çalakî dekeyn. Wîstman peyamêk arastey dujmin bikeyn û bilên etu le şax be diwaman dekewî belam êmeş le şar çalakî derdehênîn. Ew kat agahîman wergirt ke dujmin dêtewe bo gundêkî. Lew core hatinî dujmin bo ême guncawtir bû ke lêyan bideynewe. Çalakiyeş be encam kotayî pêbêt, bew core îradey dujmin lewaz bikeynewe. Cimucolyan kemtir bikeynewe. Diwatir bo çalakî xoman amade kirdîn. Royştîn berew cêgay çalakî.

Katjimêr dewruberî 9 bu, dujmin be maşîn hatewe û berew ladê roştewe. Hatinî dujminîş bo ew ladê, sebaret be wergitinî zanyarî bu. Ewey tirîş, peydakirdinî sîxurekan bo xoyan bu. Bo xêrxwazî nehatibû ladeke. Ême le naw ladê neman tiwanî çalakî encam bideyn. Le ber ewe gelî ke le ladêye be kuştin û birîndarî ruberu nebêtewe. Diwatir derewey ladê le şiwênêkî kemînman dana. Le gel maşîne dujmin, maşînî cahşekanîş le labû. Katî dujmin le ladê der çu, ême sê heval lêyandayn. Le maşîneş 11 serbaz hebû. Le ber ewe katî serbaz le gund siwarî maşîn bû tiwanîman ewana helbijêrin ke çend danen. Katî ême lêyan da, ewana le naw pasî medenîda

bûn. Le ewan 3 serbaz tiwanî xoyan bê çek rizgaryan biken û biçîne naw ladê. Ewey tirîş ême be çakî lêyanda, rêgeman neda ke le maşîn dabezîn. Le naw pas 8 serbaz kujran. Diway mergyan ême be hêrsî gewre, be hestî tolegirtin helsukewtman kirdîn. Le lay êmeş fîşek zor nebû. Le ber ewey pêştirîş çalakîman kirdibû. Her yekêk le ême yek şarjor fîşek bo diway çalakî helgirt ke operasyon derkewê û pêkdadan dirust bibê ême bê fîşek nemînîn. Ême wîstman biçîn naw paseke û ewey mirdu tespît bikeyn. Çek û cebilxaneş bo xoman helgirîn. Bo dujminîş bilêyn, ême hatîn çalakîman kird, kel û pelîş bird. Bo netwanê mirduy xoy bişardewe, çek le ser helgirtin girîng bû.

Katî ême wîstman biçîn ser mirduy dujmin, cahşekan hatîn. Le piştewe teqeman kirdî. Katî ewana teqe kirdî, hevalêk bo parastinî xoman le piştewe cêbecê kirdibûyn. Ew hevale hîmayeman kird. Êmeş neman twanî biçîn ser paseke. Ew fîşekî le gelman heyetî, hemîşe avêşt cahşekan. Diwatir le gel her hevalek 2-3 fîşek mabû. Be tewaw bûnî çalakî le ew cêga royştîn. Diway yek katjimêr dujmin hatewe le cêy rudaweke.

Le wê fermanderî tugay hebû, name nardibû bo fermanderî giştî artêşî turkya. Pê elê eger îcazet hebê demewê ew lade bisotînim. Nahêlim yek neferîş be saxlemî derbiçêt. Le ew şiteş lewazî dujmin beramber be ême derdekewê. Ewey zerb lêyan daye gerîlaye, belam ewana niyazbûn tole le gel helgirin.

Diway çalakî dujmin operasyon kirdî. Sê roj, bê fîşek, le naw operasyon mawîn. Le lay erzaqîş kêşe boman dirust bû. Hemû şiwên dujmin gîrabû, cêgay ême le nawî bûyn deşt bû.

Ême tiwanîman tenya le şew cêgay xoman bîgorîn. Diwatir dujmin roy, hevalanîş wityan tewaw îtir etwanîn bicolîn. Belam le beyanî katî xor helat, bînîman ke le hindêk şiwên yekîney dujminî şardu hebû. Niyazî dujmin ewe bû ke, be yekînekanî giçke bimênê, katî ême culayn bimanbînê, be bînînî ême serle niwê operasyon der bikat ke ême şehîd bikat.

Le şiwênî xoman heta êware mayn. Hevalan bêtaqet bûn. Diwatir xoman nizîk ladeyek dîke kird. Le wê şiwanêk hebû, be rêgay ew, bangî nîştîmanperwer û dostanman kird. Ewanaş diwatir boman xorak nard, ême xiwardin xward. Le xelkî gund zanyarîman wergirt. Le ew cêgaşman cê hêşt û çûyn. Le lay îradewe hîç kêmukurî nehate arawe. Be jiyanewey diwawe, moralî ême berztir bû. Tiwanîman ziyatir çalakî bîkeyn. Waman kird ke dujmin netwanî maşînî zirîpoş derbikewê. Dijmin lew şêwe kewte parastinî xoy.

Be gorey rênmayî rêkxistin, le naw gelî ême rêkxistinman dirust kird. Le lay hoşyariyewe xebatman le naw gel kirdîn. Wek gerîla her le nawçeke mawîn. Be giştî tîkoşanman berew pêş royşt.